



**NÛBIHAR  
AKADEMÎ**

Kovara Akademik a Xebatên Kurdî ya Navneteweyî  
International Peer-reviewed Journal of Kurdish Studies

**Cild 4 Jimar 12 Sal 6 - 2019**

**Volume 4 Issue 12 Year 6 - 2019**



**Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.**

Büyük Reşitpaşa Cad. Yümni İş Merkezi No: 22/29

Vezneciler – Fatih / İSTANBUL

Tel & Faks: 0212 519 00 09

[www.nubiharakademi.com](http://www.nubiharakademi.com) | <http://dergipark.gov.tr/nubihar>

E-mail: [nubiharakademi@gmail.com](mailto:nubiharakademi@gmail.com)

**Li Ser Navê Pak Ajansê Xwediyê Kovarê û Berpîrsê Karên Nivîsê**  
**On Behalf of Pak Agency the Owner of Journal and Responsible Editor**

Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. adına Sahibi ve Yazışmaları Müdürü  
Süleyman Çevik

### **EDİTÖRÊN JIMARÊ / ISSUE EDITORS**

**Aydın**, Tahirhan / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

**Filiz**, Mehmet Şirin / Res. Assist., *Mardin Artuklu University, Turkey*

### **DESTEYA EDİTÖRİYÊ / EDITORIAL BOARD**

**Acar**, Hayrullah / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

**Adak**, Abdurrahman / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

**Aydın**, Tahirhan / Assoc. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

**Beltekin**, Nurettin / Asst. Prof., *Mardin Artuklu University, Turkey*

**Bor**, İbrahim / Assoc. Prof., *Indiana University, USA*

**Ergün**, Zülküf / Dr., *Mardin Artuklu University, Turkey*

**Tek**, Ayhan / Assoc. Prof., *Mus Alparslan University, Turkey*

**Türel**, Vehbi / Assoc. Prof., *Bingöl University, Turkey*

### **ÇAP / PRINTED BY**

Alioğlu Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti.

Orta Mah. Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A

Bayrampaşa/İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

### **MİZANPAJ & PAGE DESIGN**

Şemal Medya ([semalmedya@gmail.com](mailto:semalmedya@gmail.com))

**Kovara Nûbihar Akademîyê ji aliyê van îndeksan ve tê naskirin:**

The Journal of Nûbihar Akademî is accepted by these indexes:



Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademîk û navneteweyî ye. Di demsalên bihar û payîzê de salê du caran tê weşandin. / Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal. It is published biannually in spring and autumn.

Yayın Türü: Yerel Süreli Yayın.

ISSN: 2147-883X

## **DESTEYA ŞÊWRÊ / ADVISORY BOARD**

**Akin**, Salih / Assoc. Prof., *Rouen University, France*

**Bozarlsan**, Hamit / Prof., *École des Hautes Études en Sciences Sociales, France*

**Bruinessen**, Martin Van / Prof., *National University of Singapore, Singapore*

**Jalil**, Jalile / Prof., *Instituta Kurdzaniyê, Wien, Austria*

**Kreyenbroek**, Philip G. / Prof., *Georg-August University, Germany*

**Musa**, Abdulwahab Khalid / Assoc. Prof., *Zakho University, Kurdistan-Iraq*

**Vali**, Abbas / Prof., *Boğaziçi University, Turkey*

**Yeğen**, Mesut / Prof., *Istanbul Şehir University, Turkey*

## **HEKEMÊN VÊ JIMARÊ/REVIWERS OF THIS ISSUE**

**Aydın**, Tahirhan / Assoc. Prof., *Artuklu University, Turkey*

**Aykaç**, Yakup / Res. Ass., *Artuklu University, Turkey*

**Beltekin**, Nurettin / Asst. Prof., *Artuklu University, Turkey*

**Bingöl**, İbrahim / Dr., *Artuklu University, Turkey*

**Bülbül**, Mikail / Dr., *Mesopotamia Foundation, Turkey*

**Ergün**, Zülküf / Dr., *Artuklu University, Turkey*

**Gemi**, Ahmet / Assoc. Prof., *Artuklu University, Turkey*

**Kırkan**, Ahmet / Dr., *Artuklu University, Turkey*

**Kurt**, Şehmus / Res. Ass., *Artuklu University, Turkey*

**Purçak**, Mehmet Emin / Asst. Prof., *Muş Alpaslan University, Turkey*

**Yıldız**, Ayhan / Instructor, *Artuklu University, Turkey*

**Yonat**, Mehmet / Dr., *Artuklu University, Turkey*



## NAVEROK / CONTENTS

<b>JI EDÎTOR/EDITORIAL.....</b>	<b>07-09</b>
<b>Guherîna Dengan di Kurdî (Kurmancî, Soranî, Zazakî), Îngilîzî û Farsî de</b> Phonetic Changes in Kurdish (Kurmanji, Sorani, Zazaki), English and Persian <b>OSMAN ASLANOĞLU .....</b>	<b>11-38</b>
<b>Kirmanckî de Vengê Siruştî</b> Onomatopoeia in Kirmancki <b>AHMET KIRKAN.....</b>	<b>39-53</b>
<b>Vegêrana Kesê Duyem di Edebiyata Kurdî de</b> Second Person Narrative in Kurdish Literature <b>ÛMRAN ALTINKILIÇ .....</b>	<b>55-70</b>
<b>WERGEREK / A TRANSLATION</b> <b>Neteweperwerîya Kurdan</b> <b>THOMAS BOIS - JI ÎNGİLİZÎ: ADNAN DEMİR.....</b>	<b>73-85</b>
<b>DOKUMENTEK / A DOCUMENT</b> <b>Qewa'îdêd Serfa Kurdî (I, II) a Mela Mehmûdê Bazîdî</b> Qewa'îdêd Serfa Kurdî (I, II) of Mela Mahmudi Bazidi <b>TAHÎRHAN AYDIN .....</b>	<b>89-98</b>



# Ji Edîtoran

*Nûbihar Akademî* bi vê hejmarê 6 salîya xwe tamam kir. Di vê hejmara xwe ya 12an da kovar dîsa mijarên balkêş pêşkêşî xwînerên xwe dike:

**Osman Aslanoglu** di gotara xwe da ku navê wê “**Guherîna Dengan di Kurdî (Kurmançî, Soranî, Zazakî), Îngilîzî û Farsî de**” ye û bi Kurdîya Kurmançî hatiye nivîsîn, sê zimanan; Kurdî, Farsî û Îngilîzî ji aliyê guherîna dengan ve dide ber hev. Aslan di beşa destpêkê da ji aliyê teorîyê ve li ser guherîna dengan radiweste û digel vê jî têkilîya van her sê zimanên Hînt Ewrûpî tespît dike. Piştî ku guherîna dengan di dengdar û dengdêran da digel mînakên curbicur dide, dest bi ketina dengan dike. Di dawîyê da jî van her sê zimanan ji aliyê zêdebûna dengan ve dide berhev.

**Ahmet Kırkan** jî di gotara xwe ya ku bi Kurdîya Zazakî hatiye nivîsîn da li ser mijareke girîng a ziman sekinîye. Kırkan di vê gotara xwe da ku ya navê wê “**Kirmanckî de Vengê Siruştî**” ye 300 vedengên Kirmanckî pêşkêş dike. Li gor tesbîta Kırkan di Kirmanckî da hejmara vedengan ji van zêdetir e lê ev xebat dikare bibe mînak ji bo xebatên pêşerojê.

Gotara sêyem û dawîn a vê hejmarê ji aliyê **Ümran Altınkılıç** ve hatiye amadekirin. Navê gotarê “**Vegêrana Kesê Duyem di Edebiyata Kurdî de**” ye. Altınkılıç di vê lêkolîna xwe da pêşî ji aliyê teorîk ve li ser vegêrana kesê duyem radiweste û paşê jî sê roman û sê çîrokên kurdî yên bi vegêrana kesê duyem hatine nivîsîn bi hûrgulî vedikole.

Wek hejmarên berê, di vê hejmara *Nûbihar Akademîyê* da jî wergerek derheqê Kurdan da heye. Navê gotara ku ji aliyê **Adnan Demir** ve jî Îngilîzî hatiye wergerandin “**Neteweperwerîya Kurdan**” e. Gotar beşek ji pirtûka Thomas Bois a bi navê “*The Kurds*” e. Nivîskar di gotarê da li ser mijarên wek pêşdîroka neteweperwerîya kurdan, feodalîzm û neteweperwerî û rewşa kurdan li Îran û Îraqê di nîveka sedsala borî da rawestîyaye.

Di dawîyê da danasîna dokumentek heye ku ji aliyê Tahirhan Aydın ve hatiye danasîn. Navê wê “*Qewadêd Serfa Kurdî (I, II) a Mela Mehmûdê Bazîdî*” ye. Aydın di vê xebata xwe da ji sê alîyan ve vê destxetê vedikole: nasname, fîzîkî û naverêk.

Em hêvî dikin di hejmara bê da jî bi mijarên curbicur ên biqîmet derkevên hemberî we.

Editorên jimarê

Tahirhan Aydın-M.Şirin Filiz





# Editorial

Nubihar Akademi is completing its sixth year with this issue. In this 12th issue, the journal is presenting to its readership some interesting topics:

**Osman Aslanođlu** compared the three languages, Kurdish, English and Persian, in terms of variations of sounds in his article “**Phonetic Variations in Kurdish (Kurmanji, Sorani, Zazaki), English and Persian**”. In his introduction, Aslan examines sound variations from a theoretical point of view and also identifies the relations of these three Indo-European languages. After exemplifying phonetical variations in vowels and consonants, he goes on to explain elisions. Finally, he compares these three languages in terms of sound reproduction.

**Ahmet Kırkan** also focuses on an important linguistic subject in his article. Kırkan presents about 300 onomatopoeias in his article “**Onomatopoeia in Kirmancki**”. Kırkan says that the number of onomatopoeia words in Kirmancki is undoubtedly more than that, and hopes his study will set an example for further research.

The third article of this issue, entitled “**Second Person Narrative in Kurdish Literature**”, was penned by **Ümran Altinkılıç**. In his research, Altinkılıç first examines second person narrative theoretically, and then examines three Kurdish novels and three stories written in second person narrative.

As in the previous issues, this issue of the Nubihar Akademi contains a translation about the Kurds. The name of the article, translated from English by **Adnan Demir**, is “**Kurdish Nationalism**”. The article is taken from the book *The Kurds* by Thomas Bois. In his work, Bois deals with “The Prehistory of Kurdish Nationalism”, “Feudalism and Nationality” and the situation of Kurds in Iran and Iraq in the middle of the last century.

Finally, there is a manuscript that is introduced by **Tahirhan Aydın**. The name of the manuscript is “**Qewa’idê Serfa Kurdî (I, II) of Mela Mehmûdê Bazîdî**”. In this study, Aydın examines the manuscript from three perspectives: identity, physical condition and content.

We hope to bring to you more important topics in our next issue.

**Issue editors**

**Tahirhan Aydın-M.Şirin Filiz**



# Guherîna Dengan di Kurdî (Kurmançî, Soranî, Zazakî), Îngilîzî û Farsî de Phonetic Changes in Kurdish (Kurmanji, Sorani, Zazaki), English and Persian

Osman ASLANOĞLU\*

## PUXTE

Malbata Hînd-Ewrûpa, ji aliyê bikaranînê ve malbata zimanî ya herî mezin a dinyayê ye. Ji ber ku malbatek e di navbera zimanên vê malbatê de têkilîyeke xwezayî heye. Lêbelê bi borîna demê hinek ziman, ji hinekên din pir dûr ketine; hinekan jî ji ber ku şeklê xwe yê eslî parastine, zêdetir nêzika hev mane. Ev rewş di mayîna zaravayên zimanekî de û hetta di navbera devokên zaravayekê de jî eynî ye. Bandorên wek hawirdor, dem, çand, têkilîya bi netewên din re û taybetîyên biyolojîk bûne sedema guherîna dengên zimanan. Wekî din nêzîkbûna hev a hin dengan û dûrketina mirovan a ji dengên ku li zimanê wan giran tê, bûne sedemên cih guherîna wan.

Ji ber van guherînên di zimên de gelek kes, têkilîya zimanê xwe ya bi malbata zimanê xwe re nizane. Guherîn û dûrketina ziman û zaravayan dibe sedema dûrketina milletan a ji hev jî. Ev dûrketin ewqas dibe ku li hin deran kesên ku bi heman zaravayê dipeyivin jî nikarin hev fehm bikin. Hînbûna van zimanan jî dijiwartir dibe. Em vê pirsgirêkê di zaravayên Kurdî de jî dibînin. Ji ber vê him ji bo dîtina têkilîya Kurdî ya bi Farsî û Îngilîzî ku di heman malbatê de ne, him jî ji bo dîtina têkilîya navbera zaravayên Kurdî, me xwest ku em li ser guherîna dengan bisekinin. Bi vê armancê me jî pirtûkên berhevdaniyê, rêzimanîyê û ferhengîyê, guherînên bingehîn û rêzîkên wan dîyar kirin. Xencî van me gelek mînak bi xwe tesbît kirin û li wan zêde kirin. Di vê xebatê de em ê tenê li ser guherîn, ketin û zêdebûna dengan bisekinin.

**Peyvên Sereke:** Kurdî, Guherîna dengan, Kurmançî, Kirmanckî, Zazakî, Soranî, Zarava.

## ABSTRACT

The Indo-European language family is the largest language family in the world in viewpoint of usage. Since it is a family, there is a natural relationship between the languages of the nations in this family. However, some languages have become

---

\* **Dr. Endamê Hîndekarîyê, Zanîngeha Dicleyê, Fakulteya Edebîyatê, Beşa Ziman û Wêjeyên Rojhilatê, Binbeşa Ziman û Wêjeya Kurdî, Diyarbekir,**  
e-mail: aslanogluosman@gmail.com. orcid.org/0000-0001-6534-3125

very distant from others over time, while some are closer to each other because they retain their original structure. This relationship is same between the dialects of a language as well. The dialects of a language have also undergone change over time. Factors such as the environment and time in which people live, the culture they possess, their interactions with other nations and biological characteristics have led to the change of languages. Besides, the proximity of some sounds and pronunciations of the letters have caused their displacement. It is also effective for people to avoid difficult sounds and prefer easy sounds in spoken language.

Because of all these changes in language, people often don't notice their proximity to the same language family. The change in language and dialects affects on going away of nations. The being away becomes so that some persons who talk same dialects too don't understand each other in some places. The learning of these languages also is being harder. We also see this problem in the dialects of Kurdish. For this reason we wanted to study on change of phonetics to see relationship of Kurdish with the Persian and English that are in same family and to see relationship in the dialects of Kurdish. For this purpose we determined the basic changes and their rules from books of comparing, grammar and dictionary books. Besides we determined by ourselves many examples and added to others. we will basically address sound changes and then sound drops and sound formations in these languages. We will focus on changes of phonetics, the sound reproduction and dropping sounds only in this work.

**Keywords:** Kurdish, Phonetic Changes, Kurmanji, Kirmanjki, Zazaki, Sorani, Dialect.

## DESTPÊK

Xebatên zimannasîyê li cîhanê di navbera salên 800-150 yê berîya zayînê li Hîndîstanê hatiye kirin (Güvenç, 2015, 138.). Li ser mijara wekhevî û nêzikîya zimanên Hîndî û Ewrûpî kesê ku yekemîn car lêkolînên sistematîk kirine William Jones e. Di sedesala 19'an de bi lêkolînên zêdetir hat dîtin ku zimanên Hîndî û Ewrûpî merivê hev in. Li ser vê têkilîyê ji aliyê dîrokî ve tê gotin ku Aryaî li başûrê Rusyayê di ser Qefqas û Deryaya Reş re koçberê rojavayê Asyayê bûne. Li wir bûne du beş. Beşek ji wan çûye Ewrûpayê, beşeke din çûye Rojavaya Navîn, paşê çûye Îranê û Hîndîstanê (Sivrioğlu, 2015, 17; Sağniç, 2014, 17). Kurdî, Farsî û Îngilîzî jî di nav zimanên cîhanê de dikevin nav zimanên malbata Hînd û Ewrûpî. Ji zimanên Ewrûpî çendek ne tê de hemû ji vê malbatê ne. Ji Asyayê jî zimanên Hînd û Îranê dikevin nav vê malbatê. Kurdî jî van zimanên heman malbatê zêdetir nêzika zimanên Derî, Belûçî, Peştûkî û Farsî ye (B.n.r. Kanar, 1999, 41; Badıllı, 1992, 21; Sheyholislami, 2015, 31; Badıllı, 1995, 21; Sait Çakar û ên din, 2015, 23.). Ji ber ku di heman herêmê de dijîn û têkilî qet qut nebûye an zêde ji hev dûr neketine. Lê Îngilîzî, ji Kurd û Farisan dûr ketine, çûne parzemîneke din; ji ber vê di Îngilîzî de guherîn zêdetir çêbûne. Lê zimanên her malbatê di nav xwe de kêr

zêde bi hev re têkildar in. Ev têkilî û şibîna hev, bi piranî bi temamî ji holê rana-bin; kêr bin jî dimînin. Ev têkilî bi şeklên cûr bi cûr xuya dikin. Lê divê meriv bi awayekî baldar lê binêre da ku bibîne.

Dema meriv li peyv û hevokên hinek zimanên heman malbatê dinêre, meriv difikire ku ev zimanên cuda ne û tu têkilî di navbera wan de tune. Wek mînak di hinek zimanan da an di zaravayên zimanekî bi xwe de tewang, nêrtî û mêtî hinekî an jî bi temamî ji holê rabûne û ev cudahîyên van zimanên heman malbatê îro bûne taybetîyên wan zimanan (Gültekin, 2010, 12; Baran, 2012, 20).

Ev pirsgirêk gelek caran ne tenê di zimanekî de, di navbera zaravayên zimanekî de jî derdikeve holê. Wisa dibe ku meriv dema ji derve li zaravayên zimanekî dinêre, dibêje qey ev ne zaravayên heman zimanî ne û ne ji zimanekî ne û tenê têkiliyeke biçûk di navbera wan de heye. Ji ber vê hinek nivîskar dema ku zimanan dabeş dikin, li nêzikbûn û dûrbûna wan a şeklî dinêrin û biryara zarava an zimanbûna didin (Blaga, 1997, 4.).

Ji ber vê zaravayên zimanekî jî girêdayê nêzikbûna hev, di nav xwe da tên dabeş-kirin. Di Kurdî da jî ev yek ji aliyê gelek nivîskaran ve hatiye kirin. Bi vê nêzikbûnê dibêjin Kurdî ji malbata Hînd-Ewrûpî, ji aliyê Asyayê, ji Îndo-Aryen'ê ye û ji wir jî dikeve nav zimanên Îranî û paşê dikeve koma Îranîya Bakurê Rojavayê. Vê dabeş-kirina li ser têkilîyê pêşdetir dibin û di nav Kurdî de jî Kurmançî û Soranî dikin beşek, Kirmanckî, Goranî û lorî dikin beşeke din. Wek van tesnîf û dabeşkirinên cuda cuda hene (Badıllı, 1992, 20; Aykoç, 1996, 29; Baran, 2012, 19; Tan, 2011, 17).

Dûrketina zimanan bi şeklê herî hêsan meriv ji guherîna devokên zaravayekî fehm dike. Zarava li herêmekê yek be jî vê carê meriv dibîne ku devoka bajarekî an gundekî bi têkilîya derdorên an bi taybetîyên çanda mirovên wê derê, ji cihekî nêzika wir jî gelek cudatir e. Her çiqas heman zarava bin jî devok ji hev dûr dikevin. Ev jî rewşa dûrketina ji hev a zimanan û zaravayan ji me re îzah dike. Wê demê em dikarin bêjin ku cudabûna zimanan ne ji ber cudabûna netewan e an jî cudabûna zaravayên zimanekî, nayê wê wateyê ku zimanên wan jî cuda ne.

Ziman jî wek zindîyan an mirovan diguherin. Sedemên guherînên zimanî jî bi qasa jîyana kesên ku bi wî zimanî dipeyivin curbicir in (Güvenç, 2015, 174). Lê dema meriv bi awayekî kûr li van ziman an zaravayên têkildar binêre, hinek rêzik û xalan zanibe û paşê van zimanan bide ber hev wê demê têkilî û merivîya van zimanan baştir tê fehmkirin û dîtîn. Bandora gelek tiştan li van zimanan bûye û ziman ji hev dûr ketine. Li jêr me gelek mînak li ser guherînê dane. Bi qasî ku me jî wan mînanan fehm kir, bandora herî mezin a guherîna bêjeyan, nêzikbûna bilêvkirina dengên e. Herfên ku bi heman awayî tên derxistin an ên ku bilêvkirina wan nêza awayê din be, tevlihev dibin û xwe diguherînin.

Mijara vê xebatê bi piranî li ser bingeha pirtûka Ferhenga Pirzimanî<sup>1</sup> ye ku me bi çend hevalan re amade kiribû. Di vê ferhengê de berhevdana bêjeyî ya zimanê Kurdî (bi sê zaravayên xwe), Farsî û Îngilîzî û Tirkî heye. Tirkî jixwe ne di malbata hînd û Ewrûpayê ye. Ji ber wê Tirkî di vê xebata me de ne mijara me ye. Kesên ku li vê pirtûkê dinêrin, bêjeyên cur bi cur yê zimanên merivê hev li ba hev dibînin û di gelek bêjeyan de têkilîya wan dibînin. Taybetîya vê xebatê ew e ku di navbera gelek ziman û zaravayan de hatiye amadekirin. Lê ji bo dîtina têkilîya hinek bêjeyan jî divê hinek rêzikên guherîna dengan di destê xwendevanan de hebin. Ji ber ku bi demê ziman û zarava ji hev gelek dûr ketine. Em jî bi vê xebatê di asta yekem de armanc dikin ku têkilîyên di navbera wan zaravayên Kurdî de ku di ferhengê de hatine dayîn baştir werin dîtîn û hînbûna wan ji bo kesên ku van zaravayan hîn dibin hêsan be. Di asta duyem de dîsa em dixwazin ku têkilîya Kurdî bi Farsî û Îngilîzî ku ji heman malbatê ne jî were dîtîn. Ev hînbûna wan zimanan dê hêsan bike. Zanîna guherîna di zimên de û zanîna rêzikên wan ji bo naskirina baştir a zarava û devokên wan gelek girîng e (Malmîsanij, 2013, 9). Bêjeyên ku me ji ferhengê ji bo berhevdanê standine nav vê xebatê, têra fehmkirina mijaran nake. Divê mînakên cur bi cur jî werin lê zêdekirin. Ji ber wê em ê derveyê bêjeyên ferhengê jî bêjeyên cur bi cur jî wek mînak bidin da ku baştir were dîtîn.

Li ser zimanên Hint-Ewrûpî wek ferheng hin xebat hatine amadekirin. Li ser etîmolojîya hin zimanan an li ser zimanê Avestayê ferheng û gotar hatine amadekirin. Lê bi taybet li ser zaravayên Kurdî ji bo berhevdanê xebat Hîndîk in. Pir caran du zaravayên Kurdî li ser rêzimanê hatine berhevdan; Hinekan ferhenga du zaravayan amade kiriye. Hinek xebat jî li ser guherîna dengan û dengan hatine amadekirin. Wek mînak: Pirtûka Malmîsanij rasterast li ser guherîna dengan di navbera zaravayên Kurdî de ye.<sup>2</sup> Pirtûka Fêrgîn Melik Aykoç a bi navê "Kurdîzan Rûberîna Zaravên Kurdî"<sup>3</sup> li ser zaravayên Kurdî disekine. Nivîskar Husein Muhammed li ser dengnasîya Kurdî pirtûkeke berfireh nivîsandiye.<sup>4</sup> Dîsa Husein, li ser Etîmolojîya bêjeyên Kurdî ferhengek nivîsandiye.<sup>5</sup> Wekî din gelek xebatên biçûk-mezin li ser zaravayên Kurdî hatine amadekirin. Hinek pirtûk jî rêziman in lê bi du zaravayên Kurdî an zimanên cuda hatine nivîsandin.<sup>6</sup> Hinek xebat jî cari-

1 Aslanoğlu, Osman, Bedirhan İslamoğlu, Zeki Gürür, Hayrullah Acar, Evren Aslanoğlu, Ferhenga Pirzimanî, Weşanên Nûbiharê, İstanbul, 2011.

2 Bnr. Malmîsanij, M, Kürtçe'de ses değişimi, weşanên vate, İstanbul, 2013.

3 Aykoç, Fêrgîn Melik, Kurdîzan Rûberîna Zaravên Kurdî, Weşanên Enstîtûya Kurdî, Berlin, 1996.

4 Muhammed, Husein, Dengnasî Di Kurdî de, Pirtûka dijîtal, <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/08/dengnasi1.pdf>.

5 Muhammed, Husein, Rehna Ferhenga etîmolojî ya Kurdî Kurdish Etymological Dictionary, Pirtûka dijîtal, <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/11/rehna.pdf>.

6 Bnr. Lezgîn, Roşan, Ji bo Kurmancan bi Awayekî Muqayeseyî Gramera Kirdkî (Zazakî), Weşanên Roşna, Diyarbekir, 2013.

nan li ser têkilîya di navbera Farsî û Kurdî de hatine kirin. Lê xebatên ku bi taybet sê zaravayên Kurdî teva Farsî û Îngilîzî bike mijara xwe me nedîtîne.

Em ê bi awayekî kurt, bi xalên bingehîn li ser têkiliya Kurdî (Kurmançî, Zazakî, Soranî), Farsî û Îngilîzî bisekinin. Berîya destpêka berhevdanê divê çend xalan li ser rêbaza xebatê em bînim ser zimên:

**Yekem:** Ger di mînakên de beşa bingehîn a bêjeyekê wek hev be em wan ji bingehê qebûl dikin. Bi piranî ji reha serî ya hevbeş bingeha bêjeyan e. Ji beşa sereke şunde gelek qertaf, tîp û bêje lê hatine zêdekirin û bêje ji hev dûr ketine. Li mînakên divê bi vî çavî jî meriv binêre.

**Duyem:** Di berhevdana van ziman û zaravayan de me tenê mînakên li ser guherîna dane. Bêjeyên ku bi temamî wek hev bin, an jî eger bi guherîna deng re ne têkildar be me nenivîsandin; vala hîştin. Ji ber wê di gelek mînakên de me a Îngilîzî an carnan jî mînakên din nedane, vala hîştine. Hinek bêjeyên Îngilîzî jî me dane ku bi dengê nivîsandî ne wek hev in, lê bi xwendina wê tîpê an dengê wek hev xûya dikin. Wek: tîp “C” di Îngilîzî de wek “C” jî wek /S/ jî dikare were xwendin. Wê demê têkilî bi du herfan çêdibe. Ev jî têkilîyê nîşan dide. Ji ber ku tiştêkî ku dişêbe hev tunebe, hewce nake ku em bidin. Ango têkilîya van zimanan ne tenê bêjeyên ku em ê behs bikin e. Gelek bêjeyên bi temamî wek hev hene, lê me negirtine vir.

**Sêyem:** Ji bilî tîpên ku em ê li jêr li ser bisekinin di gelek deng û dengên de têkilî û nêzîkahî heye, lê em ê tenê li ser hinekên bingehîn bisekinin. Em li vir çend tiştên sereke rêdixên ber çavan. Bi alîkarîya van xalan guherînanê cuda jî meriv dikare fehm bike. Mesela di beşa /B/,/V/,/“W”,/“M” de dengê “Y” nehatiye dayîn. Lê di beşa “H”,/“W”,/“Y” de li ser hatiye sekinandin. Eger têkilîya /W/ û “Y” di komekê de hebe, wê demê têkilîya “Y”yê, ji ber têkilîya “W”yê bi tîpên koma din re jî heye. Wek: “sêv”, di Kirmanckî de “saye” ye, di Farsî de “sîb” e. Wê demê têkilîya /B/,/V/,/“Y” jî derdikeve holê. wek van gelek tîp bi hev re têkildar in.

**Çarem:** Eger di van guherînan de têkiliyek di navbera çend dengên de hebe, me ew tîp hemû kirin beşeke cuda ên têkildar. Di komeke din de ji ber vê dibe ku eynî herf dîsa hebin. Divê ew ên din jî di nav xwe de werin fikirîn. Yanî hinek herf bi hinek herfan re di hinek bêjeyan de zêde têkildar dibin û guherîn ber çavan dikeve.

Di vê xebatê de em ê bi taybet li ser guherîna deng û tîpên ziman û zaravayan bisekinin. Lê bi awayekî kurt em ê behsa ketin û zêdebûna dengên jî bikin. Divê were zanîn ku rezîkeke sabîta guherîna dengên ku ji bo hemû zimanan derbasdar be tune. Di her ziman an zaravayî de rêzîkên cuda hene (Xanlerî, 1347, 92).

Di mijara guherîna dengên de bi piranî li ser sê beşan tê sekinandin (Malmîsanîj, 11,12). Ev sê beş wiha ne:

1-Cih guhertina dengan (*Metathesis*)

2-Guherîna dengan (*Phonetic Changes*)

3-Zêdebûn (*Epenthesis*) û Ketina dengan (*Phone-Drop*)

Lê em ê ji van beşên jor tenê li ser beşa duyem û sêyem bisekinin û beşa duyem wek dengdar û dengdêr; beşa sêyem jî wek ketina dengan û zêdebûna dengan ji hev cuda binirxînin. Bi vî awayî em ê li ser van çar beşan bisekinin:

1-Guherîna dengdaran

2-Gûherîna dengdêran

3-Ketina dengan

4-Zêdebûna dengan

## 1. GUHERÎNA DENGDARAN:

Herfên dengdar, wek ku ji navê wan tê fehmkirin, bi alîkarîya dengdêrekê derdikevin. Yanî bê dengdêr dernakevin. Dema ku ev herf bi dengdêra xwe werin nivîsandin wek du herf tên nivîsandin. Wek: B=be, C=Ce. Ev herfên dengdar, bir alîkarîya lêvan, diranan, ezmanê dev, poz an qirikê derdikevin. Di alfabeza Kurmancî ya Celadet Elî Bedirxan de 23 heb in (Biçûk, 1977, 23; Bedirxan, 1994, 16-17). Lê wek me li jor got em ê girêdayê armanca xwe tenê ên bigehîn û têkildar li vir bidin û li ser bisekinin:

**/B/,/V/,/W/,/M/**

Ev beşa dengan meriv dikare bêje beşek e ku guherîna dengî herî zêde tê de dibe. Hinek ji van dengan lêvkî(labial) hinek jî diranlêvkî(labiodental). Di nav dengên /B/,/V/,/W/ de guhertin pir dibe. Teva van dengan, dengê /M/ jî cihê /V/ û /W/ pir digire. Di gelek bêjeyan de di navbera zaravaşên Kurdî û Farsî ev tîp cihê xwe diguherînin (Malmîsanij, s. 19-23; Aykoç, 1996, 31-32, 49; Muhammed, 73.). Guherîna van dengan girêdayî cihê wan jî diguhere. Dema ku di serî de be cuda ye, di dawîya bêjeyê de be cuda ye. /B/ û /M/ ji aliyê cihê derxistinê ve wek hev in. Her du jî bi pêşîya lêvan derdikevin. Ji ber wê tevlihev dibin (Muhammed, 71).

### Di serê bêjeyê de

/B/ ya Kurmancî, Soranî û Farsî, di Kirmanckî de /V/ ye. Ango di piranîya bêjeyên ku dengê /B/ di serê bêjeyê de ye Kirmanckî ji ên din cudatir e. Di Kirmanckî de dengê /V/ gelek kêrhatî ye (Bedirxan û Lescot, 1994, 28). Ji ber ku /V/ û /W/ nêzî hev in û pir caran /V/ û /W/ cihê hev diguherînin em wan jî di vê komê de didin.

Di dawîya bêjeyê de eger di Farsî de /B/ hebe, ên din de /V/, "W" ye.



Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
BÎST	BÎST	VÎST	BÎST	-
BER	BER	VER	BER	FORE
BA	BA	VA	BAD	WIND
BARAN	BARAN	VARAN	BARAN	RAIN
BEHÎV	BADAM	VAME	BADAM	-
BERF	BEFIR	VEWRE	BARAN	-
BÎR	BÎR	VÎR	BER	-
BIRÛSK	BIRÛSIK	VIRSIK	-	-

**Di dawîya bêjeyê de:**

V-W-B				
Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
AV	AW	AW	AB	
ŞEV	ŞEW	ŞEW	ŞEB	
TAV	TAV	TAW	TAB	
LÊV	LÊW	LEW	LEB	LIP
SÊV	SÊW	SAYE	SÎB	
SIVIK	SÛK	SIVIK	SEBOK	
EWR	HEWR	HEWR	EBR	
RÛVÎ	RÊWÎ	LÛWÎ	RÛBAH	
SIWAR	SIWAR	VENIŞTENE	SEVAR	

Di zaravayên Kurdî de jî ev rêzikên vê beşê gelek derdikevin holê. Li herêmên cuda bi taybet li Botanê û Serhedê dengê /B/, bi /V/ û /W/ re cih diguherîne (Bedir-xan û Lescot, 1994, 28; Kırkan, 2019, 168-169; Lezgîn, 2013, 30.).

Wek:

Cewab----> Cewav

Xirab----> Xiraw

Kebok----> Kevok----> Kewok

Xebitîn----> Xewitîn

**Di dawîya bêjeyê de rêzikeke din:** (Malmîsanij, 2013, 20-21; Kurdo, 2013, 57; Muhammed, 148.)

Bi piranî /V/ ya Kurmançî di Soranî de /W/ ye. Ev dengên lêvkî(labial) in û gilowerbûn heye.

Bi piranî /V/ya Kurmançî di Kirmanckî û Farsî de /M/ ye. Di vir de jî dengê lêvkî (labial) bi dengê lêvkî(labial)-ezmandevkî (palatal) re cih diguherîne.

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
GAV	GAW	GAM	GAM	
NAV	NAW	NAM (E)	NAM	NAME
EV	EW	EM-NO-NA	ÎN	
ÇAV	ÇAW	ÇIM	ÇEŞM	
ZAVA	ZAWA	ZAMA	DAMAD	
XAV	XAW	XAM	XAM	
KEVAN	KEWAN	KEMAN	KEMAN	
HEVÎR	HEWÎR	MÎR -	XEMÎR	
HINGIV	HINGIWÎN	HINGIMÎN	ENGEBÎN	HONEY
DAW	TENÛRE	ETEK	DAMAN	
DÛV		DIM	DOM	
ZIVISTAN	ZISTAN	ZIMISTAN	ZIMISTAN	
NÎV	NÎW	NÎM	NÎM	
ZÎV	ZÎW	SÎM	SÎM	SILVER
ŞÎV	ŞÎW	ŞAM	ŞAM	
DEV	DEM	FEK	DEHAN	
DAW			DAMEN	

Ev mînak jî ji me re nîşan didin ku Kurmançî û Soranî wek /V/ û /W/ li alîyekî, li alîyê din teva Farsî û Zazakî, metna Avestayî, Pehlewîkî jî di gelek mînakan wek /M/ mane (Sivrioğlu, 2015, 265).

Carinan di navberê de /V/ û /B/ dibe /M/:

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî
ZIMAN	ZIMAN	ZIWAN	ZEBAN
DÛV		DIM	DOM

### /B/,/P/,/F/,/V/,/W/

Ev deng ji alîyê bilêvkinê ve nêzikê hev in. Ji van dengên /F/,/V/ diranlêvkî (labiodental), /B/,/P/ dulêvkî (bilabial) û /W/ lêvkî (labial) ye. Hinek tîpên vir bi tîpên beşa yekemîn re wek hev in. Ji ber ku hinek tîp di hinek bêjeyan de bi têkilîya tîpên li jor derketine holê, hinek jî bi vê komê re derketine holê û nêziktirê hev bûne.

Ev tîp di nav hev de pir cih diguherînin. Carinan /B/ û /P/ ku lêvkî ne û ji bo cih guherînê pir guncaw in. (Aslan, 2018, 51; Bedirxan û Lescot, 1994, 27), carinan /F/ û /P/, carinan jî ji ber dengê /B/yê, /V/ jî dikeve vê komê. /B/ û /P/ her du jî lêvkî ne, lê dengê /B/ sergirtî ye; dengê /P/ ne sergirtî ye ango vekirîtir e. /F/ û /V/ her du jî lêv û diranî ne. Bi alîkarîya lêva jêr derdikevin û dişêbin hev. Ji ber ku /V/ û

/W/ jî têkildar e, ew jî dikeve nav vê komê. Bi vî awayî ev 5 tîp di minakan de di zaravayên cuda de bi hev re derdikevin pêşîya me (Bedirxan û Lescot, 1994, 29-30; Aykoç, 1996, 43; Muhammed, 109). Di zimanên Hînd-Ewrûpî de mînakên cuda jî li ser guherîna /B/, /V/ hene (Gedikli, 2015, 209).

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
BAV	BAW	PÎ	PÊDER	FATHER
BÊJE	WIŞE	VAJ	VAJE	
PEL	GELA	PEL	BERG	
(H)ESP	ESP	ESTOR	ESB	
HEFT	HEWT	HEWT	HEFT	SEVEN
SPÎ	SPÎ	SIPÊ	SEFÎD	
SIPEHÎ	CUWAN	RIND	ZÎBA	
SABÛN	SABON	SABÛN	SABÛN	SOAP
BALÎF	BALÎF	BALÎF	BELÊŞ	PILLOW
BELAV	VILA	BILAW	PERA	
PIR	PIRD	PIRD	POL	BRIDGE
FIRÎN	FIRÎN	FIRAYENE	PERÎDEN	FLYING
LÊV	LÊW	LEW	LEB	LIP
BO	BO	SEBA	BER (AY)	FOR
FÎRDEWS	FÎRDEWS	FÎRDEWS	FÎRDEWS	PARADISE

Di mînakên jor de Îngilîzî bi tîpên /F/ û /P/ derdikeve pêş.

Bêjeya “kovî”, bi Farsîya mavîn, wek “kof” e. Di vê mînakê de jî /V/, /F/ heye (Fehrestgîstana Zebanê Farsî, 91). Di Kurmançî de jî di lêkerekê de eger dengê /F/ hebe, di dema niha de dibe /V/ (Bedirxan û Lescot, 1994, 28.).

Wek:

Axaftin----> Axiv

Hingaftin----> Hingiv

Ji bilî guherînên /B/ û /P/ ya di ziman û zaravayan de, di devokên gelek zimanan de jî pir tevlihev dibin. Bi taybet eger ev tîp di dawîya kîteyan de an bêjeyan de bin (Malmîsanij, 2013, 67):

Cewab ----> Cewap

Sewab ----> Sewap

Bab ----> Bap

Kabtan ----> Kaptan

**/H/,/W/,/Y/**

/W/,/Y/ tîpên niv dengdêr (semi vocal) in. Ev tîp, di rêzimanan de jî wek ku tê behskirin wek dengdêrên alîkar dikevin navbera bêjeyan. Bi vî awayî gotinê herikbar dikin. Ji van re tîpên girêdanê an kelijandinê jî tên gotin (Baran, 2012, 29; Tan, 2011, 43). Mînakên li jêr ne bêjeyên bi qertaf in û ne di peywira kelijandinê ne; lê bi heman pergala kelijandinê kîjan deng ji wan re hêsan be ew hatiye gotin. Yanî nêzikbûna van dengan bikaranînê derdixê holê. Wekî din tîpên /W/,/Y/ wek nêv dengdêr tên hesibandin. Yanî bilêvkirinê de alîyekî wan ê sivikdengdêrî heye (Aykoç, 1996, 44). Ji ber wê dikevin cihê hev:

Kurmancî	Soranî	Kirmanckî	Farsî
ZUHA	ZIWA	ZIWA	
TENÊ	TENYA	TENA	TENHA
KOVÎ	KÊWÎ	KOYÎ	KOHÎ

Bikaranîna van dengan di heman zaravayê de jî herêm herêm diguhere. Hinek dengê /H/ye giran dibînin û dengê /Y/ bikar tînin. Di Kurmancî de jî Kirmanckî de jî mînak gelek in (Gultekîn, 2010, 13).

Wek:

Ronayî ----> Ronahî

Valayî ----> Valahî

Duwem ----> Duyem

Di Soranî de jî wek tîpa kelijandinê dikare bi /W/ an /Y/ were. An jî di dawîya lêkera dema borî ev du tîp jî di devokan de tên bikar anîn. Di Farsî de jî girêdayî tîpa dawî bikaranîna dengê jî van wek tîpa kelijandinê derdikevin holê. Di hemûyan de nêzikîya van du dengan tê dîtin (Kurdo, 2013, 53; Aslanoğlu, 2018, 31; Muhammed, 223-224).

**/J/,/C/,/Z/,/Ş/**

Di van dengan de tê dîtin ku bi piranî Kurmancî wek Soranî ye û Kirmanckî û Farsî jî hemûyan cudatir in. Bi piranî Kurmancî û Soranî /J/ ye, Kirmanckî /C/ ye û Farsî jî /Z/ ye. Di Avesta û Pehlewîkî de jî wek Farsî di hin mînanan de dengê /Z/ye jî /J/ye zêdetir ber çavan dikeve. Pehlewîkî û Peştûkî jî di hin mînanan wek Farsî bi /Z/ zêde derdikevin pêş (Sivrioğlu, 2015, 246, 251, 274; Aykoç, 1996, 45-46; Muhammed, 85, 128-129; Lezgîn, 2013, 194).

Kurmancî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
JIN	JIN	CENÎ	ZEN	
JÎYAN	JIYAN	CU	ZINDEGÎ	

JÎR	ZÎREK	JÎR	ZÎREK	
JÊR	JÊR	CÊR	ZÎR	
MEJÎ	MÊŞK	MEZ (G)	MEXZ	
ÊŞ	ÊŞ	DEJ	DERD	ACHE
TEJÎ	TAJÎ	TAJÎ	TAZÎ	
TÛJ	TÎJ	TUJ	TÎZ	
JENÎN		CENAYENE	ZEDEN	
ROJ	ROJ	ROC	RÛZ	
JOR	SER	COR	BÂLA	
JÎ		ZÎ	NÎZ	TOO
JI	JI		ZI	
ŞÛJIN	ŞÛJIN	GOÇÎN	SÛZEN	
DIRÊJ	DIRÊJ	DERG	DERAZ	TALL
PAKIJ	PAKIJ	PAK	PAKÎZE	
NIMÊJ	NEWAJ	NIMAC-J	NEMAZ	
AJNÎ	-	ESNAWÎ	ŞÎNA	SWIMM
PIJANDIN	PEWTENE	LÊNAN	POXTEN	
RIJANDIN	RIJANDIN	RIŞNAYENE	(PEZ) RÎXTEN (RÎZ)	
DIJWAR	DIJWAR	ZOR	DOŞWAR	HARD
ERZAN	HERZAN	ERJAN	ERZAN	

Dengê /J/ di Kirmanckî de carinan dibe /Ş/. Wek ku xuya dike di Farsî de jî di rehê dema niha de tîpa /Z/ derketiye holê ku ew jî ji tîpên vê beşê ne. Ji van mînanan meriv fehm dike ku Kurmançî zêde ji dengê /J/yê hez dike. Lê di ziman û zaravayên din de jî di şûna /J/yê de tîpa /Ş/yê pir heye. Di hin mînanan jî metnên Avestayî, Persî, Pehlewîkî, Farsî, Zazakî de tenê Kurmançî bi /J/yê hatiye gotin. Ên din /Ş/yê bikar hatine (Sivrioğlu, 2015, 258).

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
DIJMIN	DIJMIN	DIŞMEN	DOŞMEN	
(BA)JAR	ŞAR	ŞARISTAN	ŞEHR	
RIJANDIN	RIJANDIN	RIŞNAYENE	RÎXTEN	
CEJN	CEJN	ROŞEN	(RÎZ) CEŞN	
JIMAR	JIMÊR	HUMARE	ŞOMARE	NUMBER

### /S/,/Ş/,/H/

/S/ û /Ş/ dengên diranî(alveolar) û paşzimanî(post-alveolar) ne. Di van dengên de bi piranî tîpa /H/ di Kirmanckî û Farsî de û carinan jî di Soranî de dibe /Ş/ (Bedirxan û Lescot, 1994, 39).

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
DEH	DEH	DES	DEH	TEN
BIHAR	BEHAR	WISAR	BEHAR	
GUH	GWÊ	GOŞ	GÛŞ	
ROHNÎ	ROŞNAYÎ	ROŞN	RÛŞEN	
RIH	(E)RÎŞ	RÎŞ	RÎŞ	
JIMAR	JIMÊR	HUMARE	ŞOMARE	NUMBER
MASÎ	MASÎ	MASE	MAHÎ	
HESIN	ASIN	ASIN	AHEN	IRON
RAST	RAST	RAŞT	RAST	
ŞOR	SÛR	SOLIN	ŞÛR	SALTY
ŞEŞ	ŞEŞ	ŞEŞ	ŞEŞ	SIX
ŞUŞTIN	ŞUTENE	ŞORDIN	ŞOSTEN	
XWESTIN	XWASTIN	WAŞTENE	XWASTEN	WANT
ŞÛJIN	ŞÛJIN	GOÇÎN	SÛZEN	
SOL	KEWŞ	SOL	KEFŞ	SHOE
ŞEKIR	ŞEKIR	ŞEKER	ŞEKER	SUGAR (ş)
SÎ	SÎ	SÎYE	SAYE	SHADE

Tê dîtî ku Kurmançî û paşê jî Soranî ji gelek ziman û zaravayên Hint Ewrûpî dûr cudatir in. Di hin bêjeyên wek guh, rohnî û rih de ku li jor jî hatine dayîn, meriv xencî van li Avesteyî û Persî û Sanskrîtî jî binêre tîpa /Ş/ heye, lê di Kurmançî de wek /H/ maye (Sivrioğlu, 2015, 260). Di bêjeya “şekir” de tiştê balkêş ew e ku di Îngilîzî de /S/ hatiye nivîsandin lê wek /Ş/ tê xwendin. Ev jî îhtîmala guherîna /S/,/Ş/ nîşan dide.

Di bêjeya “şeş”ê de /Ş/ya Kurdî di Îngilîzî de bûye /S/. Ji ber ku du heb /Ş/ hene di Îngilîzî de tîpa /X/ê, /S/ya duyem temam kiriye.

### /X/,/H/,/W/

Di van dangan de bi piranî /H/,/W/ ya Kurmançî, Soranî û Kirmanckî, di Farsî de dibe /X/. Bi piranî ev tîp di serê bêjeyan de tên:

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî
HIŞK	WIŞK	WIŞK	XOŞK
HÛR	WIRDE	WIRDI	XORD
HEVÎR	HEWÎR	MÎR -	XEMÎR
HÊNIK	FÊNIK	HONIK	XONEK
GUND	GUND	DEW	DÎH
XEWN	XEWN	HEWN	XWAB

**/K/,/H/,/X/**

/K/ dengê ezmandevkî (velar) ku bi zimên û ezmanê dêv dikeve. Di vê rêzîkê de di navbera zimanan de pergaleke têkûztir heye. Di gelek mînanan de Kurmançî û Soranî wek hev bi dengê /K/, Kirmanckî bi dengê /H/, Farsî jî bi dengê /X/ tê:

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî
KER	KER	HER	XER
KENÎN	KENÎN	HUYAYENE	XENDÎDEN
KIRÎN	KIRRÎN	HERÎNAYENE	XERÎDEN
KANÎ	KANÎ	HÊNÎ	-

**/L/,/R/**

Di navbera van du dengên de gelek têkilî hene û mînak pir in. Bi piranî ev deng di dawîya bêjeyan de tê û diguhere. Carinan di navberan de di dawîya kêteyan de û di serê bêjeyan de tê:

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
SAL	SAL	SERRE	SAL	YEAR S-Y
SELWÎ	SELWÎ		SERW	
PEL	PEL	GELA	BERG	
ÇIRA	ÇIRA	ÇILA	ÇERAX	
FIRÎN	FIRÎN	FIRAYENE	PERÎDEN	FLYING
DILOP	DILOP	ÇILKE	ÇÎKE	DROP
ŞOR	SÛR	SOLIN	ŞÛR	SALTY
PIR	PIRD	PIRD	POL	BRIDGE
GIR	GIRD	GIL	TEPE	HILL
RÛVÎ	RÊWÎ	LÛWÎ	RÛBAH	
QIJK		QIRAWILE		CROW

Di zaravayan de carinan di devokan de jî guherîna van du dengên dibe (Bedirxan û Lescot, 1994, 34).

Wek:

Kelmêş----> Kermêş

Şalûl----> Şalûr

Alîguşk----> Argûşk

Alîkarî ----> Harîkarî

Ji bilî aliyê dîrokî yê vê guherînê aliyekî din ê vê tîpê heye ku ew jî bîyolojîk û tîbbî ye. Wek ku tê zanîn zarok dema ku hîn biçûk in û dest bi axaftina herikbar nekirine tîpa /R/yê nikarin bilêv kin û bipiranî wek /L/ derdixin. Ji bo hinek kesan ev pîrsgirêk dema ku mezin dibe jî didome û qet nikare dengê /R/yê bêje.

Mînak:

Germ ----> Gelm

Were ----> Wele

**/M/,/N/**

Ev du tîp di Kurdî de wek nazal tèn qebûlkin. Yanî dengê wan bi alîkarîya poz tê. Bi vî awayî dişibin hev û tevlihev dibin. Bi taybet dema ku ev du tîp berîya dengê /B/yê tèn xwe bi alîyê /M/yê ve diqşînin. Ji ber ku dengê /M/yê jî wek /B/ bi lêvan derdikeve (Rahimpour û Dovaise, 2011, 75; Coşkun, 2007, 358-359; Muhammed, 59). Lê tîpa /N/yê bêlêv e. Ji ber wê ev tîp jî pir nêzika hev in. Ji ber wê him di zimanan de him jî di nav devokên zaravayekê bi xwe de gelek tèn guhertin. Bi pîranî ev tîp di dawîya kîteya yekemîn de ne:

<b>Kurmancî</b>	<b>Soranî</b>	<b>Kirmanckî</b>	<b>Farsî</b>	<b>English</b>
PEMBÛ	PEMEYÎ	PEME	PENBE	PINK
ŞEMÎ	ŞEME	ŞEME	ŞENBE	
NEKE	MEKE	MEKE	NEKON	

Li jor mînakeke fermanî ya neyînî heye. Di Kurmancî û Farsî de ji bo fermana neyînî him dengê /M/ him jî /N/ dikare were serê lêkerê. Tê gotin ku berê ji bo fermana neyînî /M/ bûye, lê bi derbasbûna demê niha bûye /N/. Di Kurmancî de jî li hin herêman tenê /N/ dibêjin, li hinek herêman jî ji bo kesên duyem /M/, ji bo kesên din /N/ tê serê lêkerê. Wek: tu meke, ew neke (Bedirxan û Lescot, 1994, 158; Lezgîn, 2013, 149). Ev tevlihevî nêzikîya van dangan nîşan dide.

Di devoka zaravayan de pir tê dîtîn (Malmîsanij, 2013, 110; Kırkan, 2019, 166). Têkilîya van dangan ne tenê di zimanên Hînd-Ewrûpî de ye jî. Di zimanên din de jî mînak gelek in (Coşkun, 2007, 358).

Wek:

Cambaz ----> Canbaz

Kamca -----> Kanca

Nêrdewan -----> Mêrdewan

Zenbîl -----> Zembîl

Zambak -----> Zanbak

Çember -----> Çenber

Amber -----> Anber

**/S/,/Z/**

Ev du tîp pêşzimanî ne. Bi alîkarîya ziman û diranan bi hev re ji nêv diranan derdikevin û di bilêvkirinê de pir nêzika hev in (Rahimpour, Dovaise, 2011, 75; Kurdo, 2013, 47). Di mînakan de di cihên cuda de tê dîtîn ku ev du tîp cihên xwe diguherînin.



Di vê rêzikê de bi piranî /Z/ya Kurmançî bi /S/ û /Ş/ ya Farsî cih diguherîne. Carinan jî berevajî dibe. Bi biranî ev guherîn di serê bêjeyan de ye. Di zimanên din de jî mînakê vê guherînê hene (Bedirxan û Lescot, 1994, 33; Gülsevin, 34).

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
GÊLAZ	GÊLAZ	GILYAZÊ	GÎLAS -Z-S	
EZMAN	ASÎMAN	ASMÊN	ASÎMAN	
SIPEHÎ	SIPEHÎ		ZÎBA	
SIMBÊL	SIMÊL	ZIMBÊLÎ	SEBÎL	
ZÎV	ZÎW	SÎM	SÎM	SILVER
ZIK	SIK	-	ŞÎKEM	
MASE	MÊZ	MASA	MÎZ	

Di mînakên jor de meriv dibîne ku Kurmançî û Soranî nêza dengê /S/yê ne. Lê Farsî û Zazakî nêza /Z/yê ne. Di zaravayê de jî ev guherîn heye. Di hin lêkeran de dengê /S/ ya di raderê de, dema niha de dibe /Z/:

Lîstin----> Lîz

Bihîstin----> Bihîz

Carinan jî ji ber nêzîkbûna dengan mirov, wan tevlihev dikin û di şûna hev de dibêjin:

Derbas----> Derbaz

Destgeh----> Dezgeh

Destgirtî----> Dezgirtî

### /D/,/T/

Ev deng, ji aliyê bilêvkirinê ve diranî(alveolar) ne. Ev du deng, diranî ne û bilêvkirinê de pir nêza hev in. Ji ber wê di dabeşkirinê de bi hev re tên (Bedirxan û Lescot, 1994, 27). Ev du tîp ewqas nêza hev in ku meriv dema bêjeyeke ku bi dengê /T/yê dest pê dike bi lez dubare dike û dibêje ew dengê serî wek /D/ derdikeve. Di reşwên gelek cuda de jî têkilîya van du herfan derdikeve holê. Di vê rêzikê de Îngilîzî jî derdikeve holê û /D/ dibe /T/ an jî /T/ dibe /D/.

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
TARÎ	TARÎ	TARÎ	TARÎK	DARK
SPARTE	SPARDE	-	SOPORDE	
DAR	DAR	DARE	DIREXT	TREE
DIRAN	DIDAN	DIDAN	DENDAN	DENT
DU	DU	DI	DO	TWO
AGIR	AGIR	ADIR	ATEŞ	
DÎTIR	DÎ		DÎGER	OTHER

Di mînakên jor de tişteki balkêş ber çavan dikeve ku Kurdî û Farsî wek hev, lê Îngilîzî li dijî wan hatiye. Di mînaka “dar” û “du” de tenê Îngilîzî wek /T/ xuya dike, ên din wek /D/ ne. Wekî din di Sanskrîtî de bêjeya “dar” a Kurmancî wek “taru” derbas dibe. Di Pehlewîkî û Peştûkî de jî bi /D/yê dest pê dike (Sivrioğlu, 2015, 112). Di mînaka “tarî” de bervajî vê, dîsa Îngilîzî cuda maye û wek /D/ hatiye. Ev dibe ku têkildarê dûrketina Îngilîzî be. Bêjeya “bav”ê ku di Îngilîzî de “dad” e, di Sanskrîtî de wek “tata” ye. Bêjeya “roj”ê bi Îngilîzî “day” e, bi Almanî “tag” e. di vê de jî /D/ û /T/ derdikeve holê (Donald, 1867, 109, 112). Yanî ev guherîn di zimanên cuda yên Hînd-Ewrûpî de jî dîyar e.

Lê wek ku me got ev du herf di gelek zimanan da têkildar in. Di zimanê tirkî de jî ev guherîn dibe (Hunutlu, 2007, 168). Di Îngilîzî de gelek nav hene ku bi /T/yê tên nivîsandin lê wek /D/ tên xwendin. Mînak: “the” tê nivîsandin lê wek “di” tê xwendin. Bêjeya “letter” wek “ledir”; “water” wek “wadir”, “mother” wek “madir” tê xwendin.

Di Farsîya navîn de bêjeya “bav”, wek “pit” e. Di Farsîya îroyîn de “peder” e. Di van de wek ku tê xuyanî di “pit” û “peder” de tîpên guherîne /T/ û /P/ ye (Ferhengistanê Zebanê Farsî, 85).

Di zaravayên Kurdî de jî ev cih guhertin xuya dike. Wek ku tê zanîn di Kurmancî de daçeka “di...de” dema bi bêjeyekê ve bi cînavkê tê gotin, kurt dibe û dibe “tê de”.

Wek:

“di wê de” ----> “tê de”.

Wekî din qertafa dema niha a Kurmancî “di” di pêşîya lêkeran de dîsa kin dibe û dibe /T/ (Bedirxan û Lescot, 1994, 32).

Wek:

Diînim----> Tînim

Dihêm----> Têm

Di gelek lêkeran de ku qertafa dema niha bê xirabbûn wek /D/ tê xwendin jî li hinek herêman wek /T/ tê bilêvkirin.

Wek:

Diherim----> Derim----> Terim

Ji ber ku bilêvkirina van her du dangan nêzika hev e, gelek netew van diguherînin. Wek mînak di zimanê Tirkî de herfa /T/ ya dawîya bêjeyan di gelek rewşan da dibe /T/. Wek bêjeya “kağıt”, dema ku qertafa “ın” tê dawîyê, dibe “kağıdın”.

/T/,/D/,/Z/

Tîpa /Z/ jî wek ên din diranî (alveolar) ne. Ev du tîp ji derve zêde têkildar

xuya nakin. Lê di gelek mînakên de em dibînin ku cihê hev digirin. Sedemên ên sereke du xal in:

Dengê /D/ ya ku ji “Dad” a erebî hatiye di nav Farsî de wek /Z/ tê xwendin. Ji ber ku bilêvkirina vê tîpê ji /Z/ya din a zirav cudatir e. hinek zêde nêza /Z/yê dikin, hinek wek /D/ dixwînin, hinek jî bi dengê di navbera wan de dixwînin. Farisan jî wek /Z/ya zirav kirine yek. Ji ber vê bêjeyên wek “ramadan”, “diya”, “darûrî” ku bi dengê “Dad”ê dest pê dikin wek “ramazan”, “zarûrî”, “zîya” dixwînin. Ev bêjeyên navdar bi wî şeklî derbasa Kurdî jî bûne. Ji ber di hin zimanan da an zaravayan bêje bi /D/yê hatine gotin, di hinekan de jî bi /Z/yê hatine gotin (Aslanoğlu, 2018, 19; Yıldırım, 2014, 4-5; Aykoç, 1996, 19; Muhammed, 103).

Wek:

Erd ----> Arz

Hadir ----> Hazir

Di zimanên kev ên Îranî de, /T/ û /D/ di nav xwe de nêza hev in, /T/ û /Z/, /D/ û /Z/ jî di nav xwe de pir cihê hev digirin. Kûrdî û Farsî di van guherînan de li ber çavan in (Muhammed, 31). Mînak: bêjeya agir, di Zazakî de adir, Avestayê û Farsî û Pehlewîkî de Atar, Ateş, Ateşx e. /Û/ ji ber têkilîya bi dengê /Z/yê re bûye Azer (Sivrioğlu, 2015, 129). Dîsa Azer’a Farsî ku tê wateya yezdanê êgir jî wek “adur” derbas dibe (MacKenzie, 1373, 176).

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî
AGIR	AGIR	ADIR	ATEŞ
ZANA	ZANA	ZANA	DANA
ZAVA	ZAWA	ZAMA	DAMAD
DIL	DIL	ZERRE	DIL

### /Ç/,/T/

Ev du tîp her çiqas wek hev nayên bilêvkirinê jî di hinek bêjeyan de dikevin cihê hev:

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
TUNE	NÎYE	ÇINO	NÎST	NO
KÛÇIK	SEG	KUTIK	SEG	DOG
ÇAY	ÇAY	ÇAY	ÇAY	TEA

Di devokan de zêdetir ev tîp cihê hev digirin. Di hinek zaravayan de “çi” wek “tu”, “paç” wek “pot” tê gotin.

### /D/,/B/,/V/

Di van dangan de Kirmanckî bi dengê /B/ jî ên din cudatir derdixeve pêş. Îngilîzî jî wek ên din bi dengê /D/ maye.

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
DER	DERGA	BER	DER	DOOR
DERENG	DIRENG	BEREY	DÎR	DELAY
DIN	DÎ	BÎN	DÎGER	OTHER
DÎTIR	ÎTIR	PÎ	PÊDER	DAD
BAV	BAW	VENG	BANG	
DENG	DENG			
BANG				

Ji bo guherîna van dengan hinek bêjeyên cuda jî wek mînak dikarin werin dayîn. Wek mînak: tê gotin ku bêjeya “Erebe” ku niha di gelek zimanên wek Erebi, Kurdî û Tirkî bi kar tê, ji bêjeya “Erradde” hatiye û di pêvajoyeke dirêj ra derbas bûye (Sadiqî, 1395, 49).

### /Ç/,/S/,/Ş/

Di vê guherînê de Kurmançî bi /Ç/ yê ber çavan dikeve. Di ziman û zaravayên din de carinan /Ç/ carinan /S/ derdikeve.

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
ÇI	ÇI	SE	ÇI	
BIRÇÎ	BIRSÎ	VEYŞAN	GOROSNE	
HIRÇ	WIRÇ	VÊSAN	XERS	
XWESTIN	XWASTIN	WAŞTENE	XWASTEN	WANT

Ev rêzik bi taybet li ser têkilîya /Ç/,/S/ ye. Lê ji ber ku hin herêmên Kirmanckî di şûna /S/ yê /Ş/ dibêjin, dengê /Ş/ jî dikeve vê rêzîkê.

### /H/,/N/

Dî vê rêzîkê guherîn li ber çavan e, lê zêde bêje tunene:

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
MEH	MANG	MENGE	MAH	MOON

### /G/,/K/,/V/,/W/

Ev her du tîp jî wek /D/,/T/ yê bilêvkirina wan gelek nêzika hev e. Her du tîp bi awayê sergirtî tîp gotin. Dengê /G/ jî jorê dêv an jî asûmana nerm derdikeve. Dengê /K/ jî paş jorê dêv jî asûmana hişk derdikeve. Ji bilî hişk û nermbûnê, ji cihê nêza hev derdikevin û dişêbin hev (Aykoç, 1996, 43). Ji ber wê di gelek zimanan da /G/,/K/ bi hev re tîp guhertin. Di gelek mînakan de jî dengê /G/ dibe /V/; Carinan di Îngilîzî de jî dibe /W/ (Muhammed, 113; Huntlu, 2007, 169; Xanlerî, 1347, 92).

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
HÊK	HÊLKE	HAK		EGG
KAR	KAR	GURE	KAR GAV'Ê	WORK
MAN (GE)	MANGA	MAN (GE)	MADE	COW (k)
ŞEKIR	ŞEKIR	ŞEKER	ŞEKER	SUGAR (ş)
GUL	GUL	VILE	GUL	
GUR	GURG	VERG	GORG	WOLF
GOTIN	GUTIN	VATENE	GOFTEN	
GERM	GERM	GERM	GERM	WARM
KOŞE	GOŞE	GOŞE	GÛŞE	CORNER

Di mînaka jor a sêyem de bingeha bêjey “ga”, “ge”, “gav”, “kow” e. Lê ji bo ku mêfiya wî heywanî nîşan bidin di Farsî de di wateya “mê” de “made” gotine, di Kurdî de “man” gotine. Wek ku bêjin “gayê mê”. Di Îngilîzî de wek ku tê zanîn dengê /C/ wek /K/ jî tê xwendin. Li jor jî bi vî şeklî têkilîya /G/-/K/ xuya dike. Dîsa di serê bêjeyê de di çend mînakên de Zazakî û Îngilîzî wek hev bi dengê /V/ û /W/yê dişibin hev. Lê di ên din de wek /G/ maye. Di Avestayî de bêjeya “gur” wek “vehr-ka”, di lehçeya Kaşanî de “varg”, di Mazenderanî de “vorg” e (Xanlerî, 1347, 92).

Di Kurdî de gelek kes hin bêjeyên ku di dawiyê de g an jî k hebe bi dengê din re cih diguherînin. Bêjeya “eger” wek “eke”, “hek”, “heke” dibêjin. Xuya ye ku ev her du jî heman bêje ne, lê bi şeklên cuda rûniştiye (Farqînî, 2000, 373). Çend mînakên din:

Pûng----> Pûnk

Çong----> Çok

Mang----> Mak

Ceng----> Cenk (Bedirxan û Lescot, 1994, 37; Aykoç, 1996, 49)

Di hin zimanên cuda de ev guherîna têkildarê Kurdî hin xuya dike. Di zimanê Latînî, Yunanî û Rûsî de mînakekê em karin bidin. Bêjeya “seg” ku tê wateya “kuçik” wiha ye:

Rûsî----> Suki

Latînî----> Sagarius

Yunanî----> Skilos, skuli

Li jor jî têkilîya /G/ û /K/ eşekere xuya dike. Di Îngilîzî de wek “Dog” e. Dengê yekem guherî be jî dawî dişibin hev (Gedikli, 2015, 219)

## 2. GUHERÎNA DENG DÊRAN

Herfên dengdêr bê alîkarîya herfeke din derdikevin. Bixwe wek dengên alîkar jî tînen hesibandin ku tîpên dengdar bi alîkarîya wan tînen bilêvkin. Wek herekeyên Erebi jî dikarin werin fikirîn. Ev tîp jî 8 heb in (Bedirxan, 1994, 16).

Di vir de bi piranî em ê li ser bêjeyên ku dengdêrên wan ji hev cuda ne bisekinin. Di vê beşê de mînak gelek in. Em ê çendekên sereke bidin. Ev sivikbûn an guherîn carinan di zaravayên zimanekî bi bixwe de jî çêdibe.

### /A/,/E/,/Ê/,/I/,/Î/

Di guherîna denga bi piranî ev tîp cihên xwe diguherînin. Helbet guherîna /A/>/E/, /A/>/Î/ an dengên din di nav xwe de cuda cuda ye. Lê ji bo ku nêzika hev in û bi hev re werin dîtîn em di tabloyekê de didin û dikin beşek. Di mînakên jêr de wek ku cûya dike bi piranî tîpa /A/, bi tîpên din re diguhere. Herî zêde jî a dibe e. Ji mînanan tê fehmkirin ku Kirmanckî de meyla /A/yê zêdetir e:

Kurmancî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
GEH	GAH	GE	GAH	
ET (Xweha mezin)	ET	AT		
CIH	CÊ	CA	CA	
DAR	DAR	DARE	DIREXT	TREE
SAR	SERMA	SERD	SERD	COLD
SAL	SAL	SERRE	SAL	YEAR
HÊK	HÊLKE	HAK	-	EGG
LÊ	LÊ	LA	(VE)LÎ	
KÊR	KARID	KARD	KARD	
PÊ	PÊ	PA	PA	
ŞÎV	ŞîW	ŞAMÎ	ŞAM	
PÊNC	PÊNC	PANC	PENC	
SÎ		SÎYE	SAYE	SHADE

Dengê /Ê/ û /Î/, pir nêzika hev in. Ji ber wê pir cihê hev digirin. Di Kurdî de di devoka gel de ev guherîn zêde ye. Dengê /Ê/ eger di dawîya bêjeyekê de be û dema ku qertafekê bigire, bi piranî dengê /Ê/ dibe /Î/.

Wek:

Rê ----> Rî (ya min)

Dê----> Dî (ya min)

Pê----> Pî (yê min)

### /A/,/E/,/I/,/U/,/Û/,/O/

Di van mînakên ku hinekî ji hev cuda ne de tê dîtîn ku Farsî zêdetir ji dengê /O/ û /Û/yê hez dike. Lê bi giştî meriv dikare bêje ku di piranîya van ziman û zaravayan de /E/,/I/,/O/ di nav hev de cihê xwe carinan diguherînin:

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
GURZ		GIRZE		
KURM	KIRM	KERM	KÎRM	
PIRS	PIRSYAR	PERS	PORS	
TIRS	TIRS	TERS	TERS	FEAR
SOR	SÛR	SÛR	SORX	
NU	NWÊ	NEWE	NOW	NEW
NEH	NO	NEW	NOH	NINE
DEW	DO	DO	DÛX	DÛX
ŞOR	SÛR	SOLIN	ŞÛR	SALTY
GORE	GOREWÎ	GEWRE	CÛRAB	
ROJ	ROJ	ROC	RÛZ	
MORÎ	MÊROLE	MORCELE	MÛR	
XWARIN	XWARDIN	WERDENE	XORDEN POXTEN	
PIJANDIN		PEWTENE	-PEZ	

Di devokên Zazakî de û Farsî de dengê /A/yê dibe /O/, /Û/. Di Zazakî/Kirmanckî de bi taybet hin herêm tîpên /A/yê dikin /O/. Di Farsî de ev guhertin, bûye rêzikeke axaftina zimanê devkî (Aslanoglu, 2018, 313; Lezgîn, 2013, 14; Malmîsanij, 2013, 70-73).

#### Ji Zazakî:

Şina ----> Şona

Zanena ----> Zona

#### Ji Farsî:

Dânem ----> Dûnem

Xanden ----> Xûnden

### 3. KETINA DENGAN

Carinan hinek bêje bi dem re her ku ji aliyê gelan ve tên hêsankirin û sivik-kirin, hinek tîp tên kêmkirin. Ev dibe ku ji bi zorê gotina hinek dengên be. Bi vî awayî her herêm an millet di kîjan dengî de zehmetiyê dikşîne wê tîpê an wî dengî radike.

Ûn ku me gotine tîp ketiye, dibe ku di rastîya xwe de di zimanên din de zêdebûna dengên e. Lê me li piraniya wekhevîyan gotiye ku ev ketina dengên e.

**/X/**

Di hin zimanan de hinek deng hene ku di hinek bêjeyan de bi hev re têt û bi hev re dengêkî taybet derdixin. Ev pevdeng in. Eger ev du deng, dengdêr bin jê re pevdengdêr/dîftong(diphthong) têt gotin, eger du dengdar bin pevdengdar(geminate konsonant) têt gotin. Lê di gelek pirtûkên rêzimanî yên Kurdî de hatina /X/ û /W/ bi hev re wek dîftong hatiye pênasikirin. Piştî /X/yê eger dengdara /W/yê bê bikaranîn (XW), ev rêzik derdileve holê (Biçûk, 1977, 23; Tan, 2011, 37; Adak û ên din, 2016, 18). Di Kurmancî, Soranî û Farsî de ev taybetî xuya dike.. /X/ ya ku têt berîya /W/yê têt di Kirmanckî de bi piranî ji holê radibe û bêje bi /W/yê destpê dike. Di vê rêzikê de Kirmanckî ji ên din cudatir dimîne:

Kurmancî	Soranî	Kirmanckî	Farsî
XWÎŞK	XWÎŞK	WIŞK	XWAHER
XWAR	XWAR	WAR	KEC
XWASTIN	XWASTIN	WAŞTIŞ	XWASTEN
XWEDÎ	XUWEDÎ	WAYIR	DARENDE
XWEH	XUWAK, XUWA	WAYE	XWAHER
XWENDIN	XUWÊNDIN	WENDENE	XWANDEN
XWARIN	XWARDIN	WERDENE	XORDEN
XWELÎ	XOLE	WELE	XAKESTER
XEWN	XEWN	HEWŊ	XWAB
XWURÎN		HURÎYENE WURÎYAYENE	XARÎDEN

**/D/**

Berîya dengê /D/ eger /R/ hebe ne herdem lê bi piranî di Kurmancî de dikeve. Di rader an masdara hemû lêkeran de ji bilî Kurmancî di Kirmanckî, Soranî û Farsî de piştî /R/, dengê /D/ têt. Dîsa di gelek bêjeyan de di dawîya bêjeyê de di Farsî de /D/ heye, lê di ên din de ketiye. Mînakên vê jî gelek in (Malmîsanij, 2013, 141; Muhammed, 99).

Kurmancî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
KÊR	KARID	KARD	KARD	
KIRIN	KIRDIN	KERDENE	KERDEN	
GIR	GEWRE	GIRD		
SAR	SERMA	SERD	SERD	COLD
PIR	PIRD	PIRD	POL	BRIDGE
NÊZ	NÊZIK	NÊZDÎ	NEZDÎK	NEAR
MIROV	MIROV	MERDIM	MERDOM	HUMAN
DIZ	DIZ	DIZD	DOZD	
SED	SED	SE	SED	
ZER	ZERD	ZERD	ZERD	
BEN	BEN	BEND	BEND	



XWE	XWÊ	XO	XOD	
BA	BA	VA	BAD	WIND
BÛ	BÛ	BÎ	BÛD	
ZA	ZA	ZA	ZAD	

### /H/

Dengê /H/ li jêr di nav tîpên ku zêdedibin de jî heye. Lê ew mînak ji van cuda-tir in. Ketina dengê /H/yê bi piranî di serî û navberan de ye. Carinan jî di dawîyê de ye. Dengê /H/ya serî dikare wek zêdebûn jî were fikirîn. Ji ber wê me di beşa zêdebûnê de jî behsa wê kiriye. Ji ber ku dibe ku di hinekan de a rast ketin e, di hinekan de jî zêdebûn e. Lê bi qasî ku xuya dibe mirovan ji bo ku ew hêsantir bipeyivin, tîpên wek /H/, /W/, /Y/ ji serî û navberê xistine:

Kurmançî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
RÊHTIN / RIJANDIN	RIJANDIN	RIŞNAYENE	RÎXTEN	
HÊLIN	HÊLANE	HALEN	LANE	
HEYE	HEYE	EST	HEST	EXIST
NEH	NO	NEW	NOH	NINE
HAVÎN	HAWÎN	AMNAN		

Di mînakên jor de di Kirmanckî û Îngilîz de kêmbûna dengê /H/ li ber çavan dikeve. Di Kurmançî û Soranî de jî bikaranîna /H/ wek hevbeşiyekê dîyar e.

Ev jî bi piranî di devokan de pê tê. Mînakên li jêr ji Kurmançî ne. Mînakên ji serî, ji mayîn û dawîyê hatine dayîn (Baran, 2012, 30; Tan, 2011, 41; Aslan, 2018, 53-54; Muhammed, 125):

Hişk ----> Işk

Hûr ----> Ûr

Heşîn ----> Şîn

Rêhtin ----> Rêtin

Rehvan ----> Revan

Bihurîn ----> Borîn

Duht ----> Dut/Dot

Bihost ----> Bost

Fehm ----> Fêm

Sibeh ----> Sibê

Sih ----> Sî

Cih ----> Cî

#### 4. ZÊDEBÛNA DENGAN

Wek me di kêmbûna denga de behs kir, tiştê ku em li vir dibêjin “zêdebûn” e, dibe ku rastîya xwe de “kêmbûn” e. Lê bi qasî ku em li minakan dinêrin em rêzikekê li ser giraniya nêrîna xwe datînin. A girîng ew e ku bi rêzikeke çawa bêje ji hev cuda xuya dikin.

##### /G/,/K/

Her du deng ezmandevkî (velar) ne ku bi zimên û ezmanê dêv dikevin. Bilêvkirina wan pir nêzika hev in (Gündoğdu, 67; Tan, 19). Di dawîya bêjeyan de pir caran dengê /G/ an /K/ ji zimanên din zêdetir tê:

Kurmancî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
PEL	GELA	PEL	BERG	
MAK	MA	MAYE	MADER	MOTHER
MIRIN	MIRDIN	MERG	MERG	

##### /H/

Ev tîp bi piranî di Kurmancî de di serê bêjeyê de wek tîpeke zêde tê bikar anîn. Di ên din de bi piranî tuneye (Malmîsanij, 2013, 144-145). Di vê rêzikê de jî cudabûna Kurmancî eşkere derdikeve holê. Mînakên vê jî gelek in:

Kurmancî	Soranî	Kirmanckî	Farsî	English
HEJMAR	JIMAR	HOMARE	ŞOMARE	
HESIN	ASIN	ASIN	AHEN	IRON R-S
HAVÎN	HAWÎN	AMNAN		
HEVÎR	HEVÎR	MÎR	XEMÎR	
HINDIK		ŞENIK	ENDEK	
HESP	ESP	ESTOR	ESB	
HÊSAN	ASAN	ASAN	ASAN	EASY
EWR	HEWR	HEWR	EBR	
HÊK	HÊLKE	HAK		EGG
ERZAN	HERZAN	ERJAN	ERZAN	
ÇAR	ÇIWAR	ÇAR	ÇEHAR	FOUR
HESTÎ	ÊSK	ESTE	OSTOXAN	

Di heman demê de di nav zaravayê de jî dikare ev tişt were kirin. Wek mînakên li jêr di Kurmancî de tîpek lê hatiye zêdekirin. Lê hinek nivîskar vê zêdebûnê wek ketin nîşan didin (Tan, 2011, 44):

Êdî ----> Hêdî  
Erê ----> Herê

Eger ----> Heger  
Alîkarî ----> Harîkarî

## 5. ENCAM

Ziman jî wek mirovan zindî ye û her roj xwe nû dike, mezin dibe, fireh dibe, ciwan dibe, kal dibe û ger neyê xebitandin û bikaranîn di dawîyê de dimire jî. Di vê xebata zimanî de tiştê ku ber çavê meriv dikeve ew e ku ziman bi dem re gelek ji hev dûr dikevin. Di gelek mînakên de meriv dibîne ku bi taybet tîpên ku bilêvkirinê de nêzika hev in, zêdetir cihên xwe diguherînin û tevlihev dibin. Yanî deng, girêdayê lêvkî, diranî, lêvkî-diranî an bêvilbûna xwe an herwekî din, bi tîpên ji heman jêderê re nêzika hev in û diguherin.

Serê bêjeyan zêdetir wek hev in û pir dişêbin hev. Tenê dibe ku di hin tîpên ku pir nêzîk hev in û zêde diguherin, dikarin di serî de jî biguherin, wek "B"- "V". Navbera bêjeyan jî zêde ji hev ne cuda ne. Tenê di hinek dengên de eger di ziman an zaravayekê de bikaranîn zêde be, ew dengê navberê jî hatiye guhertin. Wek: tamam, tewaw, tevav. Dawîya bêjeyan her dem bi awayakî hêsan gelek tîpên cuda digire. Sedema vê jî ew e ku mirov dema dipeyivin çî ji wan re hêsan be wisa lê zêde dikin. Di dawîya bêjeyan de anîna qertaf, paşgir û daçekan, bandora tewangê, kelijandina bêjeyên cuda bi dawîya bêjeyê ve, çêkirina bêjeyên hevedudanî û dariştî derdikevin holê û ji ber gelek sedemên wek van dawîya bêjeyê pir diguhere. Hinek bêje wek me got hevedudanî an dariştî ne. Lê ji be guherînan di nav hev de wenda bûne û meriv bir bêjeyêke din re têkilîyekê zû zû nabîne. Lê di rastîya xwe de dibe ku ji çend beşan pêk hatîye û hinek guherîn çêbûne.

Bi bandora gelek tiştan gelek tîp û deng wenda dibin an peyda dibin and şeklê xwe diguherînin. Lê dema meriv bi awayekî kûr binêre, dibîne ku bi rastî têkiliyêke mezin di nav vê malbatê de an zaravayan de heye û ger meriv van rêzikan zanibe, bi şeklekî hêsantir dikare zimanan hîn bibe û têkilîya wan bibîne.

## 6. ÇAVKANÎ

Adak, A., Aydın, T., Ergün Z., Mikail B., (2016). *Mamoste 1 Fêrkera Kurdî Asta Seretayî*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Aslan, Ş. (2018). *Lêkolînek Li Ser Rêzimanê Kurdî (Kurmançî)*, İzmir: Weşanên na.

Aslanoğlu, O. (2018), *Kendi Kendine Kolay Farsça*, İstanbul: Kent Işıkları Yayınevi.

Aslanoğlu, O., İslamoğlu, B., Gürür, Z., Acar, H., Aslanoğlu, E. (2011), *Ferhenga Pirzimanî*, İstanbul: Weşanxaneya Nûbiharê.

Aykoç, F. M. (1996), *Kurdîzan Rûberîna Zaravên Kurdî*, Berlin: Weşanên Enstîtûya Kurdî.

Badıllı, K. (1992), *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*, İstanbul: Med Yayıncılık.

- Baran, B. (2012), *Rêzimana Kurmancî*, İstanbul: Belkî Yayınları.
- Bedirxan, C. A. (1994), *Bingehên Gramera Kurdmancî*, Weşanên Nûdem.
- Bedirxan, E. C. û Roger, L. (1997), *Kürtçe Dilbilgisi*, İstanbul: Weşanên Doz.
- Biçûk, S. (1977), *Rêzimanê Kurdî (Kurmancî)*, Berlin: Weşanên Enstîtûya Kurdî.
- Blağa, (1997), *İran Halkları El Kitabı*, İstanbul: Yeni Zamanlar Dağıtım.
- Coşkun, M. V. (2007), *Standart Türkçede Ses Olaylarının Sebep-Sonuç İlişkisi Çerçevesinde Yeniden Sınıflandırılması*, Dil Bilimi, Dil Bilgisi Ve Dil Eğitimi, 3 Cilt, 38. ICANAS Uluslararası Asya ve Kuzey Afrika Çalışmaları Kongresi, 347-368.
- Donald, J. (1867), *Chamber's Etymological Dictionary of English Language*, London: W&R Chambers.
- Farqînî, Z. (2000), *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, İstanbul: Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.
- Ferhengistanê Zebanê Farsî*, Tahran.
- Gedikli, Y. (2015), *Dillerin Şifresi Dilleri Kökeni ve Türeyişi*, Cilt 1, İstanbul: Boğaziçi Yayınları.
- Gültekin, S. (2010), *Ro ser zarawaya Kirmanckî Xebata Gramerî*, İstanbul: Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.
- Güdoğdu, S. (2016), *Remarks on Vowels and Consonants in Kurmanji*, Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Cilt: 4, Sayı 1, 57-70.
- Gündüz, D. (2009), *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Kirmancca/Zazaca Dil Dersleri*, İstanbul: Vate Yayınevi.
- Gürer, G. (2004), *Ağız Tartışmalarında Ses Özelliklerinin Sınıflandırılması Üzerine Düşünceler ve Uşak İli Ağızı Örneği*, İlmi Araştırmalar Dergisi, Sayı 18, 31-44.
- Güvenç, M. (2015), *Dilin Tarihi*, İstanbul: Türkiye İş Bankası Yayınları.
- Hunutlu, İ. (2018), *Türkçede K- > G- VE T- > D- Tonlulaşması Üzerine Düşünceler*, Türkiye Araştırmaları Enstitüsü Müdürlüğü, 161-186.
- Kanar, M. (1999), *Çağdaş İran Edebiyatının Doğuşu ve Gelişmesi*, İstanbul: İletişim Yayınları.
- Kırkan, A. (2019), *Zazacanın fonetik açıdan incelenmesi; Kuzey, güney ve merkez Zazacasının karşılaştırılması*, Nameya Doktorayê ya Çapnebûyî, Zanîngeha Dicleyê, Enstîtûya Zanistên Civakî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî.
- Kurdo, Q. (2013), *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*, Wer: Zülküf Ergün, İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- Lezgîn, (2013), *Ji bo Kurmancan bi Awayekî Muqayeseyî Gramera Kirdkî (Zazakî)*, Diyarbekir: Weşanên Roşna.
- MacKenzie, D. N. (1373), *Ferheng-i Kûçek-i Zebanê Pehlewî*, Wer: Mehşîd Mîr Fexrayî, Tahran: Pujuheşgâh-ı Ulûm-u İnsanî ve Mutalaat-ı Ferhengî.
- Malmîsanij, M. (2013), *Kürtçe'de Ses Değişimi*, İstanbul: Weşanên Vate.
- Muhammed, H. *Dengnasî di Kurdî de*, Çavkanîya Dijital, <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/08/dengnasi1.pdf>, Dema gihîştine: 10.11.2019.

- Muhammed, H. *Rehnas Ferhenga Etimolojîya Kurdî*, Çavkanîya Dijital, <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/11/rehnas.pdf>, Dema gihîştîne: 10.11.2019.
- Nourai, A. *An Etymological Dictionary of Persian*, English and other Indo-European Languages,-.
- Rahimpour, M. û Dovaise, M. S. (2011), *A Phonological Contrastive Analysis of Kurdish and English*, International Journal of English Linguistics, Vol. 1, No. 2; September, 73-82.
- Sadiqî, E. (1395), *Erabe, 'Erabe*, Îranşehrê Îmrûz, Sal 1, Jimar 3, Şehrîwer-Mîhr.
- Sağniç, F. H., (2014), *Dîroka Wêjeya Kurdî*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Sait Çakar, M., Fehim I., Mehmet M., Ronayî Ö., Esra S., Sami T., (2011), *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları.
- Sivrioğlu, T. (2015), *Avesta Dili ve Grameri ve Etimolojik Sözlüğü*, İstanbul: Avesta Yayınları.
- Sheyholislam, J. (2015), "The language varieties of the Kurds", The Kurds History - Religion - Language – Politics, Austria,
- Tan, S. (2011), *Rêzimana Kurmançî*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Xanlerî, P. N. (1347), *Zebanşînasî ve Zebanê Farsî*, Tahran: Întişaratê Bunyadê Ferhengê Îran.
- Yıldırım, N. (2014), *Farsça Dilbilgisi*, İstanbul: Kabcacı Yayınları.

### Extended Abstract:

There are five basic language families in the world. The most widely spoken language among these is the Indo-European language family. As understood from its name it has basically been divided into 2 branches: Indian and European branches. These branches are also divided into subcategories in itself. This distinction is a form that is based on the proximity of languages. Most of the major European languages are included in this group. The languages spoken in Europe, Asia and America continents are largely included in this group. Therefore, all the languages which are situated under these language branches are less or more related with one another. However, languages have undergone lots of changes since the birth of languages as long time passed due to the geographical conditions, cultural differences, political and social relations and phonetic factors. Some of them have almost no relationship with others. Some still have great similarities due to the close relationship. Nevertheless, very small amount of common aspects are clearly seen. As to a large proportion that has undergone phonetic change is not recognized by many.

As this is the situation, lots of people are generally unaware of this relationship here while they are learning another language from the same language family. Therefore, they have difficulties while learning the related languages. Phonetic changes have been so advanced in some languages that even the dialect of a language has become unable to understand the other dialect. As a result of this, the ones speaking different dialects of that language don't sometimes even know, see and unwilling to see that they are the dialects of the same language.

Here, at this point, it has importance to know the relationship between the languages that are in the same language family. Changes between these languages often show us some phonetic rules. We see that some sounds like a formula historically turn into different sounds afterwards or some sounds in one region are replaced by different sounds in another region. Linguists have done a lot of researches over these changes and have written many works to see and demonstrate these relationships between different languages. In the narrower circle, we decided to focus on these changes on the Kurmanji, Kirmanjki(Zazaki), Sorani which are three dialects of Kurdish and the Persian and English. In this way, in this study, we are going to try to focus on the sound changes in Kurdish's own dialects, in Persian, a close neighbor from the same language family, and in English, which has become a world language.

The first source of our work on these sound changes will be Ferhenga Pirzimani, a product of teamwork before. Besides, comparative language studies, grammar books, dictionaries and research articles written on this subject will be utilized.

# Kirmanckî de Vengê Siruştî

## Onomatopoeia in Kirmancki

Ahmet KIRKAN\*

### KILMNUS

Heme ziwananê dinyayî de vengê siruştî cayêko muhîm de yê. Nê vengî rewşa tebi de yenê meydan. Vengê siruştî bingeyê ziwani teşkil kenê. Ma na xebata xo de vengê siruştîyan ê kirmanckî analîz kerdî. Na xebate de amancê ma vengênê siruştîyan ê kirmanckî tesbîtkerdiş û seba xebatanê muqayeseyinan bingeyêk viraştiş o. Çarçewaya na xebatî ya teorîke vengênê siruştîyan û mîyanê cumle de karardişê nînan ra pê yena. Mîyanê xebate de derheqê nê vengênê de sewbîna analîzî nêameyê kerdene. Zaf taybetîyê nê vengênê estê labelê ma tîya de nê taybetîyan ser o nêvindertî. Na xebate de nêzdîyê 300 hebî vengê siruştî bi nimûneyan reyde ameyê dayene. Nê vengê siruştî kirmanckî de hîna zaf ê.

**Kilîçekuyî:** Vengê Siruştî, Kirmanckî, Ziwannasî, Înterjeksiyon.

### ABSTRACT

Onomatopoeia words have an important place in all languages of the world. These sounds occur naturally. Onomatopoeia words form the basis of language. In this study, we examined onomatopoeia words in Kirmancki. The aim of this study is to identify the onomatopoeia words in Kirmancki and to form the basis for further studies. The theoretical framework of this study consists of onomatopoeia words and their use in sentences. There are many features of onomatopoeia sounds, but we did not mention these features here. In this study, approximately 300 onomatopoeia word samples are given together. These sounds may be different in other places where Zazas live. In the Kirmancki onomatopoeia words are much more.

**Keywords:** Onomatopoeia, Kirmancki, Linguistics, Interjections.

---

\* **Dr. Unîversîteya Mêrdîn Artuklu, Beşê Zivan û Edebîyata Kurdî,**  
e-mail: ahmetkirkan@gmail.com, orcid.org/0000-3885-5218

## 1. DESTPÊK

Heme ziwananê dinyayî de vengê siruştî muhîm ê. Vengê siruştî bi teqlîdê vengane xozayî ya yenê meydan. Nê tewir vengî zafine raste rast vengane xozayî ra gêriyayê. Nê vengî mîyanê xozayî de hem vengane ganîyan hem zî bêganane reyde têkildar ê (Hengirmen, 2009: 314). Nê vengî sey înterjeksîyonan zî qebul benê. Labelê sînore vengane siruştîyan yê înterjeksîyonan ra hîra yo. Çünke taye vengê siruştî estê ke sey vengê nîdayî yanî înterjeksîyonan nêyenê şuxulnayene.

Nê vengî zaf hetan ra yenê dabeş kerdene. Kes eşkeno nê vengane goreyê çimeyan dabeş bikero. O wext vengê siruştî sey vengê ganîyan û vengê bêganane benê di parî. Vengê ganîyan mîyanê xo de sey vengê heywanan û vengê însanan di qism ê. Herçiqa seba her vengê heywanî nameyêko taybet nêameyo dayene zî, eslê xo de her heywan vengêko taybet vejeno. Goreyê ney kes eşkeno çimeyanê vengane siruştîyan wina dabeş bikero: vengê siruştîyê ke heywananê kedîyan ra vejîyênê, vengê siruştîyê ke cureyê milçikan ra vejîyênê, vengê siruştîyê ke lulikan ra vejîyênê, vengê siruştîyê ke însanan ra vejîyênê, vengê siruştîyê ke bêganîyan ra vejîyênê (Kudaybergenov, 409). Ziwane kurdî de vengê taye heywanan ameyo pênerkerdiş labelê zaf heywanî estê ke vengê înan nêameyo kategorîze kerdene û name kerdene. Vengê însanan zî kes eşkeno sey vengê camêrdan, vengê cinîyan û vengê gedeyan dabeş bikero. Vengê siruştî xususe demê gedeyîye de zaf ê. Kurdî û xususe kirmanckî de taye vengê siruştî (xususe înterjeksîyonî) estê ke tena seba camêrdan yan seba cinîyan yenê şuxulnayene. Mîyanê xebate de ma nê vengî îzah kerdî. Vengê ke taybetê cinîyan ê, seba camêrdan bêre şuxulnayîş, herçiqa qedexê nêbo zî, mîyanê cematî de weş nêvîneyêno. Mîsale camêrdêk sewbîna camêrdî xîtab bikero û vajo *lê* no sey xeletî yeno şirove kerdene. Çünke *lê* xîtabkerdişê cinî yo. Na rewşe eslê xo de zayendê tebî reyde têkildar a. Zayenda tebî heme ziwanan de esta.

Na xebate de amancê ma vengane siruştîyan ê kirmanckî tesbîtkerdiş, qeydkerdiş û seba xebatanê muqayeseyinan bingeyêk viraştîş o. Heta nika kirmanckî de vengê siruştî nêameyê kom kerdene. O semed ra derheqê nînan de xebate muqayesinî nêyenê kerdene yan zî nê çekuyî nêyenê nîrxnayene. Na xebate de nê çekuyî goreyê rêze alfabeî amade bîyê. Seke cêr ra zî ameyo îfadekerdiş, nê vengane ser o kes eşkeno zaf çîyan vajo. Nê vengî goreyê mana, şeklî, parçeyan ûsn taybetîyan şênê bêre dabeş kerdene. Labelê nê tewir xebatî anca bade komkerdişê nê çekuyan mimkun beno.

Ehemîyet û giranîya na xebate bi hawayêko sistematîk nê çekuyan rêzekerdiş ra yeno. Tîya de heme mintiqayanê kirmancan ra nê çekuyî nêameyê kom kerdene. Kes eşkeno ney sey sînordarîya xebate îfade bikero. Herçend ma dest ra ame, ma seba nîmûneyan cîya mintiqayan ra kitabî weçînayî. Labelê heme vengî siruştî kitabane de ca nêgînê. Heta taye vengê diletî estê ke xoser yenê şuxulnayene, mîyanê



cumle de nêyenê kar ardene. Nê tewir vengî ganî xebatanê warî de bêrê tesbîtkerdiş û qeydkerdiş. Na çarçewa hîra ya û sînoranê na xebate derbas kena.

Vengê siruştî goreyê manaya çekuyan zî yenê dabeş kerdene. Nê vengyan taye ci xoser yanî yew çekuya ra yenê meydan labelê zafine vengê siruştî sey çekuyanê dîletan yenê kar ardene (Kudaybergenov, 410-411). Vengê siruştîyê ke tena çekuyêke ra teşekul kenê yan manayin benê (mîsale hey!) yan zî bêmana benê (mîsale dirîng); vengê siruştîyê ke di çekuyan pê yenê sey çekuyê diletî qebul benê. Nê çekuyî goreyê manayî: yan çekuya ewile bêmana bena, ya dîyine manayine bena (mîsale O-ho); yan çekuya ewile bêmana, ya dîyine manayine bena (mîsale cîz-wîz); yan her di çekuyî zî bêmana benê (mîsale bix-bix) yan zî her di çekuyî manayin benê (mîsale hey-wax).

Derheqê ziwane ewilî û meydan vejîyayîşê ziwanan ser o zaf teorî estê la nê teorî ziwannasîya modern de zaf rexbet nêvînenê. Teorîyê ke bi vengane siruştî ya eleqedarê, ziwane ewilîni bi vengane siruştîyan a îzah kenê. Ganî bêro îfadekerdiş ke nê teorîyî orte vejîyayîşê ziwanan bi şeklêko baş nêşkenê îfade bikerê. Teorîyê ke ziwane ewilî û orte vejîyayîşê ziwani hîna bi teferuat îzah kenê, ziwannasîya modern de meqbultir ê. Çunke ziwannasîya ke badê seserra 20. de aver şîya, ziwani sey pergali qebul kena û derheqê ziwani de acigêrayîşanê înterdîsîplînerî rê ehemîyet dana (Kırkan, 2019: 31-33). Cêr ra teorîyê ke ziwane ewilî bi vengane siruştîyan girêdanê kilmkî ameyê îzah kerdene.

Nê teorîyan ra yew teorîya *Bow-wowî* ya. Na teorî sey teorîya refleksîyon (yan-sîma) yena name kerdene. Bîngê na teorî de vengê ke xozayî ra derbasê ziwani bîyê estê (Yaylagül, 2015: 64). Goreyê ney heme ziwanan vengane siruştî ra neşet kerdo û însanan vengê xozayî teqlîd kerdê û ziwani no şeklê vejîyayê meydan. Seke yeno zanayene vengê siruştî mîyanê ziwani de zaf kême ê; heme taybetmendîyê ziwani nêşkenê îfade bikerê. O semed ra vengane siruştî ra neşetkerdişê ziwanan mimkun neaseno. Pergalêko qasê ziwani komplîke û aloz, tena bi vengane siruştî nêyeno îzah kerdene.

Derheqê orte vejîyayîşê ziwani de teorîya dîyine teorîya *Poolh-poolhî* ya. Goreyê na teorî înterjeksîyonê ke insanî înan cîya cîya rewşan de îfade kenê, dima sey çekuyan yenê qebul kerdene û mefhuman rê nîşan kenê (Yaylagül, 2015: 64-65). Taye ziwannasî na teorî bi vengane heywanan a eleqedar vînenê. Goreyê nînan ziwani vengane heywanan ra neşet kerdo (Zivingî, 2017: 161). Înterjeksîyonê ke insanî vejenê, sînorkerde ye û cîya ziwanan de seba heman rewşe cîya înterjeksîyonî yenê îstîmal kerdene. Nê înterjeksîyonanê bisînoran a mefhumê bêsinorî yê ziwani nêyenê îfade kerdene.

Teorîya bine teorîya *Yo-he-ho* ya. Însani gama ke pîya kar kenê vengane rîtmîkan vejenê. Xususen dewan de nê tewir karî zaf zêde yê. Însani karanê çetinan pîya

kenê. Gama ke nê karan kenê seba rîtmî û pê xeyretardişî dêrî kenê. Goreyê na teorî, ziwanan nê dêran vengane besîtan û rîtmîkan ra teşekul kerdo (Îsmail, 2009: 10). Labelê heta nika nê dêran û vengane besîtan ziwaneke newe nêveto meydan. Mîsale gama ke kêneyî yan lajên ciwanî soqîyan de bi darkutan a çîyan kuwenê, seba rîtmî dêrî vanê yan vengê besîtî vejenê. Labelê nê vengane û dêran heta nika ziwaneke bin nêveto meydan. Na teorî bingeyê ziwani îzahkerdiş de kêmi maneno.

Teorîya bine teorîya *Ding-dongî* ya. Goreyê na teorî insanî derûdorê xo reyde têkilî ronane. Gama ke nê têkilîyan ronane reaksiyon dane. Nê reaksiyonî zafine bi vengane a tesîs benê. Nê vengî bingeyê ziwani awan kenê (Bayraktar, 2014: 61-62). Seke yeno zanayene reaksiyonê ke insanî dane zaf taye, bi ney a bingeyê ziwani îfadekerdiş nêbeno (Zivingî, 2017: 161-162).

Ziwannasê musulmani bingeh û çimeyê ziwani ilahî vînenê. Goreyê înan, ziwane terefê Homayî ra sey taybetîyêko ilahî (wehbî) deyayo insan. İnsan bi nê mewhîbe ya eşkeno çîyan name bikero. No namekerdiş seba çekuyanê neweyan rayîrêke akeno. Ziwannasê musulmani qabilîyetê ziwani sey çiyêko wehbî qebul kenê (Îsmail, 2009: 9). Heta nika derheqê ziwani, vengane siruştîyan ser o xebatî ameyê kerdene. Bê nê teorîyan sewbîna teorî zî estê. Teorîyê binî bingeyê ziwani û orte vejîyayîşê ziwani sewbîna faktorane a girêdanê. O semed ra ma behsê înan nêkenê. Derheqê vengane siruştîyan xususen erebkî zaf kitabî ameyê nuştene. Mîsale nê kitabane ra yew eserê Abbas Îsmailî (2009) vengane siruştîyanê kurdkî bi erebî muqayese û îzah keno. Kitabê ke vengane siruştîyan îzah kenê, teorîyanê ziwane ser o zî vîndenê. Heta taye kitabane de erebkî û kurdkî bi şeklêko muqayeseyin nusîyayê.

## 2.VENGÊ SIRUŞTÎ

Cêr ra vengê siruştîyê ke ma kom kerdî goreyê rêza alfabeyî ameyê dayene. Seba her vengî cumleyêka nimûne deyaya. Seba ney kitabê ke ma dest bî ma tedqîq kerdî. Nê kitabane de seba taye vengane nimûneyî estbî ke ma nê cêr ra tablo de nişan dayî. Labelê seba taye vengane nimûmeyî peyda nêbîyê. Semedê nê vengane zî ma cumleyî saz kerdî. Çunke nê tewir vengî xoser wayîrê mana nîyê yan manaya nê vengane ancax mîyanê konteksî de yeno fehm kerdene. Taye vengî qandê zaf rewşan vajîyênê. Nê manayî tablo de ameyê îfadekerdiş labelê tablo de tena yew mana rê nimûne deyayo. Kitabane de nimûneyî alfabeyanê çîyayane ameyê nuştene. Tîya de alfabeyan rê mudaxele nêbîyo. Nuştoxî çî hewa nuştoma zî o şekil neql kerd. Nê vengî tena ameyê rêzekerdiş û goreyê sewbîna krîterane nêameyê analiz kerdene.

Tablo: Kirmanckî de Vengê Siruştî

	Veng	Mana	Nimûne
/a/	A	belê, e	Kênek va ke: A sey to yo.
	Ah	Vengê dejayîşî û bêrikerdişî	Ah ê rojê verênî apey nêyenê.
	Aha	Vengê baldarî	"Ahaa biradero xoşewîst." (Canşad, 2007: 24).
	Aman	Vengê teesuf û emanî	"Aman hawar, ti yê çire wina kenê." (Adabeyî, 2005: 92).
	Ax	Vengê elem û dejayîşî	"Ax-bux pisinge to qey niya kerd?" (Çîçek, 2012: 38).
	Ax û wax	Vengê elemî	"Ax u wax meke!" (Çelker, 2005: 137).
	Ay	Vengê nalayîş û nêweşî	"Ay dayê, ay dayê!" (Zengelan, 2007: 47).
/b/	Ba	Vengê ewil yê gedeyan	Gedeyî dest bi "ba, ba" yî kerd bi.
	Bar-bar	Vengê lejî û qîrîn	Ewro bar bara inan ra ma eciz bî.
	Bawo-bawo	Vengê emanî, heyretî, deji	"Bawo zerê mi dezeno." (Çîçek, 2012: 19).
	Bavo-bavo	Vengê emanî, heyretî	"Bavo bavo çixa serdo." (Koêkorta, 2001: 9).
	Be	Vengê tersnayîşî	"Vano "beee!" na keynek ci tersena." (Adabeyî, 2005: 89).
	Biv	Vengê tersnayîşê gedeyan	Dadî lajê xo rê biv biv kerdê.
	Bix-bix	Vengê fetîşiyayîşî	Şeker şî qira ci, bi bix bixa ey.
	Bor-bor	Vengê lejî, bermayîşî	Pole de bor bora mamosta ya.
	Bom	Vengê teqiyayîşî	Orte de her kesî de bom va û balon teqînê.
	Bûr-bûr	Vengê lejî, bermayîşî	Bûr bûra şima dinya werd.
/c/	Car	Vengê qîrayîşî	Car cara inan sereyê ma werd.
	Car-car	Vengê qalikerdoxan	Car cara ciniyan bî.
	Ciq-ciq	Vengê cawitişê qanikî û milçikan	Lajekî ciq ciq qanik cawitê.
	Ciz	Vengê hewnaşiyayîşî	"Cizzz, cizzz, cizzz" (Çağlayan, 2017a: 93).
	Ciw-ciw	Vengê milçikan	"Ciw, ciw, ciw!" (Kurij, 2014: 131).
	Ciz-wiz	Vengê bilbilan û qîrinceleyan	Ciz wiz nêzana.
/ç/	Çak-çak	Bi veng a qalikerdiş	Çak çaka fekê şima tu nêvindert.
	Ço hey	Vengê îdarekerdişê mangayan	Şîwaneyî vatê ço hey!
	Çelpîn	Vengê pîrodâyîşî	Çelpîn guma ey ra ard.
	Çelp-çelp	Vengê gunayîşê awe	Lincî de çelp çelp kay kerdê.
	Çelp-çelp	Wextê werdişî vengê lewanê însanî	Çelp çelpa fekê ey nerehat kerda.
	Çep-çep	Vengê çepikan	Vengê çepikan ameyê teber.
	Çeq-çeq	Vengê pêgunayîşê dindanan	Serd ra çeq çeqa dindanê ma bî.
	Çilqe-çilq	Vengê çilqiyayîşê çîyanê awkinan	Miyanê metereyî de do çilqayê.
	Çing-çing	Vengê çîyanê metalan	Çing çinga berî ya.
	Çingîn	Vengê metalan	Tasi ha çingiyê ha şikiyê.
	Çit	Vengê çiyeko şikêno	"Çit çin a." (Çağlayan, 2017a: 96).
	Çiw-çiw	Vengê milçikan	Çiw çîwa milçikan boya ma akerd.
	Çiz	Vengê hewnabiyayîşê adirî	Kozê adirî awe ra dima bi çizîna hewna şî.
	Ço-ço	Vengê îdarekerdişê estor yan heran	"Ço ço ço, raye ra reyê kî..." (Aldatmaz, 2013: 15).
	Çoş	Vengê îdarekerdişê her ûsn. heywanan	"Eger tu va 'çoş!' wi ben herr." (Kurij, 2014: 55).
	Çûçê	Seba gedeyan "ronişe"	Çûçê bike.
	Çûz-çûz	Vengê pizeyê însanê vêşanî	Vêşaniye ra çûz çûza pizeyê inan bî.

/d/	Deh-deh	Vengê idarekerdişê estor, deve ûsn,	“Deh deh soxê ca to rê hesret bi...” (Adabeyi, 2005: 18).
	Deh, de	Vengê qebug nêkerdişî	“Deh, ez bawer nêkena ke bi no tore...” (Çem, 2007: 431). De biseqêr!
	Dep-dep	Vengê def	Dep depa def ra muridan kelecana girewtbi.
	Diring	Vengê kewtiş, teqiyayiş, pirodayiş	Diring gûna erd ro.
	Dirr-dirr	Vengê awedayişê heywanan	Şiwaneyî vengdayê heywanan: Dirr dirr!
	Dup-dup	Vengê niqara	Dup dupa niqarayan mehela ra ameyê.
/e/	E	Bi manaya belê	“E, estê.” (Ayyıldız, 2014: 78).
	Efte-eft	Vengê kutikana	Eft efta kutikana bi.
	Eh	Vengê ecizbiyayişî	“A, ehhl!” (Çağlayan, 2017a: 184).
	Eman	Vengê emanwaştîşî	“Ax eman eman xerîbiye...” (Kurij, 2014: 137).
	Erê	Vengê vengdayişê cinîyan	Erê min hên zona seda goşê mi de şiyê.
	Erê	Bi manaya belê	“Erê, ma yenî.” (Aldatmaz, 2013: 78).
	Erek	Vengê ecibnayişî	Erek çiqas weş o!
	Ero	Vengê vengdayişê camêrdan	“Ero Bijo rawurze lawo, rawurze!” (Dogan, 2015: 31).
	Ew-ew	Vengê kutikana	Ew ewa kutikana goşê ma berdî.
	Ewt-ewt	Vengê kutikana	Ewt ewt meke!
	Ex-ex	Vengê qirika xo pakkerdişî, nîdayî	Ex ex bike, wa qirika to pak bibo.
	Ey	Vengê nîdayî	Ey merdimo xizûn!” (Mîrwanî, 2012: 48).
Eyf	Vengê ecizîye, ecêbmendişî	“Eyf! Kutikto na işkijer buru se kero?” (Adabeyi, 2005: 83).	
Ey-wax	Vengê qehrî	“Eywax welat şirin o.” (Kurij, 2014: 22).	
/ê/	Ê	Bi manaya belê	“Ê, Xal Huso winî vano.” (Ayyıldız, 2014: 137).
	Êh	Vengê telebê huşkerdişî, redkerdişî	Êhh bes o, êdî goş nêdana to.
/f/	Fike-fik	Vengê tûtîyan, qalan	Se bi fik fika şima ya.
	Filç-filç	Vengê werdişê insanana	Filç filça fekê to ra îştahê ma rema.
	Fir-fir	Vengê awe ûsn şîmitene	Ez awe ra di firî bigîra bes o.
	Firîn	Vengê teyrana	“Naşî, ha firra ha zirra.” (Malmîsanîj, 2000: 150).
	Fis	Vengê va ci kewtene	“De wirz uca ra fisina pis.” (Kurij, 2014: 220).
	Fiş-fiş	Vengê zincîya insanî	Serd sirewtbî fiş fişa zincîya ey bî.
/g/	Gal-gal	Vatişo ke nêyeno fehmkardiş	Cinî gal gal kerdê.
	Gim-gim	Vengê sixletîye	“Gim-gima balixan...” (Çem, 2007: 14).
	Gurpe-gurp	Vengê lîganê insanî ra vejîyêno	Gurp gurpa aye bî.
	Gur	Vengê vayî û birûskana	“Hewr gurreno.” (Malmîsanîj, 2000: 161).
	Gujîn	Vengê reyêk ra rijîyayişê awe, varanî	Varanî gujîne na ser.
	Gumîn	Vengê akewtişê birûskana, vengo	Birusk akewt, gumîn
	Gumî	berz	kewt ci ser.
	Gur-gur	Vengê kozanê adirî	Şiwanê adir wekerdbi, gur gura ey bî.
	Guv-guv	Vengê vayî	Guvîna vayî ma kerdîbî kerî.
	Gum-gum	Vengo berzo xofîn	Keyeyî talanî ra gum gum veng ameyê.
	Gurmîn	Vengê kewtişê erdî û pirodayişî	Mî ey ra gurmîn vete.
	Gir-gir	Vengê hereketê makîne ûsn çîyan	“Gırrr, gırrr...” (Çağlayan, 2017a: 93).
Guş-guş	Vengê awa herîkbare	Çem ver o ronîştî, guş guşa awe bî.	
Guj-guj	Vengê herîkiyayişê awe	Reyêk ra guj guj awêke verdê xo ser.	

/h/	Ha	Belê, e, tesdiqkerdiş	“Xidir domanek o, haa!..” (Canşad, 2007: 81).
	Ha	Vengê xîretardişî	“Ha qurban, ha heyran!” (Say, 2013: 111).
	Haa-ha	Vengê qebulkerdişî	“Haaa ha! Eynî ayo yo!” (Malmîsanîj, 2000: 294).
	Hewar	Vengê hewarwaştîşî	“Hewar şûno, hewar şûno.” (Kurij, 2014: 61).
	Ha-ho	Vengê hetkarî waştîşî, îmdat kerdene	“Haho la haho, naçî duzana.” (Ergun, 2010: 97).
	Ha-hay	Vengê qerfî kerdişî	“Tever ra vana: Ha hay!” (Aldatmaz, 2013: 99).
	Hay-ho	Vengê hetkarî waştîşî, îmdat kerdene	“Hayho, hayho!” (Hayig, 2007: 48).
	Hewu	Vengê hurdi vînayîşî, ecêbmendişî	“Hewuu, hala nîyadê çîyo ke vano?” (Çem, 2007: 81).
	Hey-wax	Vengê qehrê xo ardişî	“Heywax! Bê, bê vano...” (Aldatmaz, 2013: 76).
	Hey	Vengê nîdayî	«Heey! Arisa min a dinî xewa giran...» (Çiçek, 2012: 60).
	Heya	Belê, e	“Vanê: Heya.” (Çiçek, 2014: 115).
	Hi	Vengê cewabdayîşî	“Gulcan! Vat. Hi!” (Çem, 2007: 273).
	Hime-him	Vengê vatîşê pînhanî, fehmkerdişî	“Him! Tîya ra boya însanan a yena.” (Aldatmaz, 2014: 189).
	Hiş	Vengê hişkerdişî	“Hiş, hiş, hişşş...” (Koêkorta, 2001: 88).
	Hîre-hîr	Vengê huyayîşê vengîni, vengê vergî	“Verg giyeno seyda keno hîrri cey...” (Mîrwanî, 2012: 111).
	Ho-ho	Vengê ecîziye û persî	“Ho-ho ti mi xo rê kena cinîye ki!” (Ballikaya, 2010: 43).
	Hop-hop	Vengê şematîye	Hop hopa şîma ya, bes!
	Hoşt	Vengê qewirnayîşê kutikan	Kênek ey ra va hoşt, la ey fehm nêkerd.
	Hoş	Vengê estor vindartişî	Vindert vindert va: “Hero hoş!”
Hîq-hîq	Vengê huyayîşê vengîni	Hîq hîqa înan zaf weşbî.	
Helke-helk	Vengê lezkanî cîf gîrewtîşî	Helk helk zaf zor cîf gîrewtê.	
Hurm-gurm	Vengê dejnayene û şematîyî	“Nê hurm û gurm!” (Aldatmaz, 2014: 195).	
/i/	Inte-int	Vengê merdimo ke baro giran hewadayo, vengê nêweşî	Binê barî de inte inta ey bî.
	Ix-ix	Vengê qirik pakkerdişî	“[q]ix-[m]ix çin o.” (Mîrwanî, 2012: 77).
/î/	Îsk-îsk	Vengê bade bermayîşî	Nêzana derde xo vajo îskîni kewt ser.
	Î	Vengê zerrî têwdayîşî	Îîî zerrîya mi, mi fek ra amê.
/k/	Keh-keh	Vengê huyayîşî, qerfîkerdiş	No keh kehê to zaf zorê min şîno.
	Kir-kir	Vengê gama ke kes çiyêko huşk weno	Kir, kir, kir! Siba ra nêqedîya.
	Kirp	Vengê reyêk ra birnayene	Kirp va huş bî.
	Kirt-kirt	Vengê gama ke kes çiyêko huşk weno	“Kirtleme çiciyo?” (Hayig, 2007: 63).
	Kiş-kiş	Vengê qewirnayîşê heywanê sey kerge	“Kişê kişêêê!” (Çiçek, 2012: 89).
	Kix	Vengê çîyanê pîsan ra dûrîvîstîşê gedeyan	Kix, kix! Kix bike.
	Kix-kix	Vengê pakkerdişê qirik	Badê cixara bî kix kixa ey.
	Kûço	Vengê nîdayê kutikî	Kûço, hele bê tîya!
	Kufe-kuf	Vengê merdime hêrsînî, fiskerdişî, cixare antişî	“Kuf-kufi kewena her ser...” (Mîrwanî, 2012: 72).
	Kufin	Vengê maran	Kufîna marî ma tersnayî.
	Kû-kû	Vengê dîkan, mîlçikan	“Kuku kuku! Pepo keko!” (Adabeyî, 2005: 131).
	Kup-kup	Vengê derbanê qelbî	Mî a vînayê, zerrîya kup kup eştêne.
	Kûr-kûr	Vengê bermî	Kûr kûra kutikî bî.
	Kut-kut	Vengê lezkanî herketê însanî	Mîyanê keyeyî de kut kuta aye bî.
	Kûz	Vengê bermayîşî nîmitkî, vengê kutikan	Kûz kûza kutikan bî.

/l/	La	Vengê nidayî	"La ti cey zûnî paşay hewnê xû di..." (Mîrwani, 2012: 44).
	Law-law	Vengdayîşê lajekî	"Nê la lawo!" (Dogan, 2015: 15).
	Lê-lê	Vengdayîşî ciniyan	"Lê lê Zînê..." (Aldatmaz, 2013: 93).
	Lep-lep	Vengê lewan wextê qalikerdişî	Lep lep qalikerdê, mî çiyêk fehm nêkerd.
	Leq-leq	Vengê huyayîşî	Leq leqa inan bî.
	Lo-lo	Vengdayîşê camêrdan	"Lo lo tu Şa Hemedî dîn î..." (Aldatmaz, 2013: 90).
	Lorî-lorî	Vengê lorikanê mayan	"De lorî, lorî, lorî, lorî..." (Kurij, 2014: 27).
Lurî-lurî	Vengê lorikan	"Lurî lurî lurî!" (Say, 2013: 74).	
Mem	Vengê gedeyî rê werddayîşî	Hadê kêneya min memm.	
/m/	Milç-milç	Wextê werdişî vengê feki însanî, vengê maçikerdişî	Ey gede milç milç maçi kerd.
	Mirç-mirç	Wextê werdişî vengê feki însanî	Werdene zaf baş bî, mirç mirça ey bî.
	Mir-mir	Vengê pisingan	A sey pising mir mir kerdê.
	Miyaw	Vengê pisingan	"Miyaw... miyaw..." (Kurij, 2014: 215).
/n/	Nale-nal	Vengê kesê nêweşî	Of! Nale nala ey bî.
	Nê	Vengê qebl nêkerdişî	"Nêêê! Ti gerek raştî wacî." (Malmisaniy, 2000: 299).
	Niç-niç	Vengê qebl nêkerdişî	Mi va tamam, aye va niç.
	Niq-niq	Vengê lawitena gedeyî şitê maya xo	Derguşa mi niq niq şit litê.
	Nir-nir	Vengê pisingan	Sey pisingan nir nir!
/o/	Of	Vengê ecibnayîşî, ecizbiyayîşî	"Piyê xoo unca vano ooff ooff..." (Aldatmaz, 2014: 207).
	O-ho	Vengê ecibnayîşî, ecizbiyayîşî	"Ooo hoo! Çi sadede min o wes o..." (Aldatmaz, 2013: 111).
	Ohi	Vengê baldarî	"Ohi! Şîma mîletê Reqasa dest..." (Koêkorta, 2001: 26)
	Or-or	Vengê ga û mangayan	"Ga ora, dımcık perra..." (Çelker, 2005: 201).
	Oş	Vengê estor ûsn heywanan vindartişî	Oşş! Estor ser girewtbî.
	Ooo	Vengê ecêbmendişî	"Ooo, ez sona çî xebetınane." (Çiçek, 2012: 61).
	Oşt-oşt	Vengê qewirneyîşê kutikan	Lajek tersan ra qıra oştıtt!
	Ox	Vengê kêf girewtîşî	"Oxx, rind rind!" (Çem, 2007: 439).
Ox-ox	Vengê kêf girewtîşî	"Oxxx, mî mîja xo kerde..." (Çağlayan, 2017b: 24).	
/p/	Peh-peh	Vengê zaf ecêbnayîşî	Peh peh çî fistanêko baş.
	Piç-piç	Vengê maçikerdişî	Reyêk gedeyî piç bikera?
	Pif-pif	Vengê razî nêbiyayîşî, vengê pifkerdişî	Maya mi pixerî vero pif pifa ci bî.
	Pilç	Vengê maçikerdişî	Maçê ey ra pilçın vejîya.
	Pilq-pilq	Vengê girêyayîşî	Ganê ey pilqîkî dayo.
	Pirt-pirt	Vengê derbê qelbî, qerfikerdişî	"Piriit pahali, pirriit..." (Ayyıldız, 2014: 26).
	Pist-pist	Vengê qalikerdişê nimitki	Pist pista şîma yena goşanê mi.
	Piş	Vengdayîşê pising	Pişê pişe, çim zexal ê.
	Pişk	Vengê pişkîyayîşî	O pişk a, ez tersaya.
	Piş-piş	Vengê qewirneyîşê pising	Piş piş soxê.
	Pişt	Vengê nidayî	Piş! Hele biwîni.
	Pit-pit	Vengê derbê qelbî, vengê va ci kewtîşî	Pit pita qena to ya.
	Pix	Vengê tersnayîşî, baldarî	Ey finêk ra pix! Ez tersaya.
	Piv	Vengê va ci kewtîşî	Piv piva qına to ya.
Pu-pu	Vengê awedayîşî gedeyan	Puuu puu! Lajê min.	

/q/	Qar-qar	Vengê mangayan	Mangayan qar qar kerdê.
	Qax-qax	Vengê qijikan	Aşmîya elûle de qax qaxa qijikan yena.
	Qaqibo	Vengê zerenci	Sey zerenciya qaqibo meke!
	Qeb-qeb	Vengê diko ke lej wazeno, vengê kergan	Qeb qeba dikan ma şiyar kerdî.
	Qer-wer	Vengê munaqşeyî	Qer wer mekerê.
	Qurriç	Vengê estorê awedayîşî	Qurriç! Bê awe bişime estora min.
	Qid-qid	Vengê kergan	Qid qid mirîşkê.
	Qijîne	Vengê qirayîşî	Vanê qey marî ziqitna ey, qijîne kewt ser.
	Qij-qij	Vengê qîrîna cinîyan	Qij qija şima ya, eyb yaw.
	Qî-qî	Vengê dikan	Sey kergan qî qî meke.
	Qirçin	Vengê şikitişî, dejayene	"Lê dayê hirç ê mirç ê Soxeyê kezeba qirçe qirçe." (Adabeyi, 2005: 28).
	Qirç-qirç	Vengê şikitişê çîyanê sertan, dejayene	"Soxeyê kezeba qirçe qirçe." (Adabeyi, 2005: 27).
	Qirm-qirm	Vengê şikitişî û werdişê çîyanê sertan	Qirm qirma şekerî ya.
	Qirnaw	Vengê pisîngan	Adar de qirnawa pisîngan dest pê kena.
	Qîr-qîr	Vengê munaqşeyî û qirayîşî	"Qîr û qîrîna cinîyan verra-verra berz bi." (Zengelan, 2007: 77).
	Qirt-qirt	Vengê şikitişî û werdişê çîyanê sertan	Gîzê ra qirt qirt parçe cikerdê.
	Qu-qu	Vengê dikî	"Ququla ququ!." (Adabeyi, 2005: 104).
	Qul-qul	Vengê huliyan	Huliyan qulu qulu kerdê.
	Qult-qult	Vengê awe şimîtişî	Çend qultan ra dima tîşaniya min şî.
	Qurpîn	Vengê engîştan û mefselan	Mîyaneyê ey ra qurpîn vete.
Qur-qur	Vengê pîzeyê vîşani	Pîzeyo vîşan qur qur keno.	
Qurt-qurt	Vengê awe şimîtişî	Di hirê qurtî awe bide min.	
/r/	Rep-rep	Vengê pîrodayîşî û şemateyî	Embriyanê rep rep kenê.
	Rep-tep	Vengê şemate û pîrodayîşî	"Rep û tep..." (Malmîsanij, 2000: 312).
	Repîn	Vengê pîrodayîşî	Ey ser o repîn bi.
/ş/	Şelp-şelp	Vengê awe de rayîr şiyayîşî	Şelp şelpa şima, şima de nêweş bikewê.
	Şeq-şeq	Vengê cikerdişê meqesî	Terzî lezkanî şeq şeq qumaş fesilnayê.
	Şerpîn	Vengê kefê destî ya pîrodayîş	Mi şerpîniyêk ey ra ard.
	Şerp-şerp	Vengê awe de rayîr şiyayîşî, pîrodayîşî	Pancanê ey awe de şerp şerp kerdê.
	Şerqîn	Vengo zaf berz	Şerqîna hewran domanî haya kerdî.
	Şerq-şerq	Vengê serd ra pê gunayîşê dindanan	Dindananê ey şerq şerq veng vetê.
	Şingîn	Vengê pêta girewtîşê berî	Şingîna firaqan ra ma kerr bi.
	Şing-şing	Vengê metalan	Şingîna pereyan ameyê.
	Şiring	Vengê teqiyayîşî silehan	Şiringîna silehan amê, xêr bo însalah.
	Şirr	Vengê herikiyayîşî awe, mizikerdiş	Ey şirr şirr mizî kerdê.
	Şîr-şîr	Vengê milçikan, gedeyan	Şîr şîra nînan ma werd.
	Şîşt	Vengê nîdayî	"Şîşşşt, vake Silê Phti..." (Çağlayan, 2017b: 147).
	Şi-yeh	Vengê îdarekerdişê bizan	Vengê şîwaneyî heta dewe ameyê: Şî-yeh

/t/	Taq-taq	Vengê metalan pêrodaiyîşi	“Taq, taq, taqqqq...” (Çağlayan, 2017a: 93).
	Tep-tep	Vengê derbanê qelbi	Heyecan ra vengê tep tepa qelbê ey resayê ma.
	Terp-terp	Vengê linganê însanan	Linganê xo terp terp mede erd ro.
	Teq	Vengê teqiyayîşi	“Teq û tuq...” (Malmisaniy, 2000: 313).
	Teqin	Vengê teqiyayîşi	“Teq! Teq! Teq!...” (Zengelan, 2007: 86).
	Teq-req	Vengê vayê teberi	“Teq û req...” (Malmisaniy, 2000: 313).
	Teq-teq	Vengê pirodayîşi berî	“Teq û teq di saetan ra vêşêr nêedeliyay.” (Zengelan, 2007: 18-19).
	Teqûreq	Veng babet babetî	“Sarê ma mefîni r’ teq-req!” (Mîrwani, 2012: 71).
	Terp-terp	Vengê varanî	Varanî çadîra ma ser o terp terp kerdê.
	Tew-tew	Vengê bawer nêkerdişî	“Tewww, anîya qe qusirê xo çin o.” (Çiçek, 2014: 19).
	Tik-tik	Vengê saete	Tik, tik, tik! West emrê ma ra şîno.
	Ting-ring	Vengê şemateyi	“Ting û ring.” (Malmisaniy, 2000: 314).
	Tip-tip	Vengê linganê însanan	Ez ey tip tipa lingan ra şînasnena.
	Tîrîng	Vengê asinê ro dayîşi	Bero asinên ra vengê tîrîngî vetê.
	Tirt	Vengê va vetîşi	Vengêk vejîya tîrrrrttt!
	Tişo	Vengê vindartişî herî	Tişo herê min tişo.
	Tîngîn	Vengê aletanê muzikî	Mi sazî ra tîngînî vet.
	Tît-wît	Vengê milçikan	Tît wîta şîma ya.
	Tşist	Vengê vindertişê bizan	“Tşisst, tşissst!” (Say, 2013: 24).
Tu-tu	Vengê tukerdişî	“Tûû! Ceza henêne dê cî ke!” (Çağlayan, 2003: 93).	
Tuh	Vengê tukerdişî	“Azeb bi. Tûûüh!” (Çağlayan, 2003: 99).	
/u/	Uu	Vengê ecêbmendişî	“Uuu, ancîya nêzana?” (Çem, 2007: 266).
	Uh-uh	Vengê qixikî, vengê fetisîyayîşi	Uh, uh! Eza tiya de ya.
	Ula[e]	Vengê nîdayî	“Ule raşt ağwa Zoze zaf weşa.” (Koêkorta, 2001: 54).
	Ur-ur	Vengê manganê û gayan	Sey mangana urena.
/û/	Uy	Vengê dejiyayîşi	“Uyy! Uyy! Axx!” (Çağlayan, 2017: 72).
	Û	Vengê ecêbmendişî	Ûûû! Zaf baş o.
	Ûf	Vengê nêweşî û janî	“Îna çi rewş a, ûf-ûfî kewta tû ser?” (Mîrwani, 2012: 72).
	Ûre-ûr	Vengê heşan	Heşanê vêşanan ûre ûre kerdê.
	Û-û	Vengê luye û wawîkan	Luyan û-û kerdê.
	Ûy	Vengê heyfê cî ameyîşi, vengî ecizbîyayîşi	“Ûyyy ke to ez cao teng de pêgureta!” (Çelker, 2005: 175).
/v/	(K)ûze-(k)ûz	Vengê kutikê vêşanî	Kûze kûze kutikan heta siba dewam kerde.
	Vilq	Vengê kewtiş û vejîyayîşê çîyan	Çîmanê to vilq vana û vejena.
	Vingîn	Vengê delame û çîyanê sey ney	Delameyê ey ra vingîn vejîyayê.
	Vin-vin	Vengê zincî ra qalikerdişî	Vin vin zincî ra qalî meke.
	Vin-vin	Vengê mêşan	Ma çorşme de mêşan vin vin kerdê.
	Virç-virç	Vengê linçî de rayîr şîyayîşi	Dewijî hêga de virç virç rayîr şîyê.
	Virt-virt	Vengê qalanê talanan	Ame virt virt qalî kerdî û şî.
	Viv (biv)	Vengê tersnayîşê gedeyan	Viv! Meke.
	Vize-viz	Vengê hinge, vayî	Hingan ma çorşme ra vize viz kerdê.
	Vizîn	Vengê gule û qerşunî	Asmên de vizîna guleyan bî.
	Vizt	Veng sûret a vîyartişî	Ereba vizt va ma ver ra vîyarte.
	Viz-viz	Vengê vayî, gedeyan	“Vîza vîza qersunu biye.” (Çağlayan, 2017b: 24).



/w/	Wa	Vengé nıdayı, tehdıdı	“Wa bitirse...” (Ergun, 2013: 27).
	Wa-wa	Vengé baldarkerdışı	“Wa Kheze, ma zövi kam beno?” (Çağlayan, 2017b: 162).
	Wanq	Vengé wawıkan	Wanq wanqa wawıkan bı.
	Waq-waq	Vengé ordegan	“Ser o pêser bibı, waq-waq bikerı.” (Zengelan, 2007: 90).
	War-war	Vengé pêta qalikerdışı û biveng bermayışı	War war bermayê, nêvınderdê.
	Wax-wax	Vengé heyfê xo ci ardışı	“Hêy wax u hêy...” (Çelker, 2005: 37).
	Way-way	Vengé heyfê xo ci ardışı	“Way! Qotê mi ti ita ra!” (Çiçek, 2012: 22).
	Weh-weh	Vengé îqazkerdışı	Weh, weh! Soxê.
	Wel-wel	Vengé ecêbmendişı û baldarkerdışı	Wel wel qey no senın bı.
	Wey-wey	Vengé ecêbmendişı	“Wey, ma yareniye kena?” (Çem, 2007: 234).
	Wey-hê	Vengé ecêbmendişı	“Wey hêêê! Estenbool.” (Ayyıldız, 2014: 137).
	Wî	Vengé poşmaniye û ecêbmendişı	“Wî sarê min...” (Aldatmaz, 2013: 100).
	Wiç-wiç	Vengé merreyan	Wiç wiça merreyan bı.
	Wıq-wıq	Vengé qırinceleyan û buman	Bume miyanê lojine de wıq wıq kerdê.
	Wiş	Vengé poşmaniye û ecêbmendişı	“Wişşş, duri bo, duri bo.” (Çem, 2007: 115).
	Wiş-wiş	Vengé poşmaniye û ecêbmendişı	Wiş wiş! Ey, a girewta.
	Wit-wit	Vengé milçikan	Wit wit wit! Ma betiliyayı.
	Wiz-wiz	Vengé hıngê û mêsan	Wiz wiza mêsan goşê ma berdı.
	Wiz-wiz	Vengé bermayışê gedeyan, bêhuzuriye	Gedeyı winı wiz wiz kerdê.
	/x/	Wû	Vengé çeqeli
Xij		Vengé cayêk ra xıjbiyayışı	Ey xo erd ro xij kerd.
Xincir-bincir		Vengé şemateyi, dejnayene	“Luye, Heşi kena xincir-bincir...” (Aldatmaz, 2013: 35).
Xir-cir		Vengé lejı	Her tim xir cira inan bı.
Xirin		Vengé insanê ver mergı	Xirin kewtbı sineyê ey.
Xirt-xirt		Vengé xo vurıneyışı	Xirt xirta to ya, sereyê xo bışiwe.
Xir-xir		Vengé sineyê insanê nêweşi û rakewteyi	Badê cixara xir xira ey zêde bı.
Xiştın		Vengé reyêk ra remayışı, heywananê xijokan	Ey xo ra xiştın ardê û remayê.
Xişt-xişt		Vengé dizdan, vengo nediyar	Dizdı xişt xişt miyanê keyeyi ra gêrayê.
Xiş-xiş		Vengé qotanı xeli û cewı, hebeyanê huşkan	Qotana huşkan yê xeli xiş xiş kerdê.
Xızın		Vengé sineyê insanı yê nêweşi, cixara antoxı	Xızına sineyê ey heta ita ameyê.
Xul-xul		Vengé herikiyayışê awe	Xula xula awe aramı dana mi.
Xum-xum		Vengé awe û royan ûsn.	“Xum xuma ded Huseyni...” (Ayyıldız, 2014: 33).
Xurm-xurm		Vengé werdışê çıyanê sertan	Ey, xiyar xurm xurm werdê.
Xur-xur		Vengé awe û xurına insanı	To emşo zaf xur xur kerdê.
Xuşın	Vengé herikiyayışê awe	Xuşına awe xof kerdê pizeyê ma.	
Xuş-xuş	Vengé herikiyayışê awe	Awe xuş xuş herikiyayê.	
/y/	Ya	Belê, e	“Vano: Ya...” (Aldatmaz, 2013: 45).
	Ya	Vengé nıdayı	“Ya dayê, qet firsat ci medime.” (Çem, 2007: 49).
	Yah-yah	Vengé gawanı ke heywanan idarekeno	Gawanı yah yah kerdê ke heywanı kom bê.
	Yaw	Vengé nıdayı, persı	“Yaw sima zehırlemiş nikerdo.” (Çiçek, 2012: 51).
	Yawo	Vengé nıdayı	“Vano: yawo...” (Aldatmaz, 2013: 67).
	Yeh-yeh	Vengé gawanı ke heywanan idare keno	Yeh yeh vatê labelê heywanı nêameyê.

/z/	Zare-zar	Vengê bermayîşi, vengê wawikan	Zare zara wawikan bi.
	Zar-zar	Vengê bermayîşi	Badê mergê gedeyî zare zara aye bi.
	Zimin	Vengê zimayîşê goşan	“Zim û zim ha zim û zim.” (Karasu, 2012: 22).
	Zingîn	Vengê zimayîşê goşan	Zingîna goşanê min a.
	Zing-zing	Vengê zilî	Zilî zing zing dayê piro.
	Zirîn	Vengê heran, bermayîş	“Lîya bi ûna meki, mezirri...” (Mîrwani, 2012: 71).
	Zirîng	Vengê teqiyayîşi, vengo biqewet	Lekmata ey ra zirîngî vejîya.
	Zirt-zirt	Vengê va ver kewtîşi, vengê qalanê talanan	Zirt zirt meke, herkes to zano.
	Zir-zir	Vengê bermayîşi	Zir zir bermayê.
	Zir-zir	Vengê heran û dikan	“Zira zira diki ya.” (Çiçek, 2012: 57).
	Zurt-zurt	Vengê va ver kewtîşi	Zurt zurta ey bi, labelê destmaj nêgirewt.
	Zur-zur	Vengê zurnayî	Veyve de zur zura zurna bi.
	Zur-zur	Vengê luyan	Zur zura luyan bi.

### 3. ENCAM

Vengê siruştî heme ziwananê dinyayî de estê. Nê vengî ziwanê kurdkî de zî ca gênê. Nê vengî ra taye ci tena terefê heywanan ra vejîyênê, taye ci zî tena hetê bêganan ra neşet kenê. Misale kerge *qid-qid* kena, zerenc *qaqibo* keno, estor *hîrena*, manga *orena*, wawîk *wanqeno*, pisîng *mirena*, kutik *laweno*, her *zireno* ûsn vengê taybetî yê heywanan estê. Nê tewir vengî dima terefê însanan ra seba rewşanê taybetan ameyê şuxulnayene. Misale game ke yew kes zaf vengêko berzî reyde qalanê talanan bikero vanê *sey herî zireno*; vengêko zaf lez û nizm a qalî bikero vanê *qid qida aye ya*; vengêko berz û bêmana ya bibermo vanê *sey mangan orena* ûsn. Kurdkî de dayikî gedeyanê xo bi vengê *biv* û *viv* ya tersanena. Eke gede çîyêko xirab bikero û çîyêko xeter bikero, ca de maya ci vana *biv* û gedeyê xo tersanena. Dayikî bi vengê siruştî yê *çûçê* ya domanê xo dana ronîstene û bi vengê *mem* ya dana werdene. Eke dayike biwazo gedeyê ci çîyanê lêminan ra dûrî vîndero *kixe* vana; gama ke gedeyê xo kena hewna *ey/aye rê lorî* vana, gedeyê xo rê lornena. Seke yeno fehmkerdîş gede reya verên bi vengî siruştîyê maya xo reyde ziwanî ya têkilî ronano. Herçi qas nê vengî seba ma zaf manayan îfade nêkerê zî dinyayê gedeyî dora nê çend hebî çekuyan/vengan de zivirêno. Gede nê vengî a pergale ziwanî fehm keno û ziwanî bander beno. Goreyê nê bîngeyî, pergale ziwanî de cumleyanê komplîkeyan û alozan saz keno. O semed ra no bîngêh seba ronîştîşê pergale ziwanî zaf muhîm o.

Vengê siruştî heme ziwanan de ca gênê. Heta goreyê taye teorîyan heme ziwanan nê vengî ra neşet kerdo. Goreyê ma nê vengî qasê ke bîngêhê ziwanan bê, qewetin nîyê labelê kes eşkeno vajo ke nê vengî destpêkê ziwanî yê. Goreyê na xebate ma eşkenê vaje ke kurdkî de û bitaybetî kirmanckî de vengê siruştî zaf dewlemend ê. Vengê siruştî goreyê mintiqayanê kirmanckî vurîyênê. Heman çî kes eşkeno mabênê lehçeyanê bînan yê kurdkî zî îfade bikero. Nê vengî ca bi ca

bedilîyênê. Mîsale na xebate de seba vengê kutikan û pişîngan zaf vengê cîyayî ameyê tesbît kerdene. Fonolojîyê mintiqayanê kirmanckî cîya yo. Her mintîqa goreyê wayîrê taybetmendîyan a. O semed ra nê vengî zî yewbînî ra cîya yê.

Seke cor ra ameyo îzahkerdiş, nê tewir vengî goreyê taybetmendîyanê manayî çend babet ê. Taye çekuyanê bêmanayan ra pê yenê, taye de her di çekuyî zî mana îfade kenê û taye zî çekuyêka manayine û yewa bêmana yenê têhet û vengê siruştî virazenê. Nê vengî ra taye ci tena sey înterjeksîyonî şuxulîyênê. Nê vengê ke sey înterjeksîyonî şuxulîyênê zafine nîda yê. Taye vengî zî rewşanê tebiyan îfade kenê. Mîsalê zimîna goşan, dirîngîna berî, şerpîn nê tewir vengî ra yê.

Teorîyê ke bingeyê ziwani vengî siruştîyan a girêdanê, her yew terefêkê ziwani rê îşaret kenê. Mîsale teorîya *Bow-Wowî* zafine vengî tebiyetî ser o vindena, teorîya *Dîng-Dongî* manaya nê vengî ser o vindena, teorîya *Poooh-Pooohî* hestanê însani ser o vindena, teorîya *Yo-he-hoyî* vengî hereketanê edeleyanê însani ser o vindena. Tîya de vengî goreyê nê teorîyan û peymanê ziwannasî ameyê kom kerdene û rêze kerdene. Çünke seke aseno nê teorî heme hetanê ziwani nêşkenê îzah bikerê. Na xebate de peymê ziwannasîya modern ameyê kar ardene.

Heme vengî siruştîyan ê kirmanckî tesbîtkerdiş karêko zehmet o û beno ke mimkun nîyo. Çünke taye vengî estê ke tena çend hebî dewan yan kesan reyde sînordar ê. Tesbîtê nê vengî zî zehmet o. Na xebate seba tesbîtkerdişê vengî siruştîyan de gamêk a. Beno ke bade na xebate, no war de hîna xebatê arêkerdişî bêrê kerdene û nê tewir vengî derbasê nuştayî bibê. Çünke eke nê tewir vengî derbasê nuştayî nêbê, derheqê fonolojî û fonetîkê kirmanckî de kes nêşkeno qerarêko baş bido. Nê tewir vengî karakterê vengî ziwani nişan danê û zaf muhîm ê. Teberê na xebate de taye vengê siruştî zî estbî ke (mîsale vengê sey gama ke heywanan vengdanê awe û werdî) nuştîşê ci ancax bi alfabe IPA mimkun bî, nê tewir vengî nêameyê nuştene. Nê vengê ke nêameyê nuştene zî goreyê mintiqayan bedilîyênê.

#### 4. ÇIMEYÎ

**Adabeyi, F.** (2005). *Estanikanê Sêwregî ra*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

**Ayyıldız, Zülfiyar, Hersê Zerrî, Elif Matbaası, Şanlıurfa** 2014.

**Ballıkaya, H.** (2010). *Dêvo Kor Estanikanê Gimgimî ra*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

**Bayraktar, N.** (2014). *Dilbilim*, Ankara: Nobel Yayın.

**Canşad, F.** (2007). *Xafilbela*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

**Çağlayan, H.** (2003). *38 ra Jü Pelg (Tertelê Dêrsimî)*, İstanbul: Vejiyayışê Tiji.

**Çağlayan, H.** (2017a), *Ema Lenge (Esq u Dez)*, İstanbul: Belge Yayınları.

**Çağlayan, Hüseyin** (2017b). *Hekate Kilmî (Zazaca Kısa Öyküler)*, Tunceli: Kalan Yayınları.

**Çelker, X.** (2005). *Welat ra Şanikê Şani*, İstanbul: Vejiyayışê Tiji.

**Çem, M.** (2007). *Gula Çemê Pêre*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

- Çiçek, A. A. (2012). *Saye Marû Estanikanê Xinis û Tekmanî ra*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Çiçek, M. (2014). *Mêşa Dengize Estanikanê Gingimî ra*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Doğan, D. (2014). *Huyayîş Karode Şorişgêrane yo*, Dîyarbekir: Weşanxaneyê Roşnayî.
- Ergun, F. (2010). *Diz a Sêregi*, İstanbul: Weşanên Arya.
- Ergun, F. (2013). *No Fin do Bibo*, İstanbul: Weşanên Arya.
- Grûba Xebate ya Vateyî (2005). *Rastnuştîşê Kirmanckî (Kirmanckî)*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Grûba Xebate ya Vateyî (2009). *Ferhengê Kirmanckî -Tirkî*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Grûba Xebate ya Vateyî (2011). *Ferhengê Tirkî-Kirmanckî*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Grûba Xebate ya Vateyî (2013). *Ferheng/Sözlük Türkçe-Kirmanca/Kirmanckî-Tirkî*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Grûba Xebate ya Vateyî (2016). *Ferhengê Kirmanckî (Kirmanckî)- Tirkî Kirmanca (Zazaca)- Türkçe Sözlük*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Grûba Xebate ya Vateyî (2016). *Ferhengê Kirmancki (Kirmanckî)-Tirkî*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Guntaş Aldatmaz, N. (2013). *Sanikanê Mamekîye ra*, Mardin Mardin: Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
- Guntaş Aldatmaz, N. (2014). *Folklorê Kirmancan Ser o*, Dîyarbekir: Weşanxaneyê Roşna.
- Hayig, R. (2007). *Mahmeşa Vîzêr ra Ewro İstanikê Zazaayan*, İstanbul: Vêjyayîşê Tiji.
- Hengirmen, M. (2009). *Dilbilgi ve Dilbilim Terimleri Sözlüğü*, Ankara: Engin Yayınevi.
- İsmail, A. (2009). *Ferhenga Dengan di Zimanê Kurdî de*, Dimeşq: Daru’z-Zeman.
- Karasu, D. (2012). *Dinya d’ yo Darê Ma Rênçber Ezîz*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Kırkan, A. (2019). *Zazacanın Fonetik Açından İncelenmesi; Kuzey, Güney ve Merkez Zazacasının Karşılaştırılması*, Basılmamış Doktora Tezi, Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Koêkorta, M. (2001). *Rueka Doy*, İstanbul: Vêjyayîşê Tiji.
- Kudaybergenov, (S). “Kırgızcada Ses Yansıması ve Biçim Yansıması Kelimeler” *Sosyal Bilimler Dergisi*, <http://docplayer.biz.tr/6550580-Kirgizcada-ses-yansimasi-ve-bicim-yansimasi-kelimeler.html>
- Kurij, S. (2014). *Arwûn û Luy Sonikî Çoligî*, İstanbul: Nûbihar.
- Kurij, S. (2014). *Deyirî Çewlîgî*, İstanbul: Nas Yayınları.
- Lezgîn, R. (2017). *Ferhengê İdyomanê Kirdkî (Kirmanckî)*, Dîyarbekir: Weşanxaneyê Roşna.
- Malmîsanij (2000). *Folklorê Ma ra Çend Nimûney*, İstanbul: Berdan Matbaacılık.
- Mîrwanî, S. (2012). *Kal Mûsênî Zeydûnû*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Say, A. (2013). *Ca yo ke Tij Ti ra Bena Vila Hikayeyî Çewlîgî*, İstanbul: Evrensel BasınYayın.
- Yaylagül, Ö. (2015). *Göstergebilim ve Dilbilim*, Ankara: Hece Yayınları.
- Zengelan, J. (2007). *Gorse*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Zivingî, S. F. (2017). “Muqarenetun fî Mehakat’î-Eswatî Beyne’l-Luxeteynî El-Erebîye we’l-Kurdîyye”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, V: 2/2, Summer 2017.

## EXTENDED ABSTRACT

Onomatopoeia words have an important place in all languages of the world. These sounds occur naturally. Onomatopoeia words form the basis of language. Because people begin to speak with onomatopoeia words. Language is built on these words. In this study, we examined onomatopoeia words in Kirmanckî. The aim of this study is to identify the onomatopoeia words in Kirmanckî and to form the basis for further studies. As known, onomatopoeia words have not been collected in Kirmanckî so far. Our main goal is to record and collect these words. According to some linguists, onomatopoeia words form the basis of language. In the study, these theories were analyzed. Although these theories cannot fully express the language system, these sounds are very important in the language acquisition process. In particular, children are confronted with language by means of such sounds and try themselves with these sounds. The theoretical framework of this study consists of onomatopoeia words and their use in sentences. No further analysis of these sounds was made in the study. These sounds can also be classified according to their source. As far as we get these words are many. In this study, we listed these sounds in alphabetical order. Some of these sounds are used to indicate different situations. Sometimes different sounds are used to indicate a situation. The words recorded here are written according to the suggestions of the Group Xebate Vateyî. Onomatopoeia words, as we have determined, mostly belong to animals. But people also produce many onomatopoeia words. Particularly in childhood, this kind of sounds is more and then gradually diminishes. As far as we can identify, there are many onomatopoeia words that indicate animal sounds. It is important to use these sounds in the sentence. In this study, we examined the printed books and gave examples of these books for onomatopoeia words. But there were no examples in the books for some sounds. We have also written sentences for these voices. In the study, the sentences shown in quotation marks are taken from the books and the other sentences are ours. There are many features of onomatopoeia sounds, but we did not mention these features here. In this study, approximately 300 onomatopoeia word samples are given together. These sounds may be different in other places where Zazas live. The words collected here must be regarded as an entry. Because in Kirmanckî onomatopoeia words are much more. In the conclusion part of this study, theories which accept onomatopoeia words as the basis of language were evaluated and the framework of onomatopoeia words was tried to be drawn theoretically.



# Vegêrana Kesê Duyem di Edebiyata Kurdî de\*

## Second Person Narrative in Kurdish Literature

Ümran ALTINKILIÇ\*\*

### PUXTE

Vegêrana kesê duyem ew vegêran e ku vegêrek tê de ji bo amajekirina lehengekî çîrokê an ji bo muxetabekî grîmanekirî cînaveke xîtabkirinê an raweyeke hestbarî/mercî bi kar fîne. Vegêrana kesê duyem li gor modên din yê vegêranê ji bo vegêrannasan dereng bûye cihê pûtepêdanê. Lê piştî ku bûye jî, ji ber karîgeriyên xwe yê retorîk û gotarî, bûye cihê xebatên gelekî balkêş û berfireh û ji ber ku berevajî modên din ên vegêranê ew ne li ser tewereya vegêr, li ser tewereya bervegêr tê pênasekirin paradîgmayên berdest ên vegêrannasiyê problematîze kirine. Ev xebat sê roman û sê çîrokên kurdî yê bi vegêrana kesê duyem nivîsandî vedikole. Roman *Segwer (Reyîn)* a Mihemed Mukrî, *Tu* ya Mehmed Uzun û *Maria melekek bû* ya Firat Cewerî ne. Çîrok jî “Şîzofren” û “Navnîşaneke Nû” yê Ferhad Pîrbal û “Kî” ya Burhan Tek in. Ji bo famkirina vê moda vegêranê di berhemên kurdî de, hem ji çemkên vegêrannasiya binyatger û hem ji çemkên teoriya retorîk a vegêranê sûd hatiye wergirtin. Ev xebat pênaseya vegêrana kesê duyem nîqaş dîke û paşxaneyê teorîk pêşkêş dîke; di ser berhemên kurdî re têkiliya vegêrana kesê duyem bi vegêrana kesê yekem û vegêrana kesê sêyem re vedikole; hewl dide sedema bikaranîna vê vegêranê fam bike û têkiliya wê ya bi derûna lehengan re rave bike; û li ser bikaranîna vegêrana kesê duyem a bi armancên azmûnî, postmodernîst hûr dibe.

**Peyvên Sereke:** Vegêrana Kesê Duyem, Edebiyata Kurdî, Mihemed Mukrî, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Ferhad Pîrbal, Burhan Tek.

\* Pêşversiyoneke vê xebatê li “Kongreya Navnetewî ya Ziman, Raman û Dînî” hatiye pêşkêşkirin û di kitêba wê ya teblihan de cih girtiye ku zanîngeha Mardin Artukluyê di 8-10ê Mijdara 2018an de ew kongre li dar xist.

\*\* Vekoler, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, [umranaltinkilic@artuklu.edu.tr](mailto:umranaltinkilic@artuklu.edu.tr), <https://orcid.org/0000-0003-1308-2271>

## ABSTRACT

Second person narrative is a narrative mode in which a narrator uses a pronoun of address or conditional/subjunctive structure referring to a protagonist of a story or a hypothetical addressee. This narrative mode has been ignored for a long time by narratologists but having been studied, it has received a great deal of attention because of its rhetorical and discursive effects and has problematized current narratological paradigms because unlike other modes of narrative (first and third persons) it is not defined along the axis of narrator but the axis of narratee. This paper examines three Kurdish novels and three Kurdish short stories written in second person narrative. Novels are Mihemed Mukrî's *Segwer (Reyîn)*, Mehmed Uzun's *Tu* and Firat Cewerî's *Maria melekek bû*; short stories are Ferhad Pîrbal's "Şîzofren" and "Navnîşaneke Nû" and Burhan Tek's "Kî". The paper draws on both concepts of structuralist narratology and concepts of the rhetorical theory of narrative in order to understand this mode of narrative in Kurdish works. The paper discusses the definition of second person narrative and draws a theoretical background and examines the relation of second person narrative with first and third person narratives in the context of Kurdish works and tries to understand reasons for applying this mode and explains its relation with protagonists' psychology; and finally focuses on exploitation of this mode for postmodernist and experimental purposes.

**Key Words:** Second Person Narrative, Kurdish Literature, Mihemed Mukrî, Mehmed Uzun, Firat Cewerî, Ferhad Pîrbal, Burhan Tek.

## 1. DESTPÊK

Moda gotarê ya bi cînava kesê duyem di nav jîyanê de xwedî bikaranîneke berfireh e. Dema mirov yekî hemberî xwe sûcdar dike ("te wisa kir!.."), fermanekê dide ("here ji vir!.."), telîmatekê dide ("qelemekê bikire!.."), derekê jê re terîf dike ("rast biçe, dagere destê çepê!.."), jê re behsa wî dike ("tu mirovekî zîrek î...") hwd vê modê bi kar tîne. Herwiha gelek janrên ne-edebî an populer ên nivîsê jî vê şêwazê bi kar tînin. Rêberên geştê, rêberên bikaranîna têkberan, propektosên dermanan, kitêbên geşedana kesayetî, kitêbên terîfên xwarinan, name hwd hin ji wan janran in. Lê belê vegêrana kesê duyem (VKD), li gor vegêrana kesê yekem (VKY) û vegêrana kesê sêyem (VKS) di edebiyatê de kêr hatiye bikaranîn, ji ber ku bikaranîna wê bi awayekî berdewam (seranserî berhemê) dijwar e. Ji ber vê yekê jî VKD dereng ketiye rojê vegêrannasiyê. Berî ku em dest bi pênasekirina vegêrana kesê duyem û ravekirina taybetiyên wê bikin, em ê bi kurtasî hin agahiyan bidin derbarê dîrokçeya berhemên edebî yên bi vê şêwazê hatine nivîsîn û xebatên li ser wan hatine kirin.

Yek ji vekolerên pêşî ku di vî warî de xebitîne, Bruce Morissette diyar dike ku herçend *La Modification* (1957) a Michel Butor wek berhema yekem a sertapê bi vê şêwazê nivîsandî tê zanîn jî, berhema Rex Shout *How like a God* (1929) a yekem e (1965: 12). Lê belê berhemeke bi tu-vegêranê nivîsandî ku vê dawiyê ha-



tiye keşkirin, têra xwe kevn e ku ew çîroka Nathaniel Hawthorne “A Haunted Mind” (1835) e (Fludernik, 1993: 218). Di salên şestî û destpêka heftêyî de gelek berhemên balkêş bi VKDê hatine nivîsîn, yên wek *Aura* (1962) ya Carlos Fuentes, beşa yekem a *The Lime Twig* (1962) a John Hawkes, *Un homme qui dort* (1967) a Gerorge Perec, *A Pagan Place* (1970) a Edna O’Brien, “The Second Person” (1970) a W. S. Merwin û gelek pasajên *Gravity’s Rainbow* (1973) a Thomas Pynchon (Richardson, 1991: 309). Ji wê çaxê bi vir de hinekî jî piştî ku xebat li ser VKDê zêde bûne gelek berhem pê hatine nivîsîn, ku di bibliyografiya Fludernikê amadekirî de bi sedan berhem hene (1994b).

Lê belê ev şêwaz ji hêla teorisyenên giring ên vegêrannasiyê yên wek Genette û Stanzel, û ji hêla navên giring ên teoriya retorîk ên wek Booth ku wan deman berhem dane, bi piranî hatiye piştguhkirin. Di vî warî de xebata ewil vedigere sala 1965an, ku ya Morrisette ye bi navê “Narrative “You” in Contemporary Literature”. Dûre xebatên Prince, Bonheim, Richardson, Kacandes, Fludernik û DelConte ev qad geş kiriye û bi jimara 28an a taybet bi vê mijarê a kovara *Styleê*, mijarê bingehê a teorîk bi dest xistiye.

## 2. PÊNASE

Li gor gelek vekolera VKD ji bo edebiyatê derfetên nû dabîn dike. Bo nimûne Morisette dibêje ku ev mod bi hostetî bê bikaranîn dikare di qada edebî de karîgerîne wisa çêbibe ku mod û kesên din nikarin wan çêbikin (1965: 2). Herwiha Richardson di vê çarçoveyê de dibêje, vegêrana kesê duyem “muhtemelen ji pêla hiş bi vir de geşedana teknîk a herî giring e di vegêrana edebî de” (1991: 327). Gelo ev teknîka ku ev çend giring hatiye dîtin, bi tenê ji ber ku kêma hatiye bikaranîn, ev qas dereng bûye cihê vekolanê? Monika Fludernik diyar dike ku yek ji sebebên wê ku VKD kêma hatiye vekolan ew e ku pênaseyê wê ya zelal û teqez nehatiye kirin (1994a: 284).

Hin kesên wek Morisette, di vî warî de xebitîbin jî wan xwe nedaye ber wê yekê ku pênaseyê bikin. Dema em li lîteraturê dinêrin em dibînin ku yek ji pênaseyên pêşî di ferhenga vegêrannasiyê ya Gerald Prince de peyda dibe: “Vegêrana ku bervegêrê wê qehremanekî çîrokê ye” (2011: 284). Piştî wî, hewldana pênasekirinekê ji Richardson hatiye: Vegêrana kesê duyem ew vegêran e ku bi cînaveke kesê duyem amajeyê bi serleheng dike. Ev leheng bi piranî tekane fokalîzer<sup>1</sup> e û bi gelemperî bervegêrê [narratee]<sup>2</sup> berhemê ye jî (1991: 311). Weku tê

- 1 Mijara perspektîf, fokalîzasyon an riwangehê pêwendidarî wê yekê ye bê ka tiştê vegêrayî dikeve qada dîtinê ya kê. Karakterê ku fokalîzasyon di ser wî re tê pêkanîn wek karakterê fokal an fokalîzer tê binavkirin. Yanî *ki bibîne*, ew fokalîzer e.
- 2 Bervegêr amajeyê bi muxetabê vegêr dike, bûnewerê fiktîf e ku vegêr vegêrana xwe arasteyî wî dike.

dîtin Prince bervegêrbûnê dike şertê vê vegêranê, lê belê Richardson referekirina leheng bi cînaveke kesê duyem datîne pêş û bervegêrbûna leheng dadixe dereceya duyem. Fludernik diyar dike ku ne şert e cînav, cînaveke kesê duyem be, şert e cînaveke xîtabkirinê [address pronoun] an jî hêmaneke din a xîtabkirinê be wekî raweya fermanî; ji ber ku di hin zimanan de dibe ku cînava xîtabkirinê, ya kesê sêyem be [mînak di tirkî de ji bo hurmetê “siz”] jî (1994a: 286). Lewma Fludernik vegêrana kesê duyem wisa pênase dike: Vegêrana ku (ser)lehengê wê bi cînaveke xîtabkirinê tê referekirin (gelek caran *tu*) û herwiha deqên kesê-duyem gelek caran xwedî zemîneke komunîkatîv in ku li ser wê zemînê vegêrek (axêver) çîroka yekî (tu) jê re vedibêje, ji halê nuha yê wî (tu) re ku an tune, miriye an jî bi nav salan de çûye û bîrbirtir e (288).

Di her sê pênaseyan de jî derdikeve ku divê “tu” lehengê çîrokê be. DelConte diyar dike ku pênaseyên van her sê kesan jî nikarin vegêranên kesê duyem ên grîmanekirî [hypothetical] an mercî [conditional] rave bikin. DelConte behsa çîroka Lorrie Moore “How” û ya Junot Diaz “How to Date a Blackgirl, Browngirl, Whitegirl, or Halfie” dike û diyar dike ku di her du çîrokan de jî bi maneya nerîtî leheng an çîrok tune; ji ber ku ev vegêranên han bi senaryoyên grîmanekirî (carinan diguherin) hatine arastekirin bo hokarên [actant] grîmanekirî. Lê belê pênaseyên Prince, Richardson û Fludernik bervegêr-lehengekî diyar û mufred derdixin pêş. Lewma DelConte pênaseya xwe dike: Vegêrana kesê duyem modeke vegêranê ye ku tê de vegêrek çîrokekê vedibêje ji bervegêrekî (carinan nediyar, guherbar, û/an grîmanekirî) -ku bi *tu*yê şayesandî ye- re ku herwiha hokarê sereke (carinan nediyar, guherbar, û/an hîpotetîk) ye di wê çîrokê de (2003: 207). Weku em ê bibînin heger ne ji vê pênaseya DelConte bûya, me yê nikarîbûya du çîrokên dabaşa vê xebatê bixistina çarçoveya VKDyê; ji ber ku di wan de ne serleheng bi cînava kesê duyem hatine referekirin, ne jî hatine xîtabkirin; kesên ku hatine refererkerin an xîtabkirin, ne hokarên çîrokê ne.

### 3. PAŞXANEYA TEORÎK

Ji bo ku bi giştî VKD bê famkirin pêwîst e li vir em kurteyê wê ya teorîk bidin. Gelek xebat li ser hatibin kirin jî, em ê bi tenê amajeyê bi yê diyarer û ji bo berhemên kurdî bikêrhatî bikin. Di vê çarçoveyê de kesên wek Bonheimê û Richardson ji bo ravekirina taybetiyên vegêrana kesê duyem hin term bi kar anîne / dariştine; yê wek Fludernik û DelConte jî bi hinceta ku ev cure vegêran di tîpolojî û modelên berdest de hilnayên, tîpolojî û modelên xwe ava kirine.

Vegêrannasa alman Helmut Bonheimê ji bo ravekirina muphemî û pirfonksiyoniya tîpîk a cînava kesê duyem di deqên kesê duyem de, du term dariştine. Bonheim terma “şemîfîna referensiyel” [referential slither] ji bo derbirîna kapasîteya mundemîç ya “tu”yê ya hem xîtabkirina xwînerên aktuel û hem jî xîtabkirina

bervegêrekî li gel nîşankirina lehengekî fiksiyonel bi kar tîne. Terma duyem a Bonheimê “îştîyaqa bangewer” [conative solicitude], wê taybetiya vegêranên kesên duyem nîşan dide ku lehengên kesê duyem ji yên kesê yekem an kesê sêyem bêtir hesta empatiyê tevradike li cem xwîneran (Fludernik, 1994a: 286).

Richardson sê tîpên vegêrana kesê duyem tesbît dike: “standard”, “sûbjonktîv” [subjunctive] û “ototelîk” [autotelic]. Di forma “standard” de bi piranî bi dema nuha çîrokek tê vegotin<sup>3</sup> derbarê take lehengekî de ku bi kesê duyem tê refererîkirin: “tu” hem vegêr hem bervegêr nîşan dide.<sup>4</sup> Mînakên wî ji bo vê yekê berhemên wek *La Modification* a Butor û *Un homme qui dort* a Perec e (1991: 311). Richardson forma “sûbjonktîv” ji bo wan vegêranan bi kar tîne ku wekî rêberên bikaranînê an kitêbên tekamula şexsî talîmatan didin lehengên xwe. Ev form bi van hêlên xwe ji ya “standard” cuda dibe: bikaranîna berdeyam a raweya fermanî, bikaranîna gelek caran a dema bê û cudahiya bihêz a di navbera vegêr û bervegêr de. Mînaka wî ji bo vê yekê çîrokên Lorrie Mooreyê yên di koleksiyona wê *Self-Help* de ne (319). Kritekî pênaseker a kategoriya sêyem, “ototelîk”, ew e ku muxetabên yekser ên “tu”yê carinan xwînerên aktuel ên deqê ne û çîroka wan li kêleka ya karakterên fiksiyonê tê danîn û dikare tev li ya wan bibe. Richardson diyar dike ku ev form bi awayekî xwerû bi tenê di çîrokên gelekî kurt de peyda dibe, yên wek “The Second Person” a W. S. Merwin. Lê belê di xebatên berfirehtir de bi vegêrana kesê yekem an ya kesê sêyem re bi dorê tê bikaranîn wek *Se una notte d’inverno un viaggiatore* ya Italo Calvino. Richardson diyar dike ku ev form, wek forma sûbjonktîv bi konstruksiyona tîpîk dilîze û vegêr bi eşkereyî ji bervegêr cihê ye; û wek forma standard bi piranî bi dema nuha tê vegêran (320-1).

Fludernik diyar dike ku deqên kesê duyem vegêrannasiya binyatger problematîze dikin û dîkotomiyên wek heterodîegesîs-homodîegesîsê, çîrokgotârê ji cih dikin. Ji ber vê yekê Fludernik termînolojî û tîpolojîya xwe ava dike. Mijar gelekî berfireh e û çênabe mirov li vê derê bi berfirehî bide, lewma em ê bi kurtî rave bikin bi qasî ku dema pêwîst be em serî lê bidin. Li gor vê yekê heger moda vebêjî [teller mode] di vegêranê de hebe komunîkatîv e, heger tunebe nekomunîkatîv e. Herçî yên komunîkatîv in ew jî dibin du beş: homokomunîkatîv, heterokomunîkatîv. Heger vegêr an jî bervegêr an jî her du jî di heman demê de karakter jî bin, ev homokomunîkatîv e; heger vegêr û bervegêr aîdî qadên cuda yên hebûnê bin ev heterokomunîkatîv e (1993: 446).

DelConte diyar dike ku vegêraneke kesê duyem her tim an vegêranake kesê sêyem e an jî ya kesê yekem; ev hevbirîn [overlap] ji ber wê yekê ye ku vegêranên kesê yekem û sêyem li gor tewereya [axis] vegêr tînan diyarkirin, lê ya kesê duyem li

3 Di vê xebatê de “vegêran” ji bo “narrate”ê, “vegotin” ji bo “tell”ê hatiye bikaranîn.

4 Li vir qest ew e ku vegêr bi xwe re dipeyive.

gor tewereya bervegêr, li gor serhevketina [coincidence] bervegêr û leheng tê diyarkirin. Vegêrana kesê duyem ji ber karîgeriyên xwe yên retorîk ên taybet, cihekî serbixwe heq dike di tîpolojiyên vegêranê de. Li gor wî ev pirsgirêka kategorîzasyonê ji ber wê yekê ye ku modelên zal ên vegêranê bi tenê li ser esasê deng hatine avakirin. Lê belê vegêrana kesê duyem bi wê yekê nayê diyarkirin bê ka kî dipeyive, bi wê yekê tê diyarkirin bê ka kî guhdar dike, lewma jî di wan modelan de hilnayê ku li ser deng an vegêr hatine avakirin (2003: 204). Ev tesbîtên han giring in ji ber ku gelek çarvan vegêrana kesê duyem wek hevterîbî ya kesê sêyem û yekem tê hizirkirin, lewma jî tê redkirin yanî wek vegêranekê nayê pejirandin. Lê belê DelConte diyar dike ku vegêrana kesê duyem ne riwangehek e, ne xaleke dîtinê [point of view] ye; ew xaleke vestendinê [point of perception] ye (208).

#### 4. VKD DI NAVBERA VKY û VKS'Ê DE

Hin nivîskaran VKD wek rûpoşa VKYê an VKSê hilsengandiye. Bo nimûne dema ku Mieke Bal *La Modification* a Michel Butor dinirxîne, dibêje “tu” bi tenê rûpoşa “ez”ê ye; vegêrekî kesê yekem bi xwe re dipeyive (1996: 181). Bal pasajekê ji romanê werdigire û di ser wê re diyar dike ku ew bi tenê monologeke navekî ye ku ji bo xatrê fokalîzerekî kesê yekem ê bêdeng, hewl dide amajeyên bi dengê kesê yekem ji holê rake (181). Lê belê pasajên ku dikarin angaştên Bal têk bibin jî hene di romanê de. Hevterîbî Bal, McHale jî diyar dike ku di hin metnên wek *La Modification* a Butor, *Aura* ya Fuentes û *The Lime Twig* a John Hawkes de kesê duyem li şûna kesê sêyem hatiye bikaranîn (2004: 223). Herçend McHale di dewama metna xwe de ji bo hin metnên din xweseriya VKDê teslîm bike jî, bi ya wî be mirov dikare di van berhemên navhatî de li şûna “tu”yê, “ew”ê bi cih bike. Ev tişt ji bo hin beşên van berheman rast be jî, ji bo hinên din mesele ne ewqasî homojen e; “tu” carinan nêzî “ez”ê dibe, carinan jî nêzî “ew”ê dibe; di mijara perpekîfê de guherîn û muphemiyên çêdike. Em ê di vê beşê de bi mînakên ji berhemên kurdî li ser vê yekê hûr bibin.

Bi qasî ku me tesbît kiriye yekem berhema bi kurdî ya ku bi VKDê hatiye nivîsîn, romana Mihemed Mukrî *Segwer (Reyîn)* (1982) e. Herwiha bi tenê ev roman seranser bi vî awayî hatiye nivîsîn. Lehengê romanê pêşmergeyek e ku di zindaneke Beesê de ye û roja xwe ya dawî diji; şeva wê rojê dê bê daliqandin. Wekî mînaka kanonîk a vê şewazê *La Modification* a Butor (6 seetên di trêne de), di vê romanê de jî dema derekî gelekî kurt e: rojêke di zindanê de; lê belê zemanê navekî berfireh dibe û leheng li gel hisên ku ew şertên wî pê didin hiskirin, bi nav bîranînan de jî diçe. Roman bi vî awayî dest pê dike:

Tu îşev nerazayî û hişyar mayî. (1) Hedana te nedihat. (2) Te xwe li ser piştta xwe dirêj dikir. (3) Tu radibûyî ser piyan. (4) Bi gavekê, te odeya xwe ya tarî qut dikir. (5) Geh tu rûdiniştî û geh te serê xwe dixist nav çokên xwe û te tiliyên

destên xwe li hev dipêçan. (6) Geh te serê xwe bilind dikir û xwe bi xwendina wan hevokên li ser dîwarên odeya te nivîsandî mijûl dikir. (7) Beriya te, bi dehan an bi sedan kes di vê odeyê de jiyabûn û dû re bi nîşeyên tijî hest li şûna xwe hiştibûn. (8) (Mukrî, 2015: 19)

Gava mirov vê paragrafa ewil a romanê dixwîne, dibîne ku piraniya derbirînan ji çavê çavdêrekî derve ne, weku kamerayek vegêr be. Hevokên (1), (3), (4), (5), (6), (7) rasterast şayesandinên derekî yê leheng in. Lê belê ji bo hevokên (2), (8) ihtîmal zêdetir e ku ji hişê leheng bin, yanî leheng fokalîzer be. Lê belê di vê paragrafa jêr de rewş cuda xuya ye:

Bi şev, piştî nûçeyê, gelek bîranîn di mejiyê te re derbas bûn. Hin ji wan nola xewnan dihatin bîra te û hinekên dî jî xwe bi cûrekî dixistin xewna te ku, te hemû tiştên dût jî didîtin! Te ji hinek bîranînan nefret dikir û şanazî bi hinekên dî dikir. (21)

Di vê paragrafê de vegêr wisa xuya dike wekî bi temamî di hişê leheng de be. Em dikarin bibêjin ku di piraniya romanê de ev rewş li dar e; yanî fokalîzasyona navekî dixebite û lehengê romanê tekane fokalîzer e; vegêran bi vî awayî dişibe monolegekê ku tê de leheng ne bi “ez”ê bi “tu”yê dipeyive. Lê belê hin cih hene ku vegêr bi temamî ji leheng dût diçe. Bo nimûne dema ku leşker tên zindanê leheng bibin daliqînin û ew bi nivîsîna tiştinan li dîwêr mijûl e, wisa tê teswîrkirin: “Gelo haya te ji dengê vekirina deriyê hesinî yê odeya te nîne?” (61). Li vê derê teswîrkirina rewşekê ku leheng nabîne, muhîm e; ji ber ku li wir êdî leheng ne fokalîzer e û em nikarin “ez”ê di şûna “tu”yê de bi cih bikin; ne maqûl e yek ji xwe re bibêje “Gelo haya min ji dengê vekirina deriyê hesinî yê odeya min nîne?”

Ji ber ku piraniya romanê bi fokalîzayona navekî ya sabîd hatiye nivîsîn, ev forma vegêrana kesê duyem bi mirov wekî monologeke navekî xuya dibe. Piraniya *Segwerê* xwedî rengê monologê be jî, ev çend nimûneyên me dan, nîşan didin ku vegêrana “tu” li ser sînorên vegêranên “ez” û “ew”ê dilîze. Carinan nêzî vegêrana “ez”ê dibe, carinan jî nêzî vegêrana “ew”ê dibe ku ev taybetiyeke giring a vî cureyê vegêranê ye û di romana kurdî ya yekem a bi vê formê de xuya dibe.

Romana duyem ku em dibînin ev form tê de heye, romana Mehmed Uzun a bi navê *Tu* (1985) ye. *Tu* bi du forman hatiye nivîsîn; beşek bi ez-vegêranê ye û beşek bi tu-vegêranê ye, wisa bi dorê dewam dike. Di romanê de paşkokek heye, Uzun di wê derê de diyar dike ku wî ev nav ji bo romanê hilbijartî ye da ku di civakeke wek a kurdan kolektîf de, takekesiyê dupat bike (2005: 232). Balkêş e lehengê vê romanê jî di zindanê de ye. Uzun diyar dike ku ew vê forma vegêranê ji romanên nivîskarên wek Carlos Fuentes, Oriana Fallaci û Julio Cortazar fêr bûye. Bi taybetî jî navên her du romanên Fuentes *Aura* û *Mirina Artemio Cruz* hildide (226-7). Tevî ku Uzun behsa *Segwerê* nake, ihtîmal e ku ew xwendibe û di karîgeriya wê de mabe.

Di *Tuyê* de beşên ku leşker tên lehengê romanê ji malê dibin û beşên ku êşkenceyê lê dikin an jiyana wî ya di qawîşê de bi tu-vegêranê ne. Her çi beşên ez-vegêranê ne, leheng di wan de di hucreyê de ye û bi hinceta ku bi kêzikekê re bipeyive monologan saz dike ku ev monolog bi piranî ji bîranînên wî pêk tînin û kêmanî caran vedigerin ser rewşa heyî. Di *Tuyê* de VKD bi her du cînavan jî heye, hem kesê duyem ê yekjimar, hem ê pirjimar.<sup>5</sup> Dema leşker tên leheng dibin, bi vî awayî hatiye şayesandin di *Tuyê* de: “Dema deriyê we yê derva pihêt lêket, hê nivê şevê bû. Bi dengê derî ve tu hişyar bûyî. Te xwe dirêjî teqa ser ciyên xwe kir, saeta xwe hilda û lê nihêrt. Saet 2.43 bû” (Uzun, 2005: 41).

Weku tê dîtin li gor *Segwerê*, di *Tuyê* de vegêr ji leheng dûrtir e, bi taybetî di beşên ku cînava kesê duyem a pirjimar bi kar tîne, vegêr dibe vegêrekî gişzan; gelek agahiyan dide û ji sînoren fokalîzasyonê derdikeve: “Çarmedorên bajarê we yê biçûk hemû rez bûn. Di destpêka biharê de, her cih dixemilî û di nav hêşinahiyeke xweş de dima. Rezên we dîsan hêşin dibûn” (15). Li vê derê mirov dikare bi hêsanî li şûna “we”yê, “wan”ê binivîse û vegêranê ji nû ve saz bike.

Lê belê ne pir bihêz be jî fokalîzasyon tê de heye: “Lingên ku ketin hundir, sê an çar cot bûn. Piştî ku ew ketin hundir, hatin kêlîkê li ser te sekinîn û çûn ji te hinekî bi dûr ketin” (207). Li vir êşkere ye ku “sê an çar cot” texmîna leheng e, yanî leheng li vir fokalîzer e.

Tu ya Uzun hema bêje bi temamî di dema borî de hatiye vegêran, mirov dibêje qey leheng hafizeya xwe wînda kiriye û kesekî şahidê van tiştan jê re behsa rabirdûya wî dike. Rêyeke dabînkirina vê yekê ew e ku ev kesê ku bûyeran vedigêre, kesek be rabirdûya wan hevpar be. Lê ji ber ku ne mimkun e kesekî wisa jî bi demên wî yê ew tê de tenê jî bizane, ev dişibe wê weku leheng bi xwe hemû jî yekî re vegotibin û dûre hafizeya xwe wînda kiribe.

Romaneke din a ku ev form tê de heye, *Maria Melekek bû* ya Firat Cewerî ye. Ev roman jî bi du forman hatiye nivîsîn, beşa sereke bi VKDê, beşên din bi VKSê ne. Di beşa sereke de lehengê şîzofrenê romanê piştî ku jina xwe dike, xwe jî dike. Beşên din her yek bi navê kesekî ye ku ew nas û dostên serleheng Daniel û jina wî Mariayê ne. Di her beşa yekî de krîmonologek îfadeya wan a derbarê bûyerê de distîne. Beşa ku bi vegêrana kesê duyem hatiye nivîsîn, bi vî awayî dest pê dike:

Wê kêliya ku te herdu destên xwe xistibûn bin çengên xwe, tu li hemberî camekana kincan rawestiyabû û te li kinc û modelên di camekanê de temaşe dikir, her tişt hat guhertin; hemû jiyana te serobino bû. Te hingî jî nişkê ve xortaniya xwe di camekanê de dît. Xortaniya te, bi bejna xwe ya zirav, bi por û cênîkên xwe ên dirêj

5 Bi me ev jî ber wê yekê ye ku tevî ku Uzun li dijî kolektîfîyê ji bo xatirê takekesiyê navê romanê dike “Tu” jî, ew bi xwe gelekî girêdayî ye bi vê kolektîfîyê ku tona romantîk a romanê jî ve dide der.

û bi rûyê xwe yê bi ken li pişt te rawestiyabû û bi te re li camekanê temaşe dikir. (Cewerî, 2013: 7)

Weku tê dîtîn, ev roman jî mîna *Tuya Uzun* di beşên vegêrana kesê duyem de dema borî bi kar tîne, lê belê wek *Segwera* Mukrî jî ji kesê sêyem bêtir nêzikî kesê yekem e. Li vê derê ji her du romanên din cuda, pirsgirêka bawerbariya vegêr xuya dibe ku ev yek jî bi psîkolojiya şîzofrenekî re hevaheng e. Lehengê sereke tekane fokalîzerê vegêranê ye, lê belê bi tenê li ciyekî dîtina lehengeke din serdestiyê ji ya serleheng distîne: “Ne te, lê Lottayê dît ku ew bi mişkekî dilîze” (75).

Tevî ku di vê romanê de jî vegêr şênber anku muşexes nabe, li ciyekî rewş berevajî xuya dike: “Nizanim jînikê tu dît an na, lê mîna ku kûçik tiştêk his kiribe, xwe ber bi te ve radikişand” (21). Li tu ciyan vegêr wek kesekî di romanê de tecrûbeker, ji xwe re nabêjê “ez” an “min”, lê belê bi vê “nizanim”ê em dibînin ku rewş li vir berevajî dibe. Herwiha bi hevoka me berî vê veguhasî re dijberiyekê nîşan dide. Di hevoka “Ne te, lê Lottayê dît ku ew bi mişkekî dilîze” de tê dîtîn ku perspektîfa vegêr ji ya leheng berfirehtir e û tiştê ku ew nabîne jî dibîne, lê di hevoka “Nizanim jînikê tu dît an na, lê mîna ku kûçik tiştêk his kiribe, xwe ber bi te ve radikişand” de vegêrekî kêmtantir xuya dibe. Mirov dikare vê yekê bi du tiştan şirove bike: yek jê ew e mirov bibêje ku ev îhlalên fokalîzasyonê ne; ya din jî ew e mirov bibêje ji ber ku fokalîzer şîzofren e, rewşeke neseqamgîr derketiye holê. Lê belê dawîya dawî ya ku van muphemî û xerîbiyan dixe romanê VKD ye.

Weku tê dîtîn *Segwer* û *Maria Melekek bû* bêtir nêzikî vegêrana kesê yekem in, lê *Tu* bêtir nêzikî vegêrana kesê sêyem e. Lê belê her sê jî li ser sînoren her du vegêranan digerin.

## 5. VKD WEK TEKNÎKEKE VEGÊRANA REWŞÊN DIJWAR ÊN DERÛNÎ

Dema em ji hêla naveroka van romanên li ser meselê difikirin, em dibînin ku bikaranîna VKDê di van romanên de û gelek bikaranînen wê yên di lîteraturê de hevdu digirin. Michel Butor amajeyê bi rewşa xerab a lehengan dike û ji bo VKDê dibêje çîroka karakterê, ji hêla kesine din ve jê re tê vegotin, ji ber ku an ew nikare an jî naxwaze wê ji xwe re bibêje (Butor, 1991: 98-9). Lehengên her sê romanên kurdî jî di rewşên ji hêla derûnî xerab de ne.

Di *Segwerê* de leheng li ber îdamê ye, lehengekî werê dê tercih neke li ser rewşa xwe bifikire, lewma vegêrana rewşê bi telqîneke derekî, li naverokê dike. Heman tişt jî bo *Tuya Uzun* jî rast e. Di *Tuyê* de ne tesaduf e ku beşên êşkencedanê bi VKDê ne, lê belê di beşên bi VKYê de leheng diçe nav bîranînan û bi piranî tiştên xweş tîne bîra xwe ji zaroktiya xwe. Mehmed Uzun di paşkoka behskirî de sedema bikaranîna vê formê bi vî awayî rave dike: “Di vir de, min wisan çêtir dît ku bûyer û mesele hinekî ji min bi dûr kevin ku ez bikaribim wê demê binivîsim. Bi forma ez, ev yeka dê zehmet bûya. Loma min wê demê, mîna ku hatibe serê kesekî

din, bi *forma tu nivîsî*" (2005: 225-6). Em dibînin ku Uzun li vê derê ferqa navbera nivîskar û vegêr ihlal kiriye û ev tişt gotiye, Joshua Parker jî wek Uzun vê ferqê ihlal dike û di xebata xwe de, ya ku xwe dispêre derbirînên nivîskaran derbarê sedemên bikaranîna vê formê de, diyar dike ku gelek nivîskar VKDê bi kar tînin da ku mesafeyekê têxin navbera xwe û tecrûbeyaya xwe ya rabirdûyê ya trawmatîk an şermezar (2011/2012, 170). Li vir pirsek tê hişê mirov: ma gelo nivîskar nikarin VKYê bi kar neyînin û bi VKSê jî heman mesafeyê çêbikin, yanî xwe (bi gotina Uzun û Parker) an vegêrê xwe ji tecrûbeyaya xerab dûr bixin. Di vê derê de delîlên ku piştgiriya fikra wan dikin hene, bo nimûne DelConte di bersiva xwe ya bo nivîsara Parker de diyar dike ku "ez-tu" dijberiyeye ji ya "ez-ew"ê bihêztir ava dike (DelConte, pr. 5). Ev diyarde rehenda otobiyografîk a VKDê rave dike ku di *Tuyê* de teqez e û dibe heta dereceyekê di *Segwerê* de jî werê be. Herçi lehengê *Maria melekek bûyê ye*, ne di dema vegêranê de be jî, ew jî ji ber sedemên polîtîk di rabirdûyê de di hefsê de maye, marûzî êşkenceyan bûye û lewma derûna wî xera bûye. Herwiha çîroka Ferhad Pîrbal "Navnîşaneke Nû" jî deqek e ku bi VKDê hatiye nivîsîn ku lehengê wê ji hêla bavê xwe ve ji malê hatiye qewirandin û di rewşeke perîşan de malê diterikîne (2001: 97-101).

Em dibînin ku vegêrana kesê duyem ji bo şayesandina rewşa lehengên hişê wan tevlihev derfetên baş ên derbirînê dabîn dike. Ev jî ji bo her çar lehengan jî rast e û heta em dikarin bibêjin ku li cem her çar lehengan jî ji-xwe-biyanîbûnek heye, lewma heger ev bi temamî şayesandinên hişê lehengan bin jî, weku gelek rexnegiran ji bo metnên bi vî awayî angaşt kirine, xwe îfadekirina lehengan bi cînava kesê duyem encama parçebûneke hişî xuya dike.

Heger em ji navê nivîsara Richardson îlhamê bistînin, em dikarin bibêjin ku ev tişt encamên polîtîkaya vegêrana kesê duyem in. Lê li hêla poetîkaya wê rewş çawa ye gelo? Ji vê hêlê de em nikarin bibêjin berhemên kurdî yên heta nuha navhatî derfetên vê forma vegêranê baş bi kar anîne. Di van berheman de herçend bikaranîna cînava kesê duyem hebe jî, em dibînin ku rehenda fonksiyona xîtabkirinê [address function] hema hema tune. Mîsal talîmatan an fermanan nadin lehengan, lewma ne konatîv in û li gor kategoriya Richardson vegêranên kesên duyem ên standard in û li gor tîpolojîya Fludernik jî heterokomunîkatîv in.

Gelek metnên bi vegêrana kesê duyem pêşiyê lehengê xwe şênber nakin, lewma heta ku ew şênber dibin, xwînerên îmakirî an yên reel metnan wisa dixwînin weku xîtabî wan bikin. Hem ji ber ku fonksiyona xîtabê di van berheman de lawaz e û hem jî ji ber ku ji serî de diyar e bê ew "tu" kê refere dike, wisa xuya dike ev berhemên kurdî vê derfetê jî ji dest xwe didin ku Bonheim jê re dibêje şemîfîna referensiyel.

Lê gelo ev metnên han ji kategoriya din a Bonheimê jî bêpar in, yanî ji îştîyaqa bangewer bêpar in? Yanî gelo ev form nake ku xwîner bêtir empatiyê bi lehengan re çêbikin? Wisa xuya dike ku em ê ji bo vê yekê nikaribin nerênî bipeyivin.



Lêkolîna Irene Kacandes di vî warî de ronîker e. Ligel ku *La Modification* a Michel Butor jî wek van berhemên kurdî bi vegêrana kesê duyem a standard hatiye nivîsîn û navê leheng û çîroka wî diyar e (di yên kurdî de bi tenê navê lehengê romana Cewerî diyar e), lêkolîna Kacandes nîşan dide ku, dîsa jî hinek xwîner û rexnegir di karîgeriya wê de mane û heta dereceyekê karvedanên wisa nîşan dane weku xîtab li wan bi xwe hatibe kirin (1994: 338). Ew vê yekê dispêre taybetiya cinava kesê duyem. Kacandes di vî warî de alîkariyê ji fikrên du hizirmendan, ji Martin Buber û Emile Benveniste distîne û diyar dike ku hêza kesê duyem ew e ku bingeha wê li ser naskirina takekesiya dîke [other] ye, lewma jî rê li ber hevkarîgeriyê vedike; peyva [utterance] “tu”yê bivê nevé dibe nîşana têkiliyêke navbikerane [intersubjective] di navbera “ez” û “tu”yê de (331). Ev jî nîşan dide ku van berhemên kurdî çendî ji derfetên vê vegêranê hemûyan sûd wernegirtibin jî, ew dê bi vê formê bivê nevé hêzekê bisepinîn ser xwîneran û ev yek ê bihêle xwîner empatiyekê bi lehengan re çêbikin an jî li gor vegêranê kesên din bêtir daxilî nav cîhana romanê bibin. Mîsal *Segwer* çi qasî nêzîkî VKYê be jî, heger bi VKYê hatibûya vegêran, ne mimkun bû li cem xwîneran ev hesta nêzîkiyê û rageşiya derûnî tevrakira; ji ber ku di VKYê de xwîner bi piranî di pozisyona çavdêr de ne, nabin beşekî navekî yên tevgeranê.

## 6. VKD WEK AMRAZA LÎSTIKBAZIYÊN POSTMODERNÎST

Metnên postmodernîst an azmûnî ji bo VKDê bûne axa herî berhemdar a geşedanê, ji ber ku VKD dikare metalepsîsê (ihlalkirina sînoren ontolojîk) pêk bîne û ev ji bo metnên postmodernîst karakterîstîkeke bingehîn e. Esasen çavkaniyên ku Uzun ji wan sûd wergirtiye jî wisa ne û romana Cewerî jî xwedî taybetiyên postmodernîst e; nivîskarekî bi navê Firat Cewerî di romanê de ye<sup>6</sup> û nuh romanek qedandiye ku bûyerên wê romanê û yên li serê Daniel Öztürkê serlehengê romanê qewimî yek in. Lê belê di van berheman de potansiyela VKDê baş bi pêş neketiye û herçend bi vê kirinê dê gelek nuansên retorîk bên kuştin jî mirov dikare bi piranî VKY an VKSê li şûna VKDê bi cih bike. Feqet hin metn hene rê nadin vê yekê. Di edebiyata kurdî de yek ji wan, çîroka Ferhad Pîrbal a bi navê “Şîzofren” e û ya din jî çîroka Burhan Tek a bi navê “Kî” ye.

Çîroka “Şîzofren” a Pîrbal yek ji çîrokên wî ye ku di kitêba wî ya çîrokan *Çolistanê* de ne. Pîrbal di gelek çîrokan de gelek teknîkên vegêranê yên azmûnî bi kar anîne. “Şîzofren” jî yek ji wan çîrokan e. Di vê çîrokê de 15 qutî hene ku derbarê lehengê şîzofren ê çîrokê de di wan de agahî hene. Çîrok bi vî awayî dest pê dike (2001: 57):

6 Di *Se una notte d'inverno un viaggiatore* ya Italo Calvino de di beşa ewil de VKD hatiye bikaranîn û di wê de jî bi awayekî postmodernîst tê diyarkirin ku roman romana dawî ya nivîskarekî bi navê Italo Calvino ye. Xuya ye bandora vê romanê li ser ya Cewerî çêbûye.

(1)

Bextiyar, li ber Efserê ku yekemîn berpirsiyarê lêkolînên Dosyaya Bextiyar bû, xav û sist mîna dilekî rawestiyabû. Efser berê xwe da tercumanê Bextiyar û got:

- *Il faudrais que il aille a l Hospital psycyatrique.*

Tercuman xortekî kurd ê Lubnanî bû, ev axaftin bi xem ji Bextiyar re tercume kir, got:

- Keko, tiştê ez dizanim wê te heya demekê bişînin Şêtxaneyê.

*1 Heger tu bixwazî bê ma Bextiyar ki bû, temaşeyî enîşka jimare (11) bike.*

*2 Heger tu bixwazî û bizanî bê ma çi bi serê Bextiyar hat? Temaşeyî enîşka (5) bike.*

Weku tê dîtîn di vê çîrokê de du cure gotar hene; gotara di para jor a qutîkan de ya çîroka (fabûla) çîrokê ye, gotara di para jêr ya qutîkan de jî ji bo xwendina çîrokê alternatîfan pêşkêş dike. Para ku di vê çîrokê de bi vegêrana kesê duyem hatiye nivîsîn, para jêr a qutîkan e. Li vir em dibînin ku hem bikaranîna cînava kesê duyem “tu” heye û hem jî fonksiyona konatîv yanî fonksiyona xîtabkirinê a vegêranê heye (*heger bixwazî... bike*). Nehatibe diyarkirin jî êşkere ye ku ev beşên jêr ên qutîkan, xîtabî bervegêrekî derî deqê, xîtabî xwînerên îmakirî [implied reader] (xwînerên ku vegêr wan di serê xwe de disêwirîne) hatiye nivîsîn; lê belê wekî encam xîtabî xwînerên rastîn ên bi goşt û hestî jî dike.

Em dibînin ku bi avaniya *rêgeha-xwe-hilbijêre* [choose-your-own-adventure] xwîner beşdarî nav lîstikê dibin û ji qadeke ontolojîk, derbasî yeke din a ontolojîk dibin: ji cîhana derveyî deqê derbasî ya deqê dibin ku ev cihguhertina xwîneran a di dema xwendina vegêranên kesê duyem de gelek caran hatiye dupatkirin (Kacandes, Richardson, Fludernik, McHale).

Çîroka din a mijara me, lîstikbaktir xuya ye. Çîroka Burhan Tek “Kî”, hay ji çîrokbûna xwe heye û bi çemkên vegeerannasiyê re dilebike. Çîrok bi vî awayî dest pê dike:

Ey kesê ku rahiştiye vê pirtûkê û nêr kiriye vê pirtûkê û ji vê pirtûkê jî vê çîrokê bixwîne. [...] Ez te nas nakim, lê belê tu ji navê min ê li ser pirtûkê û jînenîgariya min a kurt, li ser min çend tiştan dizanî. [...] Lê belê anuha dîsa venegere û li jînenîgariya min nenere. [...] Ez ne ew kesê ku navê wî li ser pirtûkê me. [...] Ez jî wek te ne ji hestî û goşt, ji herf û peyvyan çêbûme. (2018: 47)

Tê de hinek arîşe (*heger tu ne ew kes bî ku navê wî li ser bergê ye, tu çima dibêjî “jînenîgariya min”*) hebin jî, deq bi termên vegêrannasiyê dilîze û rengkî bançîroksaz werdigire. Berdewam xîtabî xwînerên îmakirî (û di encamê de yên rasteqîn jî) dike, hewl dide wan tevî lîstika xwe bike û hinekî jî serê wan tevlihev

bike. Hemandemîtiya [simultaneity] vê çîrokê dîkotomiya çîrok-gotarê<sup>7</sup> xera dike, ji ber ku çîrokeke ji gotarê azade tune ye tê de; yanî “çî”yeke çîrokê ya li derveyî “çawa”ya wê tune ye.

Berevajî romanên her du çîrok jî hem cînavên kesê duyem bi kar tînin û hem jî xwedî rehenda xîtabkirinê ne. Her du çîrok jî bi çemka Bonheimê xwedî taybetiya şemîfîna referensiyel in, bi çemka Richardson deqên ototelîk in. Di her du çîrokan de jî vegêr bi awayekî pir eşkere ji bervegêran cuda ne. Di her du çîrokan de jî ev forma vegêranê bi saîqên postmodernîst hatine bikaranîn û xwîneran di nav pozisyonên cuda de dibin û tînin. Heger ne pênaseya DelConte bûya, her du çîrok jî dê li derveyê pênaseya VKDê bimana, ji ber ku xîtabî lehengên çîrokê nakin, heta di yekê de çîrok (fabûla) jî tune ye; dema ku em derbirînen binê qutîkan ji “Şîzofren”ê derxin û rêza qutîkan sererast bikin, di wê de çîrokeke li derî gotarê peyde dibe, lê belê em nikarin ji bo “Kî”yê vê yekê bibêjin.

## 7. ENCAM

Bikaranîna vegêrana kesê duyem di edebiyata kurdî de bi giranî di du rewşan de xuya dibe. Rewşa yekem: Dema ku derûna serleheng gelekî aloz be û di haletekê de be, an nexwaze li ser bifikire an jî nikaribe li ser bifikire, ev form hatiye bikaranîn. Di romanên *Tu* û *Segwer* de me dît ku ev aloziya hişê lehengan, ji ber rewşeke siyasî ye ku lehengên her du romanên jî di hefsê de, di rewşên dijwar de ne; yek êşkence lê tê kirin, yek dê bê îdamkirin. Di romana Maria *Melekek bû* de ev tevliheviya derûna leheng ji şîzofreniya wî diqewime (herçend di rabirdûyê de ew jî di bin mercên hefs û êşkenceyê de mabe jî dema ku tê vegêran cuda ye) û beşên ku ev karakter fokalîzer e, bi vegêrana kesê duyem hatine nivîsîn. Herwiha ew yek ku serleheng qebûl nake ku wî jina xwe kuştîye, bi bikaranîna vî formê re hevaheng e. Di çîroka “Navnîşeneke Nû” de jî leheng ji ber hêzeke desthilatdar (bav) ku ew ji malê qewirandiye, di nav derûneke xerab de ye û li ber destpêkirina

7 Ji Formalîstên Rûs bi vir de, di vegêranê de cudahiya naveroka vegêranê û awayê vegêranê hatiye danîn. Formalîstên Rûs di vî warî de cudahiye datînin navbera “fabûla” û “sûjet”ê, li cem wan “fabûla” keresteyê çîrokê ye, “sûjet” jî serastkirin û rêxistina vî keresteyî ye. Genette sê astan diyar dike: “çîrok” (histoire), “vegêrayî” (recit), “vegêran” (narration). Rimmon-Kenan van xweş kategorîze dike: “çîrok” (story), “deq” (text), “vegêran” (narration) (Dervişcemaloglu, 2014: 76-80). Li vir vegêran pêvajoya ye. Deq encam e, berhem e. Çîrok, hin bûyer û rewş in. Ji van kategorîyan bi tenê deq şênber e. Lê di xebatên vegêrannasîyê de cudakirina Todorov bêtir tê referekirin: “çîrok”, “gotar”. A Seymour Chatman jî bi heman awayî ye. Chatman jî bo vê xalê wisa dinivîse: “Teoriya binyatger diyar dike ku her vegêranekê du beş hene: çîrok; naverok an jî zincîreya bûyeran (çalakî, qewimîn), li gel van ew tiştên ku em dikarin ji wan re bibêjin bûnwer (karakter, hêmanên demê û cihî) û gotar, yanî derbirin; rêya veguhastina naverokê. Bi gotîneke hêsan çîrok çîya vegêranê ye, gotar jî çawa ya wê ye.” (Chatman, 2008: 17)

jiyaneke nû li navnîşaneke nû digere. Di çîroka “Şîzofren” de jî dîsa serleheng şîzofren e, lê belê di wê de bikaranîna vegêrana kesê duyem derekî ye. Yanî leheng ne fokalîzer e, lê vegêr bi raberkirina alternatîfan hewl daye li cem xwîneran sergêjîyekê çêbike û wê hisa şîzofreniyê li cem wan jî tevrake.

Rewşa duyem: Dema ku nivîskaran xwestiye bi lîstikbaziyeke postmodernîst tiştên azmûnî bikin, ev form bi kar anîne. Di “Şîzofren” û “Kî”yê de ev mexsed berbiçav e. Ev cure vegêran di edebiyata kurdî de, di kurteçîrokan de digihîje kapasîteya xwe ya tam ya hem referekirinê hem xîtabkirinê.

## 8. ÇAVKANÎ

Bal, Mieke. (1996). “Second-Person Narrative”, *Painting And Narrative*. November. rr. 179-204.

Butor, Michel. (1991). *Roman Üstüne Denemeler*. Wer. Mehmet Rifat-Sema Rifat. İstanbul: Düzlem Yayınları.

Cewerî, Firat. (2013). *Maria melekek bû*. İstanbul: Weşanên AVA.

Chatman, Seymour. (2008). *Öykü ve Söylem: Filmde ve Kurmacada Anlatı Yapısı*. Wer. Özgür Yaren. Ankara: De Ki Basım Yayın.

DelConte, Matt. (2003). “Why You Can’t Speak: Second-Person Narration, Voice, and a New Model for Understanding Narrative”. *Style*, Vol. 37, No. 2, rr. 204-19.

\_\_\_\_\_. (2013/2014) “The Influence of Narrative Tense in Second Person Narration: A Response to Joshua Parker”, *Connotations* Vol. 23.1. <https://www.connotations.de/article/matt-delconte-the-influence-of-narrative-tense-in-second-person-narration-a-response-to-joshua-parker/> 20.10.2019

Dervişcemaloğlu, Bahar. (2014). *Anlatıbilime Giriş*. İstanbul: Dergah Yayınları.

Fludernik, Monika. (1993). “Second Person Fiction: Narrative You As Addressee And/Or Protagonist”. *Arbeiten aus Anglistik und Amerikanistik* 18, rr. 217-47.

\_\_\_\_\_. (1994a). “Introduction: Second-person narrative and related issues”. *Style*, Vol. 28, No. 3, rr. 281-311.

\_\_\_\_\_. (1994b). “Second-Person Narrative: A Bibliography”. *Style*, Vol. 28, No. 4, rr. 525-548.

Kacandes, Irene. (1994). “Narrative Apostrophe: Reading, Rhetoric, Resistance in Michel Butor’s “La modification” and Julio Cortázar’s “Graffiti””. *Style*, Vol. 28, No. 3, rr. 329-49.

McHale, Brian. (2004). *Postmodernist Fiction*. Taylor & Francis e-Library.

Morisette, Bruce. (1965). “Narrative “You” in Contemporary Literature”, *Comparative Literature Studies*. Vol. 2, No. 1, rr.1-24.

Mukrî, Mihemed. (2015). *Segwer (Reyîn)*. Wer. Besam Mîstefa. Stembol: Avesta.

Parker, Joshua. (2011/2012) “In Their Own Words: On Writing in Second Person”, *Connotations*, Vol. 21.2-3. rr. 165-176.

- Pîrbal, Ferhad. (2001). *Çolistan*. İstanbul: Avesta.
- Prince, Gerald. (2011). *Zaravên Vegêranê; Ferhengê Zaravan*, Wer. Celal Mistefa. Hewlêr: Wezareta Rewşenbîrî û Lawan.
- Richardson, Brian. (1991). "The Poetics and Politics of Second Person Narrative". *Genre*. Vol. 24. rr. 309-30.
- Tek, Burhan. (2018). *Dûpişk*, Stembol: Avesta.
- Uzun, Mehmed. (2005). *Tu*. İstanbul: Îthaki.

### EXTENDED ABSTRACT

Second person narrative is a narrative mode in which a narrator uses an address pronoun or conditional/subjunctive structure referring to a protagonist of a story or a hypothetical addressee. Several researchers have placed a premium on this mode of narrative. For example Morissette has written that "[it] appears as a mode of curiously varied psychological resonances, capable, in the proper hands, producing effects in the fictional field that are unobtainable by other modes persons." Richardson also said "It is arguably the most important technical advance in fictional narration since the introduction of the stream of consciousness."

This paper examines three Kurdish novels and three Kurdish short stories written in second person narrative. The novels are Mihemed Mukrî's *Segver (Reyîn)*, Mehmed Uzun's *Tu* and Firat Cewerî's *Maria melekek bû*; the short stories are Ferhad Pîrbal's "Şîzofren" and "Navnîşaneke Nû" and Burhan Tek's "Kî". The paper draws on both concepts of structuralist narratology and concepts of the rhetorical theory of narrative in order to understand this mode of narrative in Kurdish works. The paper discusses the definition of second person narrative and draws a theoretical background and examines the relation of second person narrative with first and third person narratives in the context of Kurdish works and tries to understand reasons for applying this mode and explains its relation with protagonists' psychology; and finally focuses on exploitation of this mode for postmodernist and experimental purposes.

This study has revealed that second person narrative appears in two cases in Kurdish literature. In the first case, when the psychology of a protagonist is so bad that he doesn't want to think about or cannot do that. In the novels *Tu* and *Segver* we saw that the confusion of protagonists' mind is due to their political situations in which the protagonists of both novels are incarcerated; one is being tortured and the other will be executed. In the novel *Maria melekek bû* the confusion of protagonist's mind is due to his schizophrenia (he had also been incarcerated and tortured in the past) and the chapters in which protagonist is a focalizer are written in the second person. In addition, his denying killing his wife is compatible with this kind mode of narrative. Protagonist of the short story "Navnîşaneke Nû" in a miserable psychology seeks a new address because another authority, his father, has kicked him out of home and he is on the verge of a new life. In the short story "Şîzofren" too, protagonist is a schizophrenic but in this short story second person narrative is external. So the narrator is not focalizer but offers reading alternatives and in this way tries to confuse the readers and evoke the sense of schizophrenia in them.

In the second case, when authors try to write playful postmodernist or experimental texts, they write in second person because of the metaleptic potential of this form of making readers a part of fiction by making them potential addressees. In the short stories “Şizofren” and “Kî”, this function is apparent. It appears that this mode of narrative reaches its full capacity of both referring and addressing in the short stories in the Kurdish literature.

## WERGEREK / A TRANSLATION





# Neteweperwerîya Kurdan

Thomas Bois\*

Ji Îngilîzî: Adnan Demir\*

Ev çend rêzên wergirtî, ji ber îhtimala jibîrkinê tîne bîra me ku neteweperwerîya Kurdan wek hêzeke zindî hebûna xwe didomîne. Ji bo înkarkirina vê yekê, bi rastî jî divê mirov kor be. Hesta neteweyî; evîna welatî ya niştiman û dîrok û bawerî û kevneşopîyên wê, hestên gerdûnî ne ku di hundirê hemû mirovan da hene û ruhekî bi vî rengî meşrû û rewa ye bi şertê ku nijad, şareza û çandên cuda yên gelên cîran neke bin serwerîya xwe. Kurd îro wek hemû gelên din xwedî hestên kûr ên neteweyî ne. Ev haylêbûna xurt a xwemalîya nijadî helbet ji nişkê ve derneketiye holê û –bo mînak- qet nebe bi qasî neteweperwerîya Ereban an jî ya dewletên nû yên Afrîkî yên cihêreng kevn e û –herî kêr bi qasî wan jî rûniştîye û bi cih bûye-. Loma jî, kesekî ku ji hesta Kurdan a kelegerm ku îlhamê dide çalakîyên wan ên curbicur û bertekên wan ên sîyasî bêxeber be, nikare derheqê Kurdan da bibe xwedî agahîyeke rast û tîkûz. Em ê li vir tenê çarçoveyeke sade ya vê dîyardeyê sêz bikin ku derheqê geşedan û kûrahîya wê da fikreke maqûl bide.

## Pêşdîroka Neteweperwerîya Kurdan

Ji piştî hilweşîna Nînovayê (BZ 612) heta misilmanbûna Kurdan mirov dikare bibêje ku dîroka populasyona Kurdên Kurdîstana îroyîn bi ya Împaratorîya Persan re rastî hev hatiye. Kurd ji vê yekê baş haydar in û hem li ser navê xwe xwedî li efsaneyên epîk ên wek “Pirtûka Şahan” derdikevin, hem jî li ser navê bavûkalên xwe xwedî lê derdikevin û bi vî rengî di heman demê da Ristem, Xatem û herwiha gelek navên ku rûmeta Îranîyan in ji bo xwe wek leheng qebûl dikin. Digel vê, divê bê diyarkirin ku eger hêj di wê heyamê da bavûkalên Kurdan li Kurdîstana

\* Thomas Bois, “The Kurdish Nationalism”, The Kurds, Khayat Book & Publishing Company, Lubnan- Beirut, 1966, rr. 137-154; Ji aliyê Prof. M.W.M. Welland ve ji Frensî ber bi Îngilîzî ve hatiye wergerandin.

\*\* Dr., Zanîngeha Mardîn Artuklûyê, Mêrdîn, Tirkîye; adnanxdemir@gmail.com, Orcid: 0000-0002-4423-6336

Îraqê bi cih bûbin, heta destpêka Îslamê wargeha wan li gorî cihê niha wêdetirê rojhilatê bû. Teqez dikare bê gotin ku, berîya Qirnê Navîn, Kurd hema bêje qet li herêmên rojhilat û bakurê Dicleyê bi cih nebûbûn. Lêbelê piştî destpêka xîlafetê, li ser sînorên Bîzansê kolonîyên leşkerî hatin damezirandin û ji sedsala 11an û pê ve ji ber zextên Tirkan pêşveçûyîna wan a ber bi rojava ve bileztir bû.

Pêvajoya misilmanbûnê ji ber hin sebebên cihêreng ên dînî û nijadî bêyî şer û pevçûnan nebû, lêbelê Kurd gavbigav bûne beşek ji şaristaniya Îslamê. Helbet Îslamê kesayetîya Kurdan ji bin ve tune nekir û bi gotina Minorsky, di serdema “Fesla Îranîyan” da mîrektîyên Kurdan ên serbixwe û biçûk ji bin desthilatdariya xelîfetîya Erebrîng û tund derketin. Di sedsala 9an û ya piştê wê da çend Xanedanên Kurd derketin holê. Pêşî li Transqafqasyayê, li Dabil û Gencayê Şeddadî (951-1088) derketin. Ev xanedan, pîr ronakbîr bû û li qesrên wan çanda Îranê serdest bû. Di heman serdemê da, Hesnewîyan (941-1014) li Cîbalê (Xûzistan) îqtidar bi dest xistibû û desthilatdariya xwe heta Hemedan û Nîhawendê, Kirmanşan û Şehrezorê berfireh kir. Yek ji wan, Bedir (979-1014) e ku navdar e bi damezirandina dadwerîya aborî, pêşvebirina perwerdeyê û parastina cotkaran. Benî Eyarîyan (yan jî Benî Ennazîyan) (991-1117) şûna wan bi cih bûn. Lêbelê di nav xanedanên Kurdan da yê ku herî baş tê zanîn, xanedaniya Kurdên Merwanî (990-1096) ne ku li Ercîş, Amîd (Diyarbakir), Meyafariqîn û Heskîfê desthilatdar bûn. Di rêxistin û sazûmana mîrektîyê da Xîlafeta Bexdayê wek model hate wergirtin. Di serdema hukumdariya xwe ya dirêj da Ebû Nasir Ehmed (1011-1061) hem bazirganîyeke pêşketî saz kir, hem jî avahîyên bifeyde û xwedî huner ava kirin. Qesra wî ya ku gelek şairên navdar dihewandin zêde zêde bi debdebe bû. Di herema vî hikûmdarê gelek dewlemend da, zêdetirî 300 jinî hebûn. Lê tevahîya van mîrektîyên biçûk ji alîyê Selçûqîyan ve hatin hilweşandin.

Gelo ma pêdivî heye ku em bi bîr bînin ku Selaheddîn, şervanê “bêtirs û bêqisûrê ku nikare bê rexnekirin”, damezirînerê Xanedana Eyyûbîyan (1137-1193), lehengê rastîna Îslamê, yekem kesê ku yekîtiya gelê musulman pêk anîye, Kurdekî rast û heqîqî bû? Wî derûdora xwe bi leşkerên ji eşîrên Hekkarî, Mihranî û Hezbanîyan dorpêç kir. Wan yekîneyên ku hejmara wan ji Turkmen û Ereban zêdetir bû, li hember Xaçparêzan, bi taybetî jî di serkeftina Ekka û Xittînê (1187) da roleke gelek girîng lîst. Di wê heyamê da Kurdan nîşan da ku ew ji bo hemdemên xwe ne tenê reqîb û hember, lê di heman demê da leşkerên wêrek, birêveberên zîrek û durist, avaker û herwiha dostên hunerê ne jî. Lêbelê, dîsa jî mirov nikare bibêje ku wan, Dewletên Kurd saz kirine. Eynî wek ku li Rojavayê, cihê ku ramana Xirîstîyanîyê bûbû raserî fikra neteweyî –bêyî ku wê fikrê îhmal bike-, herwisa Îslamê jî li Rojhilata Nêzîk û ya Navîn gelên misilman absorbe kirin; împeratorîyên wan împeratorîyên Îslamê bûn, lewma ji bilî damerzînerên wan tiştekî ku wan bikira Kurd tunebû. Dîsa jî, piştî hilweşîna Eyûbîyan yek ji serdemên herî tarî di dîroka

Kurdan da dest pê kir. Girseya Moxolîyan, dane ser Kurdistanê, di sala 1247an da ji Şehrezorê û di sala 1252yan da jî ji Diyarbekirê derbasbûn û karesatek hêla li cihên ku tê ra derbas bûn. Di sala 1257an da Hulagû, eyaletên Kirmanşan û Hewlêrê wêran kirin; di sala 1259an da jî Hekarî û Cizîrê talan kirin û niştecihên wan deran bi şûran qetil kirin. Di domayîya du sed sal û nîvê da (1260-1502), Kurd, Ermenî hetta Tirkmenên Karakoyunlû yên ku du sed sal berê li herêmê bi cih bûbûn, li hemberî hêz û desthilatdariya Moxolên Îlhanî û Tîmûr li ber xwe da. Dema ku tofan derbas bû, niştecihên herêmê kaviên xwe ji nû ve ava kirin û di nav çend salan da dîsa endustrî û bazirganîya xwe saz kirin.

### Feodalîzm û Neteweperwerî

Dibe ku sedema xetên politîk ên taybet ên Rojhilatê ku di heyama çar sed salan da qewimîye, xeyirîna rojê ye ku teşe daye qedera Kurdan. Stêrnasên Siltan, ji çavdêriya vê bûyerê, anku çilmisîna rojê li hember Hîlalê, ku sembola Îranê ye, pêşbînî û kehanetêke dilşad û hêvîdar derxist. Û di rastîya Xwedê da, di şerê Çaldiranê (2 Receb 920-23 Tebax 1514) da ku roja piştî rojxeyirîne qewimî, Şah Îsmail anku xanedanê Îranê û damezirînerê Safewîyan mecbûrî revînê bû, li hemberî topbarana Siltanê Osmanî Selîmê Yekem ê Tirsnaq. Ji bo ku Kurdan bi dest bixwe û axa wan di navbera hemdînen wan, Tirkên sunnî û Îranîyên şîî da bike wek dewleteke tampon (buffer state) vî siltanê şûm, bi pîranî bi şîret û birêvebirineke mifadar a pêşengê dînî û zanyarê Kurd Îdrîsê Bedlîsî, pênc mîrektîyên Kurd ên serbixwe damezirandin. Birêveberên van mîrektîyên ku ji neslên xanedanên niştecih bûn, li ser navên xwe pere derdixistin û xutbe didan xwendin. Ew pênc mîrektîyên mîrate ev bûn: Bedlîs, Hekarî (Colemêrg), Badînan (Amedîye), Botan (Cizîr) û Hiskêf. Di berdêla berpirsiyarîyên darayî û leşkerî da, ku pîrî caran dihatin paşguhkirin, Mîr, bi memnûniyeta hemû kesên peywendîdar li ser axa xwe bixwe bûn desthilatdar. Herwiha, li herêma Diyarbekirê heşt sancaqên bi heman şeweyê ji aliyê birêveberên xwe ve hatin îdarekirin. Şahên Îranê bi heman awayê tevgerîyan û bi taybetî mîrên Kurdên Erdelanê bûbûn xwedan mafên berfireh. Em pevçûnên Tirk û Îranîyan ên derbareyê tixûbên wan da û şerên li pey van pevçûnên ku hema bêje har car bûne sebebê bedeldayîna Kurdan, ji bîr dikin.

Lê hêj di sedsala 17an da, siltanan hesûdîya vê xweserîyê kirin ku bandora kontrola wan şikandibû, û wan xwestin ku Mîrên Kurdan tepeser bikin, biçewisînin û şûna wan bi walîyên Tirk ên sadiq dagirin. Wan pevçûnên eşîran bi kar anîn, lê ji ber lawazketina ji şerên li Ewropayê naçar bûn. Di vê navberê da, divê em vê jî bibêjin, Kurdekî ji eşîra Zendê, Kerîmxan (1750-1779) li Îranê di sedsala XVIIIan da, aloziyên piştî desthilatdariya Nadir Şah (1722-1747) bi dawî anî û payîtexta wê Şîraz di nav bajaran da kire wek gewherî. Ji aliyê din ve di destpêka sedsala 19an da di dewleta Osmanîyan da, hewldana kêmkirina navendên xweser ên Kurdan

bi awayekî dijwarî ji nû ve dest pê kir. Bêhejmar pevçûn û serhildanên xwînrij qewimîn. Li her deverê, hem mîr hem jî gel ji bo berdeyamîya azadîya xwe li ber xwe dan. Di encamê da di 1805an da Ebdurrehman Paşa Baban (1788-1812) li Silêmanîyê têk çû; di 1830an da Muhemmed Paşayê ku bi Mîrê Kor navdar bû li Rewanduzê têk çû, di 1842-1846an da Mîrê Botan Bedirxanê navdar li Cizîrê bi tenê bi îxanetê têk çû. Ew axirîn mîrê serbixwe yê Kurd ê serdema Osmanîyan bû. Lêbelê di sala 1880yan da peywira damezirandina birêveberîyeke serbixwe ya derveyî desthilatdariya Tirk û Farisan ma li ser milê Şêx Ubeydullahê Nehrî. Ew jî naçar ma û serê xwe tewand. Êdî mesele hem feodalîzm bû û hem jî serxwebûn. Ew dewleta ku bû serdestî hemûyan, bi nîyeta tepisandina cihewazîyên nijadî û berterefkirina wan di nav hêsirtîyeke hevpar da, hetta ji destê wê hat navendparêzî tund meşand da ku li bindestîyeke berbelav cudahîyên nijadî pûç bike. Kurên serokên têkçûyî, bi camêrtî li Stenbolê hatin pêşwazîkirin û perwerdekirin da ku wan di bin kontrolê da bigirin û ji axa wan a kevnare bi dûr bixin û wan li ber hêza navendî sernermtir û îtaetkartir bikin. Di navbera salên 1889-1892yan da, ji bo kanalîzekirina şervanîya Kurdan a camêrane, Siltan Ebdilhemîd, di bin fermandariya serokên eşîran da, ji yekineyên biçûk ên siwarîyan Lêwayên Hemîdîyeyê saz kir. Ew ji, bi nîyeta şandina wan ber bi enîya şer ve, lê ji bo qirkirina wan, berî bikaranîna wan wek cellad di qirkirina Ermenîyan da, di serdema Şerê Mezin da, qaşo bi navê piştevanîya Îslamî. Lê Kurd ji hingê vê dirûşmê red dikin. Ezcumle, Tirkan her tiştê ku ji destê wan dihat dikir ji bo tunekirina wê neteweperwerîya Kurdan, lê feodalîzmê ew xwedî dikir û bi pêş ve dibir. Dîsa jî, hewldanên wan neteweperwerîya Kurdan hêzdartir û qewîtir kiriye.

### Netewetîya Kurd û Qanûna Navneteweyî

Tevgera Kurdên feodal a li dijî Payîtextê Osmanîyan (Derîyê Bilind/Babê 'Alî) dikare wek gazîkirina şîyarbûna neteweyî bihê nirxandin. Lêbelê ew tevger bi temamî, bêyî plansazîyeke yekgirtî û bêyî armancên eşkere yên binavkirî hatin kirin. Wek mînak, serokekî dixwest ku hêzên xwe yên mîrate li dijî hikûmetê û dijî cîranên xwe yên lawaztir biparêze, yan jî ji bo xwe mîrnişînîyek damezirîne. Hêj hizra Kurdîstaneke mezin a serbixwe derneketibû holê. Ev xeyal, eynî wek ramana serxwebûna Ereban û ji ber heman sedeman, di demeke nêzî Şerê Cîhanê yê Yekem da û piştî wê bi awayekî gelekî bihêztir teşeyê xwe girt. Ji bo ku xwe bigihînin armancên xwe, neteweperwerên Kurd bi rêzê, du stratejî bi kar anîn: rêya dîplomasîyê û rêya serhildanê.

Tevgera Tirkên Ciwan (Jön Türkler) (1908) dê hestên hemû kesên azadîxwaz hişyar bikira di serdema Osmanîyan da. Hem kêmarên dînî hem jî yên neteweyî yên ji Ereban, Ermenî û Kurdan, bawer kir ku saeta rizgarîya wan di demeke nêz da ye. Helbet Kurd jî, ji sûdwegirtina ji îqlîma nû ya vê ramanê neman.

Bi hewldanên hevpar ên Emîn Alî Bedirxan,<sup>1</sup> General Şerîf Paşa û endamê Mexlîsa Eyanan Seyîd Ebdulqadirê Şemzînanî, li Stenbolê sala di sala 1908an da, rêxistinên polîtîk, civakî û çandî hatin organîzekirin. Weke organê weşanê, ew xwedîyê *Kovara Kurdistanê* bûn. Komeleya wan a perwerdehiyê ji bo zarokên bajêr dibistanek vekir; lê Ittîhadîyan demildest ew girtin û komeleya hat fesihkirin, êdî bû nepenî. Di 1910an da hin xwendekaran tevgera *Hêvîya Kurd*<sup>2</sup> saz kir ku weşana wan a mehane *Roja Kurd* di sala 1914an da bû *Hetawê Kurd*.

Piştî ku Tirk li gel Hêzên Îttîfaqê beşdarî şerî bûn, hin serokên Kurd ên ku tehrîkat dikirin, di nav da Xelîfe Selîmê Bedlîsî, hatine girtin û darvekirin. Di sala 1917an da, Şêx Ebdulqadir hizir kir ku xweavêtina ber bextê Şerîf Huseyn li Mekkehê ji aliyê îhtiyatê ve guncawtir e, lê Seyîd Ebdullahê kurê wî ji bo rizgarkirina Kurdistanê bi navê *Isfîxlasa Kurdistanê* komeleyek ava kir. Hin serokên Kurd ên wek Seyît Tahayê birazîyê Ebdulqadir û Kamil Bedirxan, hewl da bi Rûsan ra bikevin nav têkilîyê û bala wan bikêşin. Lewra êdî bawerîya temamê kurdan bi wan nemabû. Bi rastî jî tê gotin ku, hin efserên Tirk ên ku navçeyên Tebrîza Îranê îstîla kiribûn û li wir gundên Ermenîyan talan û niştecihên wê derê jî qetil kiribûn, di nav alema kêf û zewqê da ev beyan kirine: “Me di hatina xwe da koka ZO (Ermenî)yan dawî li koka wan anî û di vegeerê da jî em ê ji LO (Kurd)an xelas bin.” Bi ser da jî, Enwer Paşa, di nîveka şer da, pêşîya dagirkirina Rûsan, bi hinceta raqewirandina nifûsa Kurdan, 700.000 Kurd sirgûnê bajarên rojava kirin ku piranîya wan li wan deran telef bûn. Di heman demê da, Kurdên din ên ku bersiv dane banga şerê pîroz (cîhad) ya ku ji aliyê Siltan ve hate kirin, di vegeerê da Ermenî qir kirin ku ew bixwe jî hatibûn sirgûnkirin.

Çawa ku şer bi agirbesta Mondrosê (30 Kewçêr 1918) bi dawî bû nebû, hin komîsyon hatin avakirin. Dema ku li Qahîreyê Mîr Sureyya Bedirxan (1883-1938) komîsyon ji bo serxwebûna Kurdistanê ava kir, di heman demê da li Stenbolê bi xwe, Mîr Emîn Bedirxan û Mîr Kamûran Bedirxan û Seyîd Ebdulqadir ji bo jinûveavakirina Kurdistanê komele saz kirin. Di demeke kurt da, *Komeleya Neteweyî ya Kurd* û *Civaka Kurd* a xwedî armancên civakî derket holê. Van komeleyan li seranserê Kurdistanê şax vekirin. Wergirtina Stenbolê ji aliyê leşkerên Mustafa Kemal ve, damezirîneran mecbûrî revîna derveyî welat kir; lê wan ne karîn çalakîyên neteweperwer, ne jî komîteyên rizgarîya Ereban rawestînin. Hetta, di sala 1919an da ew li Kehtaya nêzîkî Meletîyê bi hêza çekan be jî, bi mebesta berxwedana li dijî tevgera Kemalîst kom bûn. Serheng Bellê ji servîsa istîxbaratê soz da wan ku dê daxwazên Kurdan neyên jibîrkirin û wan ew ji vê niyetê vegeerand. Bi rastî jî, peymanên aşî, di dîrokê da cara yekem pirsra Kurdan di asta navneteweyî da wek fermî qebûl kir.

1 Nivîskar wek “Emir Bedir-Khan” nivîsîye. (wer.)

2 Navê vê komelê “Komela Xwendekarên Kurd-Hêvî” ye. (wer.)

Ermenî û Kurdan bi heman arezûyê daxwaza serxwebûnê kir lê her duyan jî qismen li ser heman herêmê îddîaya mafê xwe kir. Ya rast, parêzgehên Bedlîs, Diyarbekir û Xerpûtê ji aliyê her du gelan ve wekî parçeyên hevgerî yê axa neteweyî dihatin hesabandin. Ji bo şikandina şaşfêmkirinên ku dê angaşt û îddîayên her du alîyan lawaz bikirina, li Konferansa Aşitîyê, li ser navê Kurdan Şerîf Paşa û li ser ê Ermenîyan jî Boxos Paşa 20ê Îlona 1919an li Parîsê Peymana Ermenî û Kurdan hat biencamkirin. Vê çalakîya polîtîk a mezin di demeke kurt da fêkîyên xwe da. Bê şik, Peymana Sevrê ya ku 10ê Tebaxa 1920an di navbera Hêzên Îtîlafê û Tirkan da hate îmzekirin, Ermenîstan û Kurdîstaneke azad damezirand. (Beş III, made 62-64). Ev biryar çiqas ji aliyê Kurdan ve bi kelecana hatibe pêşwazîkirin, bi dijberîyeke ewqas tund jî ji aliyê radîkalê Frensî alîgirê Tirkan Comitê Dupleix ve hate provokekirin û bi pêleke ewqas tund hate protestokirin. Mustafa Kemal li dijî peymanê serî hilda û artêşa wî ya serkeftî ya ku Yûnan rijandibû behrê derfet dayê ku Sevrê wek parîyeke kaxezê bihesibîne. Bi rastî jî, peymanê nû, Peymana Lozanê (24 Hezîran 1923), peymanê kevin, bêhukum û betal kir. Bi vî awayî, Ewrûpayê îxanet li Ermenî û Kurdan kir û bi gotina profesorê hiqûqê yê navneteweyî Le Fur “Careke din dîsa Ermenîstan radesî celladê wê kir.”

Digel vê, pirsgerêka Kurdan dîsa bi dawî nebû. Ji aliyê Îngilîzan ve ku hem mandaterên Tirkan û hem jî yê dewleta Îraqê ya nû bûn, *pirsgirêka Mûsilê* ku piranîya nifûsa wê Kurd bû, careke din hate rojeva *Komeleya Neteweyan*. Lijneyeke tehqîqatê hate şandin bo herêmê û li gorî encamnameya vê lijneyê Komîsyona Komeleya Neteweyan di rûniştina xwe ya 37an a 16ê Kanûna Pêşîn a sala 1925an da biryar da ku pêwîst e parêzgeha Mûsilê aîdê Îraqê be. Lêbelê, mafên Kurdan hate garantîkirin anku misogerkirin. Di vê mijarê da jêgirtina hin rêzên rapora vê komîsyonê yê derheqê Kurdên vê herêmê da dê balkêş be:

“Eger mirov sîrf ji argûmanên nijadî encamekê derxe, ev, erêkirina dewleta Kurdan a serbixwe ye, lewra Kurd jî nehan pêncê nifûsê pêk tînin. Ger mirov çareserîyeke bi vî rengî hizir bike, guncaw dibe ku mirov Êzîdîyan, Kurdên xwedî bawerîya Zerdestîyê û Tirkên ku dikarin di nav Kurdan da bi hêsanî bihelin jî li vê hejmarê zêde bike. Li ser bîngeha nîrxandîneke bi vî awayî, Kurd dê ji nehan heftê nifûsa giştî pêk bînin.”

Di heman deman da, hikûmeta Îraqê bi saya serê mandatîya Îngilîzan bi her awayî hewl dida ku desthilatdarîya xwe li ser Kurdan berfireh bike, û bi Deklarasyona ku di 11ê Temûza 1923yan da weşand, bi Giştînameyên Serokatîya Konsîlê (21 Rêbendan 1926) û bi Giştînameyên Wezîrê Karên Hundirîn (18 Sibata 1926), bi berdewamî û bi domdarî dubare dikir û soz dida ku dê rêzê li gelê Kurd bigirin, dê zimanên wan di dibistanan da bê hînkirin û ev ziman dê di dadgeh û birêveberîyê da bê bikaranîn, dê karmend ji Kurdan bin, yan jî herî kêr karmendên li herêmên Kurdan dê Kurdîaxiver bin. Îngilîzan hewl dan ku

ev telîmat û rêzik çalak û karîger bin, lê di Hezîrana 1930yî da, wan fesih û îptala peymanê mandatîyê a di navbera Îngilîstan û Îraqê da îmze kirin ku tê da, çî yên dînî û çî jî yên neteweyî tu maddeyên derheqê mafên kêmaran tunebûn. Dê jî bo hemû alîyan encamên gelek bêsiûd û bextreş jî wê îhmal û piştguhkirinê derketa.

### **Rastîhevhatina Neteweperwerîya Kurdistan bi Neteweperwerîya Gelên Cîran ra**

Mirov bi kurtahî bibêje: polîtîkaya piştî-şer a navneteweyî, tevî şikestina hêvîyan di demeke nêz da, pozîsyona Kurdistan, tenê nediyartir kir. Berî 1914an Kurd, tenê di nav sînoren dewletên Osmanîyan û Îranê da anku di nav du dewletan da dijîyan, lê piştê di nav sînoren pênc dewletan da hatin parvekirin: Li Tirkîyê, Îranê, Îraqê û kêmareke berbiçav li Sûrîyê û jî wê kêmtir jî li Ermenîstana Sovyetê. Ev perçebûna Kurdistanê jî hêla welatparêzên Kurd ve nedihat pejirandin û dê serhildanên periyodîk aramî xirab bikira û hebûna hikûmetên dagirker tehdît bikira.

Hin lîstik hene ku xeternak in. Zarokek ku seyê xwe bîne kelecane bi dirêjkirina hestîyekî û hercar jê vekîşîne û nedîyê, tenê dikare xwe bi xwe tawanbar bike, eger se wî gez bike. Herwiha, di polîtîkayê da, bi îhtîmala dewrîkirina serxwebûnê Kurdistan hêvîdar bike û bi dûre jî peymanên ku soza van tiştan didin, wek parîyeke kaxezê bibîne, soz bide Kurdistan ku dê mafên xwe yên xwezayî yên wek ziman, çand û hikûmetên herêmî bi kar binin û paşê jî van mafan gav bi gav înkâr bike, ev polîtîka jî bo wê herêma Rojhilata Navîn dibe sebebeke xerabker bo bêistiqarîya daîmî ku jixwe berê jî bêistiqarar bû. Her ku diçû lîstik xeternaktir dibû, lewra heman mafên serxwebûn û azadîyê, bi taybetî piştî Şerê Cîhanê yê Duyem dane gelên wisa ku bi gelemperî jî alîyê pêşveçûnê ve kêmtirî Kurdistan bûn. Nexwe hêsan e mirov fêm bike ku Kurd pê hesiyane ku hatine xapandin û hewl didin ku di bin rojê da wekî her kesê din cihê xwe bigirin.

Kerem bikin em bi kurtasî vegotina rewşa Kurdistan a sê welatên ku Kurd bi piranî li wan deran dijîn anku li Tirkîyê, Îran û Îraqê, berdewam bikin. Li Ermenîstana Sovyetê, ku kêmara Kurdistan biçûk e û mafên wan ên çandî di bin garantîyê da ye, digel serdestîya Ermenîyan a hejmarî, çandî û civakî, hema bêje tu pirsgrêkên Kurdistan tunene. Heman tişt dikare jî bo Kurdên Sûrîyê jî bête gotin ku di prensîbê da digel ku Kurd ne xwedî dibistanên civata xwe bixwe ne jî lê ew wek hemû hemwelatîyên din jî hemû mafên sîvil û polîtîk sîd werdigirin.

### **Kurdên Tirkîyeyê**

Em bi vî welatî dest pê dikin lewra, hejmara Kurdistan a herî mezin (herî kê 5 heta 6 mîlyonan) li vir e û tevgerên wan, serhildanên wan ên leşkerî yên reel û cihê ku bedeleke giran jî alîyê Tirkan ve hatiye dayîn di warê mirovî, maddî û pereyî da, ev der e.

Di sala 1925an da serhildana Şêx Seîdê Pîranê nîşaneyê yekem a nerazîbûnê ye. Ev bûyer, bi fanatîzma Mislimanan ve dihat girêdan ku herwekî wan bêrfîya Xelîfetiya ku Atatürk rakiribû dikirin û herwiha îmtîyazên feodal dixwestin ku ji aliyê reformên Cumhuriyetê ve dihatin tehdît dikirin. Yên din, di nav da Atatürk bixwe jî, difikirîn ku tîlîya Îngilîzan di vê bûyerê da heye, lewra serhildanê alîkarî dida plana wan (Îngilîzan) a li ser parêzgeha Mûsilê. Dadgehên Îstiqlalê hatin damezirandin ku mirov ji bo sedemên biçûk dişandin sêdareyê. Darizandina pêşengên serhildêran li Diyarbekirê pêk hat (Avrêl-Hezîran 1925). Pêncî û sisêyê wan bi mirinê hatin cezakirin û hatin darvekirin bi sebeba ku di gotina Serokê Dadgehê da jî tê fêmkirin, ew “hemû di yek tiştê da bûbûn yek: di afirandina Kurdistanê serbixwe da” (28 Hezîran).

Serhildana duyemîn ku Serhildana Çîyayê Agirî ye (Ararat), ji aliyê esferên jêhatî yê xwedî pêdiviyên teknîk ên leşkerî ve û di bin fermanariya Navenda Neteweyî (Xwebûn)ê da ku bi temamî ji armancên hedefkirî agahdar bûn hate birêvebirin ku leşker bi çekên modern xemilandibûn. Hikûmeta Tirk di Gulana 1930an da, du parleşker (kolordu) di bin fermanariya Salih Paşa da berhev kir. Wan negotin jin yan zarok, ji asîmanan bombe li ser gundan barandin. Wexta ku tu îmkana berxwedanê nema, serokên serhildanê xwe ber bi Îranê ve vekişandin. Duyemîn Konseya Birêveberîya Navneteweyî di rûniştina xwe ya 30ê Tebaxa 1930an a li Zurîxê da, li ser daxweza delegeyên Ermenîyan, helwesta qirkirina Kurdan a ku dişibe rêbaza komkujîya Ermenîyan a ji aliyê Tirkan ve protesto kir. Tirkan Faris tawanbar kirin ku bi dizî alîkarîya Kurdan kir. Bi gotina “Bi ser da, dê zêdetir bo we bê dayîn (Mark 4:25)ê hin kesan zen dikirin ku tîlîya Lawrence’ê navdar di nav vî karî da heye. Di talîyê da, hin kesan (Agabékof) îma kirin ku tîlîya Sovyetê jî di nav meseleyê da heye; lê hinên din jî (Khondkarian) berevajî vê îddîa kirin ku Rûs amade bûn ji bo alîkarîya Tirkan da ku serhildanê tepeser bikin.

Eger wisa be jî, Hikûmeta Tirk, di 5ê Gulana 1925an da Zagona Tehcîrê derxist ku destûr dida Wezaretê Navxweyî ku Kurdên hin herêmên dîyarkirî mişextê parêzgehên rojavayê Tirkîyê bike û di bin hincetên wek “tenduristî, aborî, çandî, polîtîk, stratejîk û disîplîn”ê da. Êdî wek fermî Kurd tunebûn li Tirkîyê. Tenê “Tirkên Zozanan” hebûn. Serhildana Dersimê a sala 1937an ev angaşt pûç kir. Ev serhildana ji aliyê Seyît Riza ve hate birêvebirin gelekî xofdartir bû. Wî xwest ku li dijî tedbîrên îdarî yê hovane bisekine. Tevger belav bû û artêş mecbûr ma ku midaxele bike. Li vir jî mesele dîsa bi înfazan bi dawî bû.

14ê Mijdara 1937an ji aliyê dadgeha ceza yê Elezîzê ve ji bo 11 heb ji bertawanan hikmê îdamê hate dayîn û sibetirê ew hatin înfazkirin. Bi ser da jî, navê Dersimê ya aloz ji nexşeyê hat derxistin û di şûna wê da Tuncelî hat bicihkirin.

Ji hingê ve Kurdistana Tirkîyê bê his e. Rojnamevanên rojavayî difikirîn ku dê ji vê bigihîjin encama ku neteweperwerîya Kurdî ya li Tirkîyê bi dawî bûye. Lê bûyerên vê dawîyê em hişyar kirin.



## Kurdên Îranê

Serhildana Kurdistan a li dijî Tirkîyê bi hêsanî fêambar tê qebûlkirin; herwiha, lidijrabûna Kurdistan a li hember Ereben Îraqê jî dikare bê îzahkirin ku Kurdistan xwe ji wan astbilindtir didît; feqet mirov heyirî dimîne ku dê têkilîyên di navbera Kurdistan û hikûmeta Tehranê bifeşile. Ma her du gel jî ne Îranî ne? Gelo zimanên wan ne nêzîkî hev in? Qey her du jî ji heman destanên bav û kalan sûd wernagirin? Wê demê, divê hemû faktor her du gelan bînin cem hev û bêgûman rewşa Kurdistan li Îranê bi gelemperî ji yê cîranên wan baştir e. Hikûmeta Îranê her gav taybetmendîyên hevpar dupat dike, lê dîsa jî divê em nakokîyan li vir tomar bikin ku carinan tengezarî lê pirî caran jî alozîyên polîtîk û sosyal ên xwînrij derdikevin holê. Bi vî rengî, di serdema şerê 1914an da Serokê Şîkakîyan Îsmail Axa (Simko) xwest ku ji Îranê veqete û bibe xweser; carinan pala xwe dida Tirkan û carinan jî dida Îranîyên ku ew li Uşnûya herêma Gola Urmîyeyê kir walî da ku bisitire. Di dawîyê da, çawa ku Mar Şîmun Binyamînê Pitriqê Nastûrîyan qetil kir, bi heman awayê ew jî 3yê Adara 1918an bi bêbextî kuştin.

Ji 1922yan pê ve, Riza Şah Pehlewî, polîtîkayeke dundraw li dijî Kurdistan meşand ku dest danî ser milkên pêşengên eşîrên sereke û ew mişextê Tehranê kirin û loma jî gundîyên Kurd ên bêrêber û bêpêşeng, bi gotina Elphinstoneê di bin bêqanûnî û polîtîkayên bêmerhemet ên karmendên Îranî da eziyet kişandin. Ev polîtîka, herwiha, ji alîyê dadgerê Amerîkî Douglas ve ku bûbû şahidê pratikên wê, bi tundî hate şermezarkirin. Di sedema Şerê Cîhanê yê Duyem da bakurê Îranê ji hêla Rûsyayê ve û başûrê wê jî, ji hêla Bîrîtanyayê ve hate dagirkirin. Di navbera her duyan da Kurdistan, wek *axeke bêxwedî* bû ku mirov dikaribû li wê derê -ji dûrî êrişên Îranê- kêr zêde jîyaneke azad bidomîne. Kurdistan ji rewşê sûd wergirt û bi navê Komeleyê partîyeke polîtîk saz kir ku her çiqas parêzkar û muhefezkar be jî, lê dîsa jî netewerperwer bû. Kurdekî ji malbateke girîng a oldar û waiz, Qazî Muhemmed, di demeke kurt da derbasî serokatîya partîyê bû û ji firsendeke guncaw sûd wergirt û di 22yê Çileyê 1946an da li hemberî alozîya di hikûmeta merkezi ya Îranê bêyî xwînrijandinê, Komara Kurdistanê ya Mehabadê îlan kir di navenda Komara Azerbaycana Tebrîzê da. Qazî Muhemmed mirovekî dirust û wêrek bû. Li gorî A. Roosevelt Jr. Qazî ne komûnîst bû ne jî dij-Îranî bû; lê wî di nav hidûdê Împeratorîya Îranê da xweserîyeke navxweyî dixwest. Bi vekirina mekteb û nexweşxaneyan, bi weşandina rojnameyên bi zimanê Kurdî, bi hewldana teşwîqkirina çandinî, bazirganî, pîşesazî û paqijîyê wî dewleta xwe ya biçûk baş damezirand. Bi kurtî, têkilîya tiştêkî ji van, bi şoreşê ra tune. Mela Mustefa Berzanîyê (em ê paşê jî behsa wî bikin) ku wê demê penaberekî ji Îraqê bû, piştî demeke kurt ji alîyê komara ciwan ve wek General hate tayînkirin û wî piştevanîya artêşa biçûk lê di heman demê da baş perwerdebûyî, bi dest xist. Hikûmeta Tehranê ji veqetîna artêşa Rûsyayê ku piştgirî dida Komara

Azerbaycanê, lê nedida ya Mehabadê, sûd wergirt û kete nav dijraberyên xwînrij. Endamên pêşeng ên hikûmeta xweser di 31ê Adara 1947an da hatin aliqandin. Di nav wan da sê Qazî jî hebûn. Tecribeyê tenê salek dewam kiribû. Berzanî vê carê bi rastî jî piştî çend serpêhatî û macerayên çîrokane penaberî Yekîtiya Komarên Sovyet ên Sosyâlîst (YKSS) bû. Tirba Qazî Muhemmed bû wek herêma Hecê.

Van rêbazên bi vî rengê tund û zor pirsgirêkên ku têgihîştin û hestên civakî dixwazin, tu carî çaraser nekirine. Di her du rawşan da, vê carê, Eşîra Cewanrûdîyan, ên li nêzikê Kirmanşanê di Îlona 1950yan û Sibata 1954an da bi sedemên wek nedana bacê ji ber sedemên aborî, redkirina radestkirina çekan û çandina heşîşê, ji aliyê leşkerên Şah ve hatin cezakirin. Yekîtiya Sovyetê bi piştgirîya van serhildêran hatibû tawanbarkirin. Li gorî P. Rondotî tepeserkirina wan, yekemîn encama erênî ya Peymana Bexdayê (1955) bû. Di nav armancên vê peymanê da ku cihê Peymana Sadabadê (1937) girtibû, ev hebû: gava aliyên vê peymanê anku Îran, Efxanîstan, Îraq û Tirkîye bi hemwelatîyên xwe yên Kurd ra ketin nav alozîyekê dê alîkarî bidana hev.

Piştî van tengasiyên paşîn, bi daxweza reformên erênî yên civakî hikûmeta Îranê, ji bo bidestxistina evîntîya serjimêra girseyî ya Kurdan û hetta ji bo piştgirîya wan hewl da. Ji Gulana sala 1959an vir ve, li Îranê rojnameyeke heftane bi navê *Kurdistanê* dihê weşandin ku derheqê mijarên wek wêje, dîn, zanist, dîrok û hetta polîtîkayê da gotarên hêja tê da hene û li derveyê Îranê dihê belavkirin. Lê belê dîsa jî rewşa guherbar a li Îraqê, hikûmeta Îranê li ser derzîdankê lingan dihê.

### **Kurdên Îraqê**

Jîyana Kurdên li Îraqê ji ya birayên wan ên li Tirkîyê û Îranê baştir nebû, lewra li wan deran jî hin serhildan qewimîbûn.

Di 1ê Adara 1920an da, li San Remoyê, Birîtanyaya Mezin ji Komeleya Neteweyan mandatîyê ji ser Îraq û Filîstîne rakir. Feqet Kurd berîya peymana Mondrosê jî ji bo ku bi Îngilîzên ku axa wan dagir kiribûn ra bikevin nav têkilîyê, li benda vê mîsyona fermî neman. Bi rastî, ji dagirkirina Mezopotamya û Kerkûkê (7 Gulan 1918) vir ve, Brîtanîyên xwedî du mirovên baş ên bi navên Serdar Soane û Serdar Noël, bi Kurdan ra têkilî danîbûn jî. Van, bi daxwaznameyeke ku ji aliyê çil pêşengên eşîran ve hatibû îmzekirin, di Kanûna 1918an da, ji Sir Arnold Wilsonê ku wê demê Komîserê Mulkî bû, xwestin ku dewleteke Kurdan di bin parastina Îngilîzan da û têkildarê Îraqê bê avakirin. Şêx Mehmûdê Berzencî (1880-1956) di Gulana sala 1919an da wek walî hate tayînkirin. Wexta ku îmzekirina Peymana Sevrê bû sebebê diltengîya Kurdan, di 11ê Adara 1920an da Emîr Feysel li Şamê wek qralê Sûrîyê hate îlankirin. Feyselê ku ji aliyê Fransîyan ve ji Şamê hate raqewirandin, 23yê Tebaxa 1921ê wek qralê Îraqê hate îlankirin. Piştî salekê,

di Îlona 1922yan da, ji bo Şêx Mehmûdê ku di vê navberê da li Hindîstanê mişextî bû, destûr hat dayîn ku vegere Silêmanîyeyê. Lê belê Şêxê ku birêvebirîya wî ji alîyê -qaşo dostên wî yê- Îngilîz ve hate astengkirin, xwe ranegirt ku bi sernermî Erebeke Bedewî bişopîne. Di Cotmeha sala 1922yan da wî xwe wek hikûmdar, qralê Kurdistanê îlan kir, hikûmetek ava kir û pûlên dahata navxweyî çap kir û bi rêya posteyê belav kir. Gelo tilîya Îngilîzan di nav vê da hebû? Her çi bûbe jî, di 24ê Kanûna 1922yan da daxuyanîyeke fermî wiha digot: “Hikûmeta Majestetîya Bîrîtanî û Hikûmeta Îraqê mafê Kurdên di nav sînoren Îraqê da dijîn, nas dike da ku di hundirê van sînoran da hikûmeta Kurdistan ava bikin.” Lê piştî demeke kurt, di navbera Qral Mehmûd û parêzvanên wî da nakokî derket, ku bûbûne sebebê revîna wî ya Penjwînê heta sala rejîma mandater bi dawî bû anku sala 1930an.

Parêzvanîya Bîrîtanîyan çawa ku bi dawî bû, monarşî û yekdestdarîya Haşimîyan bi Kurd û Suryanîyan ra kete nav pevçûnê (Komkujiya Semelç di Tebaxa 1933yan da). Hikûmeta Îraqê, ji bo ku karmendên Erebeke wek karmend zû bi zû bi cih bike û bikaranîna Kurdî ji daîreyên Bakur rake, gengeşe derxist û gava ku leşkerên Îraqê bi ser xelkê sîvil ên Silêmanîyê ra gule reşandin, ev gengeşe veguherî bi bal serhildaneke eşkere ve (6 Îlon 1930). Careke din dîsa Şêx Mehmûd, vegeerî welatê xwe û di bin parêzvanîya Îngilîzan da bi daxwaza xweserîya navxweyî pêşengîya tevgerê hilda ser xwe. Piştî ku artêşa Ereban eşkere kir ku di şikandina serhildana neh mehan da bêçare ma, R.A.F. (Royal Air Force/Hêza Hewayî ya Qralîyetê) mecbûr ma ku dîsa midaxele bike da ku ji nû ve nîzama berê vegeerîna û ji ber vê yekê ji hin rayedarên payebilind ên kevin ên wek Wilson û General Dobbs ku deklare kirin ku wan, ev bûyerên bextreş pêşbînî kiribûn, bertekên tund standin. Mehmûd li Bexdayê hildane hefsa malê.

Lê belê Haşimî hêj di destpêka pîrsgirêkan da bûn. Pêşî di Tîrmeha sala 1931î da û paşê jî di salên 1932 û 1933yan da yê ku dîsa serî hilda Şêx Ehmedê Berzanî bû. Di dawîyê da, pêşî ew mişextê Kerkûkê kir û paşê jî mişextê Silêmanîyê kir ku heta sala 1945an li wir mabû. Kurdistanê Îraqê êdî bê deng bû. Di sala 1941î da piştî maceraya Raşîd Elî Geylanî, Îngilîzên ku xwe li Îraqê ji nû ve damezirandin, ji bo ku xwe li ber çavên Kurdistan şîrîn bikin, piştevanî dan ku Kurdistan hilgirin artêşê û bi ser da jî hin ji wan bi awayeke fermî îşareta “herêmên xweser”ê didan.

Di sala 1943yan da, Mela Mistefa Berzanîyê birayê Şêx Ehmed ku li Silêmanîyê di bin îqameta îcbarî da bû û kesên ku bi wî ra bûn, ji xwarin û defetên din gilîdar bûn, digel Şêx Letîfê kurê Şêx Mehmûd, xwe xelas kirin û derbasî herêma xwe Berzanê bûn û li wir rengê serhildanê geştir kirin. Macîd Mistefayê Kurd ku wek wezîrê dewletê hatibû tayînkirin ji bo çareserkirina pîrsgirêkê midaxele kir. Berzanî razî bû bi şertên wek şandina zexîre û xwirekên baştir bo herêma wan, tayînkirina memûrên Kurd di şûna yê Erebeke da, vekirina dibistan û nexweşxaneyan li Kurdistanê. Ev şert û mercên ku ji alîyê Serokwezîr Nûrî ve hatin pejirandin, ji

alîyê Qral Ebdulîllah ve nehatin erêkirin û di bihara 1945an da serhildan vê carê ji hemû deman tundtir ji nû ve dest pê kir. Vê carê rewş girantir bû. Gava ku Kurdan serkeftinên bêhempa û berbiçav bi dest dixistin, artêşa Îraqê bi hejmarên mezin qurban didan û li gorî gotina endamekî meclisê zerera malî gihaştibû milyonek dînarî. Wê demê careke din bi rola xwe ya xelaskarîya monarşî û yekdestîya Haşîmîyan R.A.F. (Royal Air Force/Hêza Hewayî ya Qralîyetê) kete nav dek û dolaban. Di dawîya Tebaxê da opereasyon qedîya bû. Mela Mustefa digel hin leşker û xenîmetên xwe, ber bi Îranê ve vekişîya. Çar fermanarên wî, Mustefa Xoşnaw, Îzzet Ebdulezîz, Muhemmed Mehmûd û Xeyrullah Ebdulkerîmê ku bawerî bi soz û paymana bexşandinê anîbû, di 19ê Hezîrana 1947an da hatin darizandin û dû ra jî hatin bidarvekirin. Lê piştî îlankirina Cumhûrîyeta Îraqê ji alîyê General Ebdulkerîm Qasim ve dê heqên wan bihatina îadekirin.

Piştî van bûyerên ku hêz bi ser ketibû, ji bo Kurdên Îraqê ji bilî dewamkirina têkoşînê bi awayeke veşartî tu rê nemabû. Ya ku wan kir jî ew bû. Partîya Demokratîk a Kurd a meylarê çepgirîyê ava kirin û du heb bulten weşandin: *Azadî û Rizgarî*. Di hejmara xwe ya duduyan da (Kewçêr 1946) Rizgarîyê bi coş û peroş pêşniyara damezirandina yekîtiya Kurd û Ermenîyan kir. Di vê serdemê da, Serokê Servîsa Îstixbaratê Colonel Elphinstone mereq dikir ka gelo ev hewldan dê encameke bi karakterê Kurd û Ermenî ku girêdayî Yekîtiya Cumhûrîyetên Sovyetî derbixwe holê yan na...

Dîsa jî piştî bicihbûna aramî û sikûnetê, Kurdan derfetên ku di destê wan da mabûn nixrandin û di qada çandê da bi kelecaneke mezintir xebitîn. Vekolînên wêjeyî derketin holê. Berhevok û koleksiyonên helbestê, li ser dîroka Kurdistanê û Kurdên navdar ên berê gotar hatin weşandin. Silêmanî bû wek navendeke çalak a çandê û merkeza neteweperwerîyê.

Hilweşîna monarşîya Haşîmîyan a ku têkilîya Kurdan jî pê ra hebû û îlankirina Komara Îraqê (14 Tîrmeh 1958) serdemeke nû dê verkira di warê têkilîyên Erebb û Kurdan da. Maddeya sêyem a makezagona demkî weha digot: "Ereb û Kurd li vî welatî hevpar in. Makezagon mafên wan ên sirûştî wek parçeyeke domdar a hebûna neteweyî misoger dike. Bi ser da jî, qerarnamaya 2yê Îlona 1958an Mela Mustefa efû kir û destûra vegera wî ya Îraqê da. Wekî ku tê zanîn Qasim digel îhmala tetbîqkirina vê benda makezagonê, Îlona sala 1961ê pevçûneke çekdarî da destpêkirin -ku yek ji sedemên têkçûna wî bû- û vê pevçûnê heta ew ji holê rabû, dewam kir. Li gorî gelek şahid û rojnamevanên rojavayî yên ku li herêma rûdanê bûn, Kurd ti carî di têkoşîna doza xwe ya neteweyî da ewqas yekgirtî, mêrxas û şêrdil nebûbûn. Partîya Be'sê û Mareşal Ebdusselam Arif ketin şûna Qasim, lêbelê xuya ye ku baş haydar nebûn ji hêza vê hîsê û şerê ku 10ê Hezîrana 1963yan ji nû ve vejîya. Piştra hilweşîna Be'sê dest pê kir; partî di Mijdara sala 1963yan da têk çû. Biryara agirbestekê hate stendin ku ev ji alîyê serkeftîyê derbeya paş-modern

Mareşal Ebdusselam Arif ve zehf dihat xwestin. Ji hingê ve, her du alî bêhereket mane. Hestê rastîyên şênber ku divê heqîqeta neteweperwerîya Kurdî di nav da be, pêwîst e ku rêya çareserîyeke wekhev veke ji bo pirsgerêkeke ku hem ji zûve ye rizîye û hem jî hevsengîya Rojhilata Navîn xerab dike.

Le Kréyé, Libnan, 23 Îlon 1964.

## ÇAVKANÎ

**P. Rondot**, La Nation Kurde en face des mouvements Arabes, Orient, no. 7, 1958.

**L.A. Wenner**, "Arab-Kurdish Rivalries in Iraq", Middle East Journal, 1963, pp. 68-82.

**J. Blau**, Le probleme Kurde, Essai sociologique et historique, Brussels, 1963.

**D.A. Schmidt**, Journey Among Brave Men, Boston, 1964.

**D. Adamson**, The Kurdish War, London, 1964.

**D. Kinnane**, Kurds and Kurdistan, Oxford, 1964.



# DOKUMENTEK / A DOCUMENT





# Qewa'îdêd Serfa Kurdî (I, II) a Mela Mehmûdê Bazîdî

## Qewa'îdêd Serfa Kurdî (I, II) of Mela Mahmûdî Bazîdî

Tahirhan AYDIN\*

### PUXTE

Ev destxeta bi navê “Qewa’îdêd Serfa Kurdî” a ku ji aliyê Aleksandre Jaba ve wek “Conjugaison des Verbes Kurdes” hatiye binavkirin ku kişandina lêkerên Kurdî, cureyên demê û yên peyvan di hundirîne, yek ji berhemên girîng ên derheqê rêzimana Kurdî da ye ku di koleksiyona Jaba da cih girtîye. Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo hevalê xwe Aleksandre Jaba, li Erzurûmê di sala 1866an da amade kiriye. Bazîdî ne navek li berhemê kiriye û ne jî navê xwe li ser nivîsîye. Destxet di teşeyê defterekê da ye ku ji du heb berhemên bi hev ve zeliqandî pêk tê û her yek ji wan kêzêde 46 wêre e. Di xatîmeya pirtûka ewil da, Bazîdî dibêje ku berhem derheqê usûla qewaîdên nehew/hevokazî û serfê/peyvsazîyê da ye. Lêbelê destxet tenê peyvan, anku kişandina lêkeran û cureyên peyvan di zaravayê Kurmancîya Kurdî da dihevine. Loma jî mirov dikare bi vê gotina Bazîdî, destxetê wek “Qewa’îdêd Serfa Kurdî” anku “peyvsazîya Kurdî” bi nav bike. Ji bilî vê nusxeya nivîskar a di koleksiyonê da tu îstînsaxeke wê tune. Destxet di Koleksiyona Jaba a li Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan a Rûsyayê da bi numereya Kurd46ê hatiye qeydkirin û tu nîşaneyên rizîn yan belavbûnê li ser tune. Li ser rûpelên wê ku ji aliyê Bazîdî ve bi mirekeba reş hatine amadekirin, gelekî werger, têbînî û latînzekirin ji aliyê Jaba ve bi qelesa resas hatine nivîsîn. Berhem bi giştî li ser peyvsazîyê anku li ser deman, cure û kişandina lêkeran û cureyên peyvan radiweste di zaravayê Kurmancî da.

**Peyvên Sereke:** Kurmancî, Kurdî, rêziman, Mela Mehmûdê Bazîdî, Aleksandre Jaba, peyvsazîya Kurdî, Koleksiyona Aleksandre Jaba, destxet

---

\* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî. (Assoc. Prof., Visiting scholar at Department of Near Eastern Languages and Cultures (NELC), Indiana University/IN/USA)

e-mail: tahirhan@hotmail.com / taydin@iu.edu ORCID: 0000-0002-2586-2956

## ABSTRACT

*“Qewa’îdêd Serfa Kurdî (I, II) of Mela Mahmûdî Bazîdî”* This work *“Qewa’îdêd Serfa Kurdî”* which is called *“Conjugaison des Verbes Kurdes”* by Alexandre Jaba, which contains Kurdish verb conjugations, types of tenses and words, is one of the important works in the Jaba collection about the grammar of Kurdish language. This work was prepared by Mela Mehmudi Bazidi for his friend Alexander Jaba, in Erzurum in 1866. Bazidi did not give a name for the work, nor did his name is written on the work. The work is in the form of a notebook consisted of two consecutive books each on an average of 46 pages. In the end of the first book, Bazidi says that the work is about Kurdish sentence structure and vocabulary. However, the work contains only vocabulary, i.e. verb conjugation and words in the Kurmanci dialect of Kurdish language. Thus it can be named with the *“Qewa’îdêd Serfa Kurdî”* ie *“Kurdish morphology”* by Bazidi’s expression. The work was handwritten by Bazidi himself and this is the only known copy. The work is located in the Jaba collection at The Library of the Russian Academy of Sciences, with number of Kurd46, and does not reflect any deformation. There are a number of translations, notes, and transcriptions written by Jaba with pencil on the pages that were written by Bazidi in black ink. The manuscript deals with morphological issues such as tenses, verb varieties, verb conjugations, vocabulary types in Kurmanci dialect of Kurdish.

**Key words:** Kurmanji, Kurdish, grammar, Mela Mahmudi Bazidi, Alexandre Jaba, morphology of Kurdish, Alexandre Jaba Collection, manuscript

## 1. DESTPÊK

Koleksiyona Aleksandre Jaba ji gelek alîyan ve biqîmet û bêhempa ye. Hin berhem tê da hene ku nû ne, orîjînal û nûser in, nusxeyên nivîskar in û heta roja me îro derneketine qada zanistê. Yek ji wan berheman **“Qewa’îdêd Serfa Kurdî”** ye ku ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye nivîsîn.

Berhemên nivîskî ji gelek alîyan ve agahiyên girîng pêşkêş dikin. Wek mînak helbestek gelek agahî di xwe da dihewîne. Ji ber vê yekê xebatên nivîskî ji aliyên curbicur ve tên nirxandin. Rêziman, hevoksazî, çand, dîrok, peyvsazî û dengnasî hin ji van alîyan in. Lewra em dikarin bibêjen helbest ne tenê helbest e, çîrok ne tenê çîrok e û stran ne tenê stran e. Her yek ji wan derheqê ziman, çand, dîrok û hwd. da xezîneyên veşartî ne.

*“Qewa’îdêd Serfa Kurdî”* ku li ser berga wê ya dawî bi Frensî *“Conjugaison Des Verbes Kurdes”* anku *“kişandina lêkerên Kurdî”* hatiye nivîsîn berhemeke orîjînal e ji koleksiyona Jaba. Hem xeta nivîskar e, hem nusxeke wê ya din tune û hem jî heta îro derneketiye qada zanistê.

Di vê xebatê da me hewl da ku em vê berhemê ji çend alîyan ve bidin nasîn. Em ewil nasnameya berhemê zelal dikin ka berhem ji aliyê kê ve li ku û kengê hatiye amadekirin? Berhem li ku ye, çawa hatiye parastin û kî xwedî lê derketiye? Her

wiha ji alîyê fîzîkî ve divê berhem bê nasandin. Gelo ka çend wereq e, rewşa kaxez û mirekebê çawa ye, cureya nivîsê çi ye, ebatên destxetê çi ne? Di dawîyê da jî em li ser naveroka berhemê disekinîn: Mijara berhemê çiyê, kîjan mijaran îhtîwa dike û sebebê nivîsandina berhemê çi ye?

## 2. QEWA'ÎDÊD SERFA KURDÎ JI ALÎYÊ NASNAMEYÊ VE

Gelek kedkarên koleksiyona Jaba hene ku dudu ji wan kedkarên pêşeng in. Yek ji wan, motora xebatê ye ku Jaba ye û yê dî jî Mela Mehmûdê Bazîdî ye. Dostîniya Bazîdî û Jaba gelek kûr e. Ewqas kûr e ku rengvedana hevaltiya wan di koleksiyonê da bi zelalî dixuye. Wek mînak Bazîdî çend berhem ji bo xatîrê dostê xwe Jaba nivîsîne û ji ber ku van berheman dîyarîyê dostê xwe kiriye navê xwe wek nivîskar li ser nenivîsiye. Hetta navê yekî ji wan berheman bi mebesta dîyarîyê “Tuhfetu'l-Xullan” (Bazîdî, Tuhfetu'l-Xullan, 1866) anku “dîyarîya dostan” danîye.

Jaba li ser berga dawî ya vê berhemê, bi Frensî “*Conjugaison des Verbes Kurdes*” (Bazîdî, Qewa'îdêd Serfa Kurdî II, 1866, r.46/berga dawî) nivîsiye ku wateya wê “*kişandina lêkerên Kurdî*” ye. Jaba ji bo berhemên di nav koleksiyonê da katalogeke kurt amade kiriye û di vê kataloga xwe da ji bilî navê berhemê hîç agahî nedane (Jaba, *Catalogue De Manuscrits Kurdes*, r. 7). Ev berhema girîng ji alîyê Bazîdî ve bi giştî ji bo hînbûn û hînkirina Kurdî û bi taybetî jî ji bo danasîn û kişandina lêkerên Kurdî, wek du defterên (Rudenko, *Danasîna Koleksiyona Destxetên Kurdî yên li Lenîngradê*, r.107) li pey hev sala 1866an hatiye amadekirin. Bazîdî hem di dawîya xatîmeya pirtûka yekem da (Qewa'îdêd Serfa Kurdî I, r. 46) hem jî di dawîya pirtûka duyem da (“*Temam şod der weqtê esir li eclî Mosyo Jaba fi Erzurûm 1283*” bnr. Qewa'îdêd Serfa Kurdî II, r. 46) wek dîrok bi hejmarên erebî 1283 nivîsiye. Jaba li ser bergên giştî yê pirtûkê, anku her du bergên pêşî û paşî (Qewa'îdêd Serfa Kurdî I) wek dîrok 1866 nivîsiye. Digel vê jî Rudenko tarîxa 1283yan wek 1866/67 wergerandiye teqwîm/salnameya mîladî (Rudenko, r. 107).

Bazîdî bixwe li ser xatîmeya deftera/berhema ewil wiha gotiye: “*Me'lûmê te bitin ku ev qewa'îdêd ku di vê rîsaleyê da hatiye zikir û beyankirin ji usûlê qewa'îdêd ulûmêd nehew û serfê ne*” (Bazîdî, Qewa'îdêd Serfa Kurdî I, 1866, r. 46). Gelo ev berhem “*usûlê qewa'îdêd ulûmêd nehew û serfê*” dihewîne yan na? Bi rastî, ji ber ku dîsîplîna nehew li ser hevoksazîyê radiweste ev berhem nakeve kategorîya nehewê/hevoksazîyê. Herçiqas di çarçoveya şîroveyan da hin hevokên kurmançî hebin jî rasterast derheqê hevoksazîya kurmançî da bi rêbazeke sistematîk agahîyek tune. Ji ber vê yekê mirov nikare bibêje ku ev berhem derheqê hevoksazîya/nehwa kurmançî da ye. Lê wekî ku Bazîdî jî dibêje serfa kurmançî, peyvsazîya kurmançî temsîl dike. Herwiha binavkirina Jaba jî pirtûkê temsîl nake. Lewra Jaba dibêje

ku pirtûk derheqê “kişandina lêkerên Kurdî” da ye, lê ne tenê kişandina lêkeran dihewîne, digel wê cureyên peyvên û yên deman jî dihewîne.

Elhasil, berhem bêtir li ser serfa Kurdî disekine: lêker, kişandina lêkeran, cureyên lêkeran, cureyên deman, cureyên navdêran û hwd. (Rudenko, r. 107). Jiber vê yekê mirov dikare bi îfadeya Mela Mehmûdê Bazîdî pirtûkê wek **“Qewa’îdêd Serfa Kurdî”** bi nav bike. Ji alîyê din ve destxet ji du berheman pêk hatiye û her çiqas bi hev ve zeliqandî bin jî her yek ji wan xweser e û xwedî hejmarên serbixwe ye. Loma jî em ji bo nasandina berhemê dikarin bibêjin **“Qewa’îdêd Serfa Kurdî I, II”**. Ev yek dê nasnameya desxetê zelaltir bike û di warê xebatên lêkolînê da jî dê pêşîya tevlihevîyê bigire.

### 3. QEWA’ÎDÊD SERFA KURDÎ JI ALÎYÊ FÎZÎKÎ VE

Ev berhema ku kişandina lêkerên Kurdî û cureyên peyvê û demê dihewîne, li Erzurûmê sala 1866an bi Kurdiya kurmancî û bi nesx û rîq’eyeke tevlihev, wek pexşan/mensûr bi mirekeba reş hatiye nivîsîn. Wisa dixuye ku ev berhem piştî ku ji alîyê Bazîdî ve hatiye amadekirin, ji alîyê Jaba ve hatiye xwendin û mitalekirin. Lewra gelek werger, transkrîbsiyon û têbînîyên Jaba li ser rûpelan û di navbera rêzan da hene (Rudenko, r. 107). Piştî ku hatiye nivîsîn di Koleksiyona Jaba ya li Pirtûkxaneyê Akademîya Zanistan a Rûsyayê cihê xwe girtîye û heta îro li wir di rewşeke baş da hatiye parastin. Lewra digel ku ne xwedî kaxez û bergeke taybet û qewî ye jî berhem, ne belav bûye ne jî nûşaneyên rizînê li ser hene. Tenê li çend cihan belavbûna mirekebê dixuye. Li gorî agahîyên kataloga Rudenko sala 1868 anku piştî nivîsînê bi du salan li Pirtûkxaneyê Akademîya Zanistan a Rûsyayê hatiye qeydkirin (Rudenko, r. 107).

Berhem li ser deftereke resen hatiye nivîsîn. Li ser hin rûpelan jî bo qismên nivîsandî bi qelema resas û bi destan çarçove hatine xêzkirin lê li ser hin rûpelan jî ev çarçove tunene. Herwiha li ser hindêk rûpelan xêzên rêzan hene û li ser hindêkan tunene. Ebadên wereqan 22x15 cm ye, lê ebadên qismên nivîsandî 18,5x14 cm ye (ji bo ebadên kaxez û nivîsê bnr. Rudenko, 107-108). Rûpel bi tayê hatine dirûtin. Hem berg hem jî rûpel jî kaxezêk spî û resen pêk tên. Li se berg û rûpelan serlewhe, tezhîb, wêne, minyatur û nexşe tunene. Kaxeza berhemê deforme nebûye. Berhem li ser yek sitûnê hatiye nivîsîn û di her rûpelê da 7-9 rêz hene.

Destxet ne di mecmû’eyekê da ye lê di nav defterekê da wek du berhemên li pey hev hatiye amadekirin. Lê ev her du berhem ne ji alîyê naverokê ve ne jî ji alîyê fîzîkî ve jî hev cuda ne. Tenê di navbera her duyan da xatîmeyek heye û her yek ji wan bi jimareyêkê nû û serbixwe dest pê dike.

Ji bo hejmara wereqan du cure reqem hatine nivîsîn. Yek ji wan li alîyê rastê a jora hemû wereqan hatiye nivîsîn ku bi erebî ye û ji bo her pirtûkê (Rudenko ji bo

van pirtûkan peyva “defter”ê bi kar tîne: Рукопись состоит из двух тетрадей, bnr. Rudenko, r. 108) bi hejmara 1’ê dest pê dîke û bi 46an diqede (di pirtûka yekan da li ser wereqê bi şaşî 41 nehatiye nivîsîn. Anku 45 wereq e). Lê reqema din tenê li jêra wereqê li alîyê çepê hatiye nivîsîn ku reqemên latînî ne û ji bo her du defteran bê navber bi hejmara 1’ê dest pê dîke û bi 49an diqede. Bi kurtî hejmara wereqan  $46+46 = 92$  ye (digel berg û wereqên vala 96 e).

#### 4. QEWA’ÎDÊD SERFA KURDÎ JI ALÎYÊ NAVEROKÊ VE

Wekî ku li jorî hat gotin di vê destxetê da du berhem hene. Li ser berga berhema yekemîn Mela Mehmûdê Bazîdî, çend hêvî û temennîyên xwe pêşkêşî dost û hevalê xwe Jaba kiriye. Li ser heman bergê Jaba jî wergera wê nivîsiye û bi tîpên latînî navê Mela Mehmûdê Bazîdî, cihê nivîsînê û dîrokê wiha nivîsiye: “*Khodja, Mahmoud Efendi Bayazidi ... Erzerûm, 1/3 Septembre 1866*” (Bazîdî, *Qewa’îdêd Serfa Kurdî I*, berga pêşî).

Berhem rasterast bi cureyên demê, kişandina lêkeran û cureyên peyvan dest pê dîke: Wek serenav *fê’la mazî me’lûm/mechûl, fê’la mazî, nefyê hal, fê’la îstiqbal, nefyê îstiqbal, emrê hazir, nehyê hazir û hwd. dinivîse* û ji bo her mijarekê wek *mînak lêkerên curbicur dikişîne*. Her wiha ji bilî kişandina lêkeran jî mijarên wek *îsmê fa’îl, îsmê mef’ûl, îsmê mekan, îsmê alet, yekjimar (mifred), dujimar (tesnîye), pirjimar, (cem’), îsmê îşaret, zemîr (cînav) û hwd. gelek mijarên peyvsazîyê peşkeş dîke* û jo bo her mijarê mînakan dide. Li ser exlebê rûpelan bi tîpên latînî xwendin (bilêvkirin) yan wergera mijarên rêzimanê ji alîyê Jaba ve hatine nivîsîn.

Berhema duyem jî heman mijaran dihewîne. Tê da heman rêbaz hatiye şopandin. Nehatiye gotin ka çima du berhemên wek hev hatine nivîsîn. Jixwe di dawîya berhema duduyan da Jaba wek “*Conjugaison Des Verbes Kurdes en deux cahier (Di du defteran da kişandina lêkerên Kurdî)*” pênase kiriye (Bazîdî, *Qewa’îdêd Serfa Kurdî II*, berga dawî).

#### 5. TEWSÎFA DESTXETÊ

1. **Navê berhemê:** Qewa’îdêd Serfa Kurdî I, II/Conjugaison des Verbes Kurdes
2. **Te’lif, tercume:** Telîf
3. **Navê nivîskar:** Mela Mehmûdê Bazîdî
4. **Cih:** Koleksiyona Jaba a li Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan a Rûsyayê
5. **Navê Pirtûkxaneyê:** Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan a Rûsyayê (The Library of the Russian Academy of Sciences (Библиотека Российской академии наук / БАН))

6. **Pirtûkxane no:** Koleksiyona Rojhilat, 167 (Rudenko di kataloga xwe da bi rûsî cihê berhemê wiha destnîşan dike: Уп. рук. Восточный сборник, стр. 176, bnr. Rudenko, 107).
7. **Navê xwedî:** Aleksandre Jaba
8. **Zimanê destxetê:** Kurdî (Kurmancî)
9. **Taybetiyên bergê:** Kaxeza normal
10. **Serbixwe-mecmû'e:** Du berhemên li pey hev
11. **Cihê telîfê:** Erzurûm
12. **Tarîxa telîfê:** 1866
13. **Menzûm-mensûr:** Mensûr/pexşan
14. **Rengê kaxezê:** Spî
15. **Sitûrî û ziravîya kaxezê:** Zirav (Rudenko dibêje "kaxeza awrupî", bnr. Rudenko, 108)
16. **Rizîbûna kaxezê:** Nerizîye
17. **Jimara wereqan:**  $46+46 = 92$  wereq (digel berg û wereqên vala 96)
18. **Ebadên kaxezê:**  $22 \times 15$  cm (ebadên qismên nivîsandî:  $18,5 \times 14$  cm. Ji bo ebadên kaxez û qismên nivîsandî bnr. Rudenko, 107-108).
19. **Cureya xetê:** Nesx û riq'e tevlihev
20. **Mirekeb:** Mirekeba reş, qelema resas
21. **Cedwel:** Rêz û çavçove hatine xêzkirin
22. **Jimara sitûnan:** 1
23. **Jimara rêzan:** Exleb 7-9 (tevlihev)
24. **Sernav:** Ji bo her mijarê sernavek heye û sernav gelek in.
25. **Peyva te'qîbê:** Tune
26. **Temelluk:** Ji ber ku ji bo Jaba hatiye amadekirin xwedîyê destxetê Jaba ye.
27. **Mutale'e û teshîh:** Werger, transkrîpsiyon û şîroveyên Jaba gelek in.
28. **Hamiş/derkenar:** Werger, îzah û şîroveyên Jaba gelek in
29. **Destpêka destxetê:** هیشی هیه کو او دوست
30. **Dawiya destxetê:** تمام شد در وقته عصر لاجل مسیو ژابا در ارضوم
31. **Naverok:** Kişandina lêkerên kurmancî, cureyên peyvnan, cureyên demê

## 6. ENCAM

Me di vê xebatê da berhemeke bênav a Mela Mehmûdê Bazîdî ji çend alîyên ve (ji alîyê nasname, naverok û fîzîkî ve) da nasandin. Berhem li Erzurumê sala 1866an

ji bo xatirê dostanîyê wek dîyarî ji bo Aleksandre Jaba hatiye nivîsîn. Berhem nusxeya nivîskar e û ji bilî vê tu îstînsax û mînak tunene. Bazîdî ne navek li berhemê kiriye û ne jî navê xwe li ser nivîsîye. Em ji çend agayîyên ku Jaba li ser berhemê nivîsîne, kataloga Jaba û ya Rudenko tê digihîjin ku berhem a Bazîdî ye. Jaba bixwe bi tîpên latînî û bi Frensî bi wateya “Kişandina Lêkerên Kurdî” wek **“Conjugaison des Verbes Kurdes”** bi nav kiriye. Lê em dikarin bi şîrove û nasandinên Bazîdî bixwe berhemê wek “Qewa’îdêd Serfa Kurdî” bi nav bikin. Ji ber ku di destxetê da du heb berhemên li pey hev hene û her yek ji wan xwedî reqemên serbixwe ne em dikarin weha jî bi nav bikin: “Qewa’îdêd Serfa Kurdî I, II”.

Berhem îro jî bi numereya Kurd46ê di koleksiyona Jaba da li Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan a Rûsyayê ye. Berhem nerizîye û deforme jî nebûye. Di koleksiyonê da çend berhemên derheqê rêziman û zimannasîya kurmançî da hene û ev jî yek ji wan e. Her çiqas ji aliyê qeydê û binavkirinê ve wek berehemeke serbixwe xuya bike jî di nav defterekê da du heb pirtûkên li pey hev hene. Her du berhem jî heman mijaran anku cureyên demê, kişandina lêkeran, cureyên lêker û navdêran dihewînin. Lêbelê her du berhem wek du berhemên ji hev cuda bi lê dest pê dikin û bi 46an diqedin. Gelek werger, têbînî û latînîzekirinên Jaba hene li ser rûpelan. Bêgûman ev berhem jî wek hin berhemên din ên di koleksiyonê da derheqê rêziman, zimannasî, pevsazî, dengnasî, çand û zaravayê kurmançî da hin agahîyan jî dide.


## 7. ÇAVKANÎ

- Bazîdî, Mela Mehmûd, *Tuhfetü'l-Xullan fî Zimanî Kurdan*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba a li Petersburgê, li Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan a Rûsyayê, No: Kurd08, Erzurûm, 1866.
- Bazîdî, Mela Mehmûd, *Qewa'îdêd Serfa Kurdî I*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba a li Petersburgê, li Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan a Rûsyayê, No: Kurd46, Erzurûm, 1866.
- Bazîdî, Mela Mehmûd, *Qewa'îdêd Serfa Kurdî II*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba a li Petersburgê, li Pirtûkxaneya Akademîya Zanistan a Rûsyayê, No: Kurd46, Erzurûm, 1866.
- Jaba, Aleksandra, *Catalogue De Manuscripts Kurdes*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba a li Akademîya Zanistan a Petersburgê, No: Kurd53.
- Rudenko, Margarita Borisovna. *Danasîna Koleksiyona Destxetên Kurdî yê li Lenîngradê*, Çapxaneya Edebiyata Rojava, Moskova, 1961 (niv.) (Orîjînal a pirtûka Rodenko: Руденко Маргарита Борисовна, *Описание курдских рукописей ленинградских собраний*, Издательство Восточной Литературы, Москва, 1961.)

8. PÊVEK


Çend wereq ji destxetê:

Qewa'idêd Serfa Kurdî, I, berg pêşî.





**Qewa'idêd Serfa Kurdî, I, werek: 46/berga paşî.**



**Qewa'idêd Serfa Kurdî, II, werek: 17,18.**



## EXTENDED ABSTRACT

“*Qewa’idêd Serfa Kurdî (I, II) of Mela Mahmûdî Bazîdî*”. Mela Mahmudi Bazidi’s “*Qewa’idêd Serfa Kurdî I, II*” is located in the Alexandre Jaba’s collection. This collection contains valuable and unique works in many ways. This work is Bazidi’s manuscript and has no other copies, and has not yet been published. Jaba had written on the last cover of the manuscript “*Conjugaison Des Verbes Kurdes*” in French, which means “*Kurdish verb conjugation*”.

We tried to introduce this manuscript in several ways. We first identified it in terms of identity, then examined its physical conditions, and finally evaluated it in terms of content.

Jaba had prepared a catalog of the works in his collection, but he had not provided any information other than the title of this work. This important work was prepared to teach the conjugation of the verbs of Kurdish, word types and tenses in general. This manuscript was written in 1866 in two adjacent notebooks.

Although Bazidi says that the book is related to “*sarf/morphology*” and “*nahiv/syntax*”, since it does not contain information about syntax, it can be considered to be on “*sarf/morphology*”.

In short, the manuscript focuses more on the morphology of the Kurdish language: verbs, verb conjugations, tenses, nouns and so on. Therefore, in the words of Mela Mahmud, the book can be named as “*Qewa’idêd Serfa Kurdî/The rules of the morphology of Kurdish*”. On the other hand, the manuscript consists of two books. Although they are adjacent to each other, the page numbers are arranged independently and considered as two books. Therefore, we can name the book as “*Qewa’idêd Serfa Kurdî I, II*”.

This book, written in the Kurmanji dialect of Kurdish, uses black ink and neskh and rîqa scripts. It seems that after this work was written by Bazidi, it was read and studied by Jaba. Because there are many translations, transcriptions and notes by Jaba on the pages of the book and between the lines. After it was completed, it was transferred to The Library of the Russian Academy of Sciences within the Jaba collection and preserved there until today. Because although it does not have a solid paper and cover, the work is neither scattered nor shows signs of decay. According to the information contained in Rudenko’s catalog, it was registered in the library in 1868, two years after it was written.

The work was written on an ordinary notebook. Some pages have pencil-drawn lines and frames, while others do not. The page size is 22x15 cm and the written parts are approximately 18,5x14 cm. Notebook pages are sewn with a rope. The pages of the book are not deformed. The work is written in a single column and has an average of 7-9 lines per page. These two works written adjacent to each other are not different in terms of content. There is only an afterword between the two, and the page numbers for each are placed separately. The number of pages is  $46 + 46 = 92$ , but the number of pages with the covers and empty pages is 96.

The manuscript deals with morphological issues such as tenses, verb varieties, verb conjugations, vocabulary types in Kurmanji dialect of Kurdish.

# DERBAREYÊ KOVARA NÛBIHAR AKADEMIYÊ DE

Kovara Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademîk û navneteweyî ye ku dê weşana gotarên kêrhatî yên di qada Kurdolojiyê de bike. Kovara Nûbihar Akademî, bi rêbazeke akademîk dê cih bide her cure nivîsên zanistî û bi nêrîneke multidisiplînerî dê nivîsên li ser zanistên ziman, edebiyat, çand, huner, aborî, civakî, olî û hwd. di nava xwe de bihewîne. Di kovarê de dê nivîsên mîna gotar, werger, tîpguhêzî, danasîna sempozyum, pirtûk û tezan biweşin. Gotarên ku ji bo weşandinê bî şandinê de bi sîstema “hekemtiya kor” ku dê ji hêla hekemen pîspor ên ku navên wan dê bî weşartin ve bî nîrxandin. Kovara Nûbihar Akademî dê di demsalên bihar û payîzê de salê du caran bê weşandin. Zimanê weşanê Kurdî (bi hemû zaravayên xwe ve) û Îngilîzî ye.

## Nîrxandina Gotaran

1. Lêkolîna ewilîn ji aliyê lijneya weşanê / edîtoriyê ve tê kirin. Gotarên ku ji aliyê ruxsarî û naverokî ve ne li gorî rêzîknameyê hatibin nivîsandin, bi armanca ku bî rastkirin li nivîskaran tî ve gerandin. Piştî vê merheleyê gotarên ku guncaw in (dema werger bin digel orjînalên wan) ji sê hekeman re tî şandin. Bîrîyara weşandina gotarên ku ji kovarê re tî şandin li gorî nîrxandinên van hekeman tî dayîn. Eger bi kêmasî du rapor erênî bin, wê demê gotar tî weşandin. Dema ku hekeman sererastkirin xwestin û pêşniyazên xwe vegotin, gotar demildest ji nivîskaran re tî şandin û ji wan li gorî nêrînen hekeman daxwaza pêşxistin û guherandina gotaran tî kirin. Gotarên ku ji bo sererastkirinê ji hekeman re tî şandin divê herî dereng di nava mehekê de dîsa ji kovarê re bî şandin. Heger di dema sînokirî de guherîn û sererastkirin nehatibin çêkirin û şandin, bîrîyardayîna weşanê wê demê di destê lijneyê de ye. Di rewşa nelîhevîkirina di navbera hekem û nivîskaran de, bîrîyara weşandina gotarê ya lijneya weşanê (edîtoriyê) ye. Gotarên sererastkirî di halên pêwîst de ji aliyê hekeman ve dîsa tî kontrolkirin.

2. Nameya ji bo pejirandin yan nepejirandina gotarê tevî raporên hekeman ji nivîskaran re tî şandin. Ev bi rîya postê, yan mailên elektrônîk dibe. Ji dema teslîmkirina

nivîsê bigire heya derketina du jimarên kovarê ku gotar nehatibe weşandin, derbarê vê yekê de dê bo nivîskaran agahî bê dayîn. Gotarên ku hatine şandin biweşe ji neweşe ji li nivîskarê wê nayên vegerandin.

3. Berpîrsê naveroka gotaran nivîskar bi xwe ye. Gotarên ku ji bo weşanê tên pejirandin, heqê weşana wan yê kovarê ye.

4. Bi şertê ku navê kovarê bê gotin, gotar û xebatên dîtbarî yên di kovarê de weşiyane dikarin bên wergirtin.

### **Esasên Rastnivîs û Weşana Kovara Nûbihar Akademiyê**

1. Divê nivîsên ku bêne şandin berê li cihêkî di nehatibin weşandin, an jî ji bo weşanê divê di asta nîrxandinê de nebin. Heger gotar berê di kongreyek, sempozyûmek an jî civînekê de hatibe pêşkêşkirin, bi şertê êşkerekirina dem û cihê wê û guncawdîtina lijneya weşanê dikare bê weşandin. Di vê babetê de hemû berpîrsiyarî ya nivîskar e.

2. Divê gotar bi tevahiya metnê, serbend, nişe û referansên xwe ve tenê di rûyekî rûpelekî A4ê de bi karekterê Times New Roman û 12 pûntoyê bin û valahiya di navbera rêzan de 1, 5 înk be. Valahiya kêlekên rûpelan divê ji bo çep û rastê 4, 5; ji bo jor û jêrê jî 3 santîmetre be. Wekî di divê li koşeya rastê ya di binê rûpelê de ji jîmara rûpelê bê nivîsandin. Gotar bi nişe û referansên xwe ve divê ji 30 rûpelî derbas nebe û heger hebe digel tablo, şikil û xêzan bê teslîmkirin. Divê ji bo şikil, wêne, grafîk û xêzan jimar bêne dayîn û dema cihê wê hat jimareyên wan bên diyarkirin û sernavên wan li jêrê wan, heger ku ji cihêkî din hatibe neqîlkin divê jêderka wan bê nivîsandin. Divê jêderk û referans di nava gotarê de (li gorî sistema APAyê) bên nivîsandin. Agahiyên berfireh ên jêderkan dê di dawîya gotarê de bê nivîsandin û heger rewşeke awarte hebe dikare di jêrenotê de ji bê nişandan.

3. Divê gotar ji bo ku karê rûpelsazî û çapê bi awayekî zûtir bê meşandin di dosyeya Microsoft Wordê de bên nivîsandin û ji e-maila kovara Nûbihar Akademiyê re bên şandin. Gotarên ku bi destan hatine nivîsîn dê neyên nîrxandin.

4. Di gotarên ku dê bên şandin de divê ev rêz bê şopandin: Sernavê gotarê, navê nivîskar, puxte (abstract), deqê gotarê, referans û kurte (Extended Abstract)

Sernav divê bi her du zimanan (Kurdî-Îngilîzî yan jî Îngilîzî-Kurdî) bê nivîsandin. Divê sernav ji 14 kelîmeyan ne zêdetir be û herfên pêşî yên kelîmeyên girdek bin.

Li binê sernavê divê navê nivîskar an jî nivîskaran cî bigre. Di jêrenotê de divê unvana akademîk, sazî, fakulte, beş, binbeş û navnişana elektrîk bên dayîn.

Divê bi her du zimanan puxte bên nivîsandin. Puxteya yekem bi zimanê ku gotar pê hatiye nivîsîn, puxteya duyem jî bi zimanê duyem dê bê nivîsandin. Puxteyên Kurdî di gotarên Kurdî de, dê bi diyalekta ku gotar pê hatiye nivîsandin û di gotarên Îngilîzî de dê bi diyalekteke ku nivîskar tercîh bike bên nivîsandin. Puxte divê ji 120 kelîmeyan ne zêdetir be. Piştî her puxteyekê divê peyvên bingehîn yên gotarê bên nivîsandin.

Divê di deqê gotarê de teqez beşên Destpêk (Introduction) Encam (Conclusion) û Jêderan (References) bên nivîsandin. Eger pêwîstî hebe divê beşên wekî Rêbaz (Method), Nişane (Results), Gengeşe (Discussion) jî hebin.

Kurte (Extended Abstract) di gotarên Kurdî tenê de bi Îngilîzî tê nivîsandin. Kurte divê ji 500 kelimeyî ne kêmtir û ji 750 kelimeyî ne zêdetir be. Divê kurte hemû hizir û ramanên gotarê di nava xwe de bihewîne. Kurte, bi şiklê paragrafan tê nivîsandin û tê de sernavên navxweyî (destpêk, rêbaz û hwd.) û jêgirên wekxwe cih nagirin.

5. Nivîskar bi xwe ji rastî û nerastiya jêderkan berpirsiyar e. Jêderk mîna ku li jorê ji hatiye eşkerekirin divê di nava gotarê de bête nivîsandin, heger nîşe hebin divê di hundirê gotarê de bête nimrekirin û li jêra gotarê li gor nimreya xwe bête nivîsandin.

6. Di nameya serîlêdanê de divê bê ifadekirin ku gotar resen e û ji hêla nivîskar an jî nivîskaran ve hatiye xwendin, pesendkirin û bi tu awayî û tu cihî de nehatiye weşandin.

## SERERASTKIRINA GOTARAN

Li nava welat û li dîyasporayê gelek pispor, akademîsyen û lêkolêrên Kurd hene ku di qadên curbicur ên zanistên mirovayeti de xwe pêgihandine û di warên zanistî de kar dikin. Lê gelek ji van pisporan, ji ber mercên ku tê de pêgihîştine, nikarin gotarên xwe yê zanistî bi Kurdî binivîsin. Kovara Nûbihar Akademiyê bangewazî li kesên bi vî rengî dike ku ev kes gava yekem bavêjin û gotarên xwe bi Kurdî binivîsin. Dema ku gotarek bi Kurdî bê nivîsandin û ji bo sererastkirinê ji Nûbihar Akademiyê re bê şandin, ew gotar dê ji aliyê pisporan ve bê sererastkirin. Gotarên ku bête şandin dê ji du aliyên ve bête kontrolkirin û sererastkirin:

### 1. Sererastkirina Normal

Sererastkirina normal, ji aliyê rênivîsê ve tê kirin. Ev cure sererastkirin ji bo kesên ku Kurdiya wan a nivîskî û zanistî baş e, lê rênivîsa wan kêmtir e tê kirin.

### 2. Sererastkirina Pêşketî

Sererastkirina pêşketî, ji aliyê wate û jinûvesazkirina hevokan ve tê kirin. Ev cure sererastkirin ji bo kesên ku axaftina wan baş e, dikarin hizir û ramanên xwe derbasî nivîsê bikin, lê ji aliyê termînolojî û gramera Kurdî ve kêmtir in tê kirin.

**Têbînî:** Piştî ku karê sererastkirina gotarê qediya, êdî gotar ji hekeman re dê bê şandin. Xizmeta sererastkirina gotaran ji bo zaravayên Kurmancî û Dimilî ye.

Ji bo sererastkirinê gotarên xwe bişînin vê mailê: [nubiharakademi@gmail.com](mailto:nubiharakademi@gmail.com)

## ABOUT NÛBIHAR AKADEMÎ JOURNAL

Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal that will be publishing articles in the field of Kurdology. *Nûbihar Akademî* journal covers with an academic style all kinds of scientific articles and accommodates with a multi-disciplinary approach writings in the fields of linguistics, literature, culture, art, economy, sociology, religion, etc. Works such as articles, translations, transcriptions, symposium papers, books and theses will be published in the journal. The articles that are submitted to be published will be evaluated by expert peer-reviewers whose names will not be disclosed. Nûbihar Akademî is published biannually in spring and autumn. Publication languages are both Kurdish (all dialects) and English.

### Review Procedure for Articles

1. The first evaluation of the articles is done by the publication board. The articles that are not in line with regulations of the journal in terms of form and content are sent back to their authors to be corrected. In the next phase, the articles that are suitable (with original versions if they are translated from another language) are sent to three reviewers. The decision to publish the articles submitted to the journal is made according to critique of these reviewers. If at least two (out of three) referees decide that your manuscript can be published, then your study will be published (after a revision based on the suggestions). If the reviewers ask for corrections and make suggestions, the articles are immediately sent to their authors and are asked to make improvements and corrections to the articles according to suggestions of the reviewers. The articles sent for corrections must be resent to the journal at latest within a month. If requested corrections are not made and the articles are not resent to the journal before the deadline, the publication board has the authority (this time) to decide whether to publish the articles or not. In case of disagreement between the reviewers and the authors, the decision to publish the articles is taken by the publication board. The articles that have been corrected can be re-evaluated by the reviewers if necessary.

2. A letter about whether their articles are accepted or rejected along with copies of referee reports is sent to authors. This could be done via post or e-mail. Authors will be informed about the articles not published in the first two issues of the journal from the delivery date. Whether published or not, the submitted articles are never returned to authors.

3. Responsibility of opinions in the articles belongs to their authors. Publication rights of the articles approved to be published belong to the journal.

4. Articles and figures in the journal can be quoted on condition that the name of the journal is mentioned.

### **Writing and Publishing Guidelines of Nûbihar Akademi Journal**

1. The articles submitted for publication must not have been published somewhere else before or be in reviewing process. If an article has been presented in a congress, symposium or another meeting, it can be published upon approval of the board of publication and on condition that the date and place of the presentation are stated. The responsibility in this respect belongs exclusively to the author.

2. Articles including whole text, indented paragraphs, notes and references must be written only on one face of an A4 paper with 12 font size in Times New Roman writing characters and with 1.5 line of writing space; 4.5 cm space on both sides of paper and 3 cm space on the top and bottom of paper. The article must bear page numbers on right bottom corner. Articles must not be more than 30 pages, including notes and references, and must be delivered with tables, figures and drawings if any. Figures, photographs, graphics and drawings must be numbered and in the text when it is necessary the numbers must be mentioned and their titles must be written on the below. If they are quoted from a different source, then their source must be stated. The source and references must be given within the text (according to APA 6th Edition style). Referencing information must be provided in detail at the end of article and if necessary references can be given in footnote.

3. Articles must be written in a Microsoft Word file for faster page-setting and publication, and sent to Nûbihar Akademi Journal e-mail address. Handwritten articles will not be reviewed.

4. Articles must be submitted in the following order: Title (capital letters), name of author or authors, abstract, the full text, references and (Extended abstract).

The titles of the articles need to be written in both languages (Kurdish-English or English-Kurdish). Titles cannot be written with more than 14 words. The first letter of each word in the title should be capital.

Under the title, names of authors will be presented and in the footnote their academic appellation, their affiliation, department, research area, and e-mail addresses will be indicated.

Abstracts must be written in both Kurdish and English. The first abstract will be provided in the language the article is written in and the second abstract will be in the second language. In Kurdish articles the Kurdish abstract needs to be provided in the dialect the article is written in, while in English articles the abstract can be written in any dialect the authors prefer. Abstracts must be written with less than 120 words. Key words should be defined below every abstract.

The articles must absolutely have “Introduction” and “Conclusion” parts. Meanwhile, the “referances” part must be placed, as well. References need to comply with the APA style instructions. In case of need, additionally parts such as “method”, “results” and “discussion” can be included.

Only in Kurdish articles, “(Extended abstract)”. part will be written in English. “Extended Summary” must be written in the range of 500 to 750 words and should not include subsections (e. g. Introduction, Method) and should reflect the basic ideas in the article in paragraphs. Quotation should not be included in the summary.

5. The author is responsible for the accurateness of references. As mentioned above, references must be given within the text. If there are any notes, they should be numbered within the text and placed at the bottom of the text by order of numbers.

6. It must be stated in the application letter that (a) the article is original, (b) it has been read and approved by author(s) and (c) it has not been published as a whole in any publication before.

### **Editing Articles (Proofreading)**

In the homeland and diaspora, there are many Kurdish researchers, experts and academics who have developed themselves in various scientific fields. However, lots of them cannot write their scientific articles in Kurdish because of the conditions and circumstances which they have lived in. Nûbihar Akademi Journal invites them to take the initiative for writing their articles in Kurdish. Articles which have been written in Kurdish and sent to Nûbihar Akademi Journal will be examined, reviewed and edited by our experts. The submitted articles will be checked and edited in two aspects:

#### **1. Normal Editing**

Normal editing is a kind of making corrections in spelling. This sort of proofreading is for the authors whose Kurdish knowledge is good enough and acceptable academically but not in spelling.

#### **2. Advanced Editing**

Advanced editing is reconstituting sentences semantically. This kind of proofreading is for the authors whose speaking skill in Kurdish is good enough to transfer their thoughts into writing but their terminological and grammatical ability in the language is not adequate.

**Note:** After editing of articles is completed, the articles will be forwarded to referees. Proofreading works will be done only in Kurmanji and Zazaki dialects. Proofreading and editing articles is a paid work.

- To have your articles proofread by our referees, please send them to the following e-mail; nubiharakademi@gmail.com